



T.C.

ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YIL Ê

ENSTITUYA ZIMANÊN ZINDÎ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

ROLÊ KOVARA METÎN DI PÊŞXISTINA VEKOLÎNÊN EDEBÎ DE

TEZA LÎSANS A BİLİND

Salam Nori OMER

ŞÊWIRMEND

Yrd. Doç.Dr.Murat YILMAZ

WAN-2017



T.C.

YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

KATI BİR DERGI EDEBİYAT ARAŞTIRMA GELİSTİRME ROLÜ

YÜKSEK LISANS TEZİ

Salam Nori OMER

DANIŞMAN

Yrd. Doç.Dr. Murat YILMAZ

VAN –2017

KURTE**TEZA LÎSANSÂ BILIND****ROLÊ KOVARA METÎN DI PÊŞXISTINA VEKOLÎNÊN EDEBÎ DA****SELAM NÛRÎ OMER****ŞÊWIRMEND: ALK. DOÇ. Dr. MURAT YILMAZ**

2017, 120 Rûpel

Rojnamegerî diyardeka şehrîstaniye jibo pêşketina her civakêkî, belkî pêdivîyeke ji pêdiviyên civakê hevçerx, lewma aliyekê giring di jiyana rewşenbîrî da vegirt, rojnamegeriyê gringîyeka mezin daye vekolînên edebî û bûye rêkeka serekî jibo belavkirina vekolînên edebî, daku bi zûtirîn dem bighêje destê xwendevanî.

Ev vekolîn ya bi nav û nîşanê (Rolê kovara Metîn Di Pêşxistina Vekolînên Edebî Da Li Devera Badînan Berî Serhildana sala (1991 - 2000), her weha behsê rojnamegeriya cîhanî û corên wê, vekolînên edebî, dîrok û corên vekolînên edebî dikê.

Jibo encamdana vê vekolînê em rabûn bi komkirina hemî hijmarên kovara Metîn evên di vê qunaxê da hatîne çapkirin û belavkirin ku hijmara wan dibê 100 dane, em rabûn bi polînkirina wan û jê derêxistina vekolînên edebî li dûv corên edebî ku di nav hijmarên vê kovarê da hatîne belavkirin û karê me şîrovekirina wan vekolînan bûye.

Peyvên serekî: Vekolîna Edebî, Rojnamegerî, Kovara Metîn

ÖZET

YÜKESEK LİSANS TEZİ

KATI BİR DERGI EDEBİYAT ARAŞTIRMA GELİSTİRME ROLÜ

Salam Nori Omer

Tez Danışmanı: Yrd. Doç. Dr. Murat Yılmaz

2017, 120 sayfa

Basın, her toplumun ilerlemesi için kültürel bir fenomendir ve çağdaş toplumun bir ihtiyacı olup kültürel yaşantının önemli bir yönü vardır. Okurlara mümkün olan en kısa sürede ulaşmak için edebi araştırma yayınlamanın önemli biryolu haline geldi.

Literary Research'in Gelişmesinde Bir Matin Dergisinin Rolü başlıklı bu araştırma Badinan bölgesinde, ayaklanma (1991-2000) ve uluslararası basınından yazın türleri ve tarih edebiyat araştırmaları türleri. Bu araştırmayı gerçekleştirmek için,

bu dönemde basılan 100 dergi dergisinin tüm ciltlerini topladık ve bunları sınıflandırdık ve edebi araştırmalarını edebi tezlerine göre bunlarda yayınladık. Dergi ve misyonumuz bu araştırmaları açıklamaktır.

Anahtar kelimeler: edebi araştırma, basın, Matin dergisi.

ABSTRACT

The press is a cultural phenomenon for the advancement of every society and it is a need of the contemporary society so it has an important aspect of cultural life. It has become a major way of publishing literary research in order to reach the readers as soon as possible.

This research under the title (The Role of a Matin Magazine in the Development of Literary Research) In the Badinan region after the blessed uprising (1991-2000), as well as the international press, its types and history and types of literary research.

In order to carry out this research, we have collected all the volumes of the magazine, which were printed in this period, which are 100 publications, and we have classified them and extracted literary researches according to their literary type, which were published in this magazine and our mission was to explain these researches.

Key words: literary research, the press, Matin magazine.

NAVEROK

KURTE	I
ÖZET	II
ABSTRACT	III
NAVEROK	IV
SIPASÎ	VI
PÊŞGOTIN	VII
KURTEBÊJÎ	IX
DESPÊK	1
Kurtiyek Li Dor Peydabûn û Karwanê Kovara Metîn)	1
1 Rojnamegrî: Pênase û Corên Wê	5
1.1.1 Kurtiyek Ji Dîroka Rojnamegerîya (Cîhanî)	5
1.1.2 Zaravê Rojnamegeriyê	12
1.1.3 Pênaseya Rojnamegeriyê	12
1.1.4 Corên Rojnamegeriyê	15
1.2 Ew Lêkolînên Edebî Li Ser Rojnamegerîya Kurdî Li Devera Badînan (1991-2000)	22
1.2.1 Rojname	22
1.2.2 Kovar	24
2 Vekolîna Wêjeyî: Çemk û Pênase û Cor	34
2.1 Zaravê Vekolînê	34
2.2 Dîroka Vekolîna Wêjeyî	34
2.3 Têgehê Vekolîna Edebî	38
2.4 Pênasên Vekolînê	40
2.5 Pênasa Vekolîna Wêjeyî	42
2.6 Taybetmendiyên Vekolîna Edebî	44
2.7 Corên Vekolînê	47
2.7.1 Vekolîna Kurt	47
2.7.2 Vekolîna Dirêj	53
2.7.3 Vekolîna Esasî	56
2.7.4 Vekolîna Piratîkî (Tetbîqî)	56
2.7.5 Vekolîna Têkel (Mixed)	57
3 Şîrovekirin û Polînkirina Gotarên Lîkolînên Edebî Di Kovara Metîn Da	58
3.1 Destnîşankirin û Polînkirina Vekolînan	58

3.2	Şîrvekirina Gotarên Vekolînên Edebî Di Kovara Metîn Da	67
3.2.1	Şîrvekirina Girêday (Helbestê)	67
3.2.2	Şîrvekirina Girêday (Jiyan û Berhem).....	71
3.2.3	Şîrvekirina Girêday (Kêş Nasiyê).....	74
3.2.4	Şîrvekirina Girêday (Edebê Berawurd).....	75
3.2.5	Şîrvekirina Girêday (Rêbazên Edebî)	78
3.2.6	Şîrvekirina Girêday (Wergêrana Edebî)	80
3.2.7	Şîrvekirina Girêday (Çîrokê).....	81
3.2.8	Şîrvekirina Girêday (Rexna Edebî).....	83
3.2.9	Şîrvekirina Girêday (Şanoyê)	85
3.2.10	Şîrvekirina Girêday (Romanê).....	86
3.2.11	Şîrvekirina Girêday (Folklor).....	87
3.2.12	Şîrvekirina Girêday (Pexşanê).....	89
ENCAM	92
ÇAVKANI	94
PAŞKO	104
JIYANNME	120

SIPASÎ

yezdanê mezin ku ez gehandime vê qunaxê ji xwendinê ku min temamkirî.

Ruhê dayk û bavê min ku her dem piştevanên min bûn jibo xwendinê.

Hevjîna min ku herdem digel min ya harîkarbû, her weha pişkujê min (Mihemed) ku herdem bi kenê xwe mala min avakirî.

Mamustayê hêja Murad Yilmaz ku şêwirmendîya vê teza min kirî.

Hêja Dr. 'Imad Weysî, Dr. Nî'metullah Hamîd, Ehmed Zero, Reşîd findî, Wesfî Hesên, jibo harîkarîya wan digel min.

Mamustayê hêja Yehman Mihemed 'Ebdulrehman ku yê harîkar bû digel min hemî deman.

Hemî karmendên pertûkxanan: pertûkxana Nalbend li Duhokê, û Adabê Zankoya Duhokê, Bedirxaniyan û pertûkxana Yekîtîya Nivîskarên Kurd, liqê Duhokê.

Her weha hemî mamustayên min ji despêka qunaxên xwendina seretayî û heta nuha supasîya hemîyan dikim.

PÊŞGOTIN

Nav û Nîşanê Lêkolînê:

Ev lêkolîn li bin navê (ROLÊ ROJNAMEGERÎYA KURDÎ DI PÊŞXISTINA VEKOLÎNÊN EDEBÎ DA, LI DEVERA BADÎNAN DA, KOVARA METÎN WEK NIMÛNE). Me karîye di vê lêkolînê da xizmeteka hûr bikin jibo vekolînên edebî, her weha rolekê berçav dîtîye di rojnamegerîya kurdî da, em van gotarên vekolînan şîrove bikin, armanca me ji vê vekolînê destnîşankirina wan jibo rêbazên vekolîna edebîne di nav kovara Metîn da, nexasim wek yasa û piratîkkirin û destnîşankirina wan gotaran bi şêweyekî zelal û bêne ravekirin.

Giringîya Lêkolînê:

Kovara Metîn kovareke li herêma badînan derketîye û ji dû pişka pêkhatiyê pişka 'Erebî û pişka Kurdî û beşek bi tîpên Latînî derketîye û kovareka siyasîye, belê giringiyeka mezin daye vekolînan bi taybet di xula sê da ji her çar parçên kurdistanê bi awayekî fermî vekolînên ekadîmî li ser kovar Metîn hatine nivîsîn.

Her weha em karin gotarên vekolînên edebî polîn bikin û helbet giringiyeka mezin daye corên edebî, ev kovare di astekê baş debûye, her weha gelek rojname û kovar di navbera salên 1991- 2000 da rolekê berçav hebûye di xebatên lêkolînên edebî da.

Sînore Lêkolînê:

Bitenê em dê wan rojname û kovaran wergirin ewên di navbera salên 1991- 2000 da, pişka Erebî me ne wergirtiye. her weha dê wan mijaran jê wergirin ewên vekolînên edebî bixweve girtine, her weha mijarên kovara Metîn bi taybetî vekolînên edebî dê bi hûrî rave bikin, mîna li başûrê kurdistanê qonaxeka taze destipêkir di hemî warên cuda da.

Arîşa Lêkolînê:

Arîşên di vê lêkolînê da li hemberî me derketî, nebûna çavkaniyên pêwîst û bi taybet bi zimanê kurdî, eve jî yek ji wan arîşabû di lêkolînê da.

Rê û Rêbazên Lêkolînê:

Di vê lêkolînê da me giringî daye rê û rêbazên (şîrovekirinê) her weha gotarên vekolînên edebî hatine ravekirin lewma ew gotar diçine di çarçeveya rê û rêbazên lêkolîna edebî da, nexasim mijarên vekolînan hatine ravekirin.

Armanca Lêkolînê:

Armanca me ji vê lêkolînê ku rolê vekolînên edebî di rojnamegerîya kurdî da taybet li devera behdînan di navbera salên 1991- 2000 da bidine xuyakirin, ka lêkolînên edebî di çi astî debûn.

Peykerê Lêkolînê

Ev lêkolîn ji pêşgotinê û kurteya her sê zimanan Kurdî û Turkî û Ingilîzî, digel kurtebêjîyê û despêkê û encamê çavkaniyan paşkoya, ev lêkolîna ji sê pişka pêkhatiye, beşê yekê ji dû basa pêkhatiye, basê yekê kurtiyek li ser rojnamegerîya cîhanê hatiye nivîsîn digel pênasên rojnamegeriyê û corên rojnamegeriyê.

Basê duwê kurtiyek li ser wan lêkolînên edebî ewên di rojnamegerîya kurdî da hatiye bi taybetî li devera behdînan ji sala 1991 heta bi sala 2000 hatine nivîsîn ku rolekê mezin hebû di vekolînên edebî da, her weha beşê duwê ji van mijaran pêkhatiye ji dîroka vekolînên edebî û pênasayên lêkolînên edebî hatiye nivîsîn digel taybetmendiyên lêkolîna edebî, her weha corên lêkolînê bi dirêjî li ser hatiye rawestandî, ji aliyê rojnama û kovara û zanestî û ne zanestî û her weha mijarên kurt û dirêj li ser hatiye nivîsîn mîna çendîn corên di me ravekirine nexasim corên lêkolînê wek piratîk û têkele, bineretî.

Di pişka sê da dû bas hene, basê yekê destnîşankirina wan, polînkirina gotarên lêkolînên edebî ewên di kovara Metîn da belavbûne û hatine nivîsîn ew li jêr corên edebî hatine nivîsîn ew jî bi rêka xişteya derêxistina rêjeyan, basê duwê şîrovekirina wan gotarên lêkolînên edebî hatine nivîsîn û ravekirin û di dawiyê da encamên lêkolînê derketine.

KURTEBÊJÎ

B.	:Berg.
Ç.	:Çap.
Dr.	:Doktor.
H.Ç.	:Heman Çavkanî.
H.Ç.B.	:Heman Çavkanîya Berê.
H.R.	:Heman Rûpel.
HTD.	:Heta Dawî.
J.	:jimare.
K.	:Koçî.
KO.	:Kovar
P.Z.	:Pêş Zayinê
Pro.Dr.	: Profesor Doktor
R.	:Rûpel.
Roj.	: Rojname.
SM.	:Sentî Metir.
Wer.	:Wergêran.
Weş.	:Weşanxane.
Y.N.K.	:Yekîtiya Nivîserên Kurd.
Z.	:Zay

DESPÊK

Kurtiyek Li Dor Peydabûn û Karwanê Kovara Metîn

Çunkû rojnamevanî ya her milletekê, xwedîkeka rone jibo diyarkirina hizir û bîr û şehristaniya wî milletî û baştirîn rêke jibo bilindkirina astê şyaryê di nav wî milletî da, kovara Metîn peydabûye ku kovareka rewşenbîrî û siyasîye û bi zimanê kurdî û 'Erebî û beşek ji wê bi tîpên latînî derketiye, kovara Metîn belavokeka pir girîngibû û berbelavbû, hindê cara heyvanebû, û hindê caran jî demsalîbû, ji aliyê liqa yekê ya partiya demokrata kurdistanê ve derdiket.

Jimara yekê ji vê belavokê li heyva nîsana sala 1981ê ji aliyê baregeha liqa yek ya partî li Kumatey derketîye⁽¹⁾. Paşî dema sala 1984 baregeha liqa yekê ya partiya demokrata kurdistanê çûye gundê zêweşkan, nav nêrweyya êdî li zêweşkan berdewamî bi weşana xwe dane⁽²⁾ jimara 39 li cirya yekê sala 1986 derketîye, paşî jimara 42 li heyva kanûna sala 1985 derketîye, jimarên (67 – 68) li tebaxa sala 1987 derketine, çendîn jimarên dî jî li salên cuda derketine, jimara (72) li dawîya nîsana sala 1988 derketîye, jiber enfalên reş ku bi ser devera badînan hatin, ewbû belavoka metîn rawestiya⁽³⁾. Demê belavoka metîn li salên 1981- 1983 li Kumatey derdiket sitafê wê ji van berêzan pêkhatbû: Dr. Rizgar Zaxoy wek sernivîskar, û 'Ebdulselam Berwarî û Sebrî Bamernî her weha Edîb Çelkî û Îmad Cemîl Mizûrî ji hevkarên belavoka metîn bûn li Kumatey. Her weha Husên Osman Keleş Gulî (Bavê Kovan) û mihemed hacî jibo karê stênsil û taypê û çapê bi daktîlo. Her weha van berêzan têda dinivîsî:

Ebdulêzîz Teyb, ce'fer mayî, Mihemed Emîn Mayî (Mam Dijwar), Dr. Circîs Hesên, Nêçîrvan Ehmed, Teyar Selîm Germavî, Reşîd 'arf Etrûşî ku Mawekî berpirsê liqê yek yê partîbû, Seyda Necmedîn Yusifî⁽⁴⁾.

Pişî çendekê guhertin di sitafî da hatinekirin. Li sala 1987 dema amîrê (fotostênsil) gehşitîye baregeha liqa yekê ya partî demokratî kurdistan, karê nivîskarya metîn bleztir û xweştir lê hat⁽⁵⁾.

⁽¹⁾ . Wesfî Hesên, *Rojnamegerî Li Devera Behdînan (1950- 2005,)* Weşanxana Xanî, Ç2, 2012, R.30

⁽²⁾ . Serdar Hêtûtî, *Bizava Rojnamevaniyê Li Dîrelokê*, Ko. Sîlav, J89, Îlûna 2013, R.10

⁽³⁾ . H.Ç., R.31

⁽⁴⁾ . Wesfî Hesên, *Çavkaniya Berê*, R.32

Belavoka metîn dema li Kumatey bi (6) rûpelan derdiket û li sala 1984 heta sala 1987 bi (10 – 12) rûpelan derketîye û li sala 1987 heta buhara sala 1988 wek namîlke bi (20) rûpelan belav dibû.

Heta sala 1984 (200) dane jê dihatine çapkirin lê li salên (1985-1988) metîn bi (1400) daneya dihate çapkirin... Û li ser tevaya rêkxistinên nihênîyên partî li bajarên Duhok û Amêdî û Sersing, Zaxo, Akrê û Şêxan û dewrubera û Sêmêl û Mûsil dihate belavkirin.

Piştî dîvçûn û pirsîyaryeka baş ji kadrên rewşenbîr yê şoreşa eylûlê.. jibo me msoger bû ku li serdemê şoreşa eylûlê (1961-1975) çî kovar yan belavok bi navê metîn ji aliyê liqa yekê ya partî li devera badînan nehatine derxistin. Lewma ewa li sala 1981 li serdemê şoreşa gulanê derketî yekemîn xula kovara Metîne û çî kovar yan belavok bi navê metîn pêştir li devera badînan nehatine derêxistin⁽⁶⁾.

Nivîskar Hebîb keleş dibêjê: (me bi berjewendî zanî em navê kovara xwe bikin metîn bi navê çyayê metîn li devera liqê wesifkin da ku xelkê byanî kurdistanê nasbkin, li dawî da demê enfala jî me girtî weku liqê hemî tiştên me hatin şewtandin û neman û kovara Metîn jî bû qurbanîya enfal û kîmyabarana rijêma îraqê, belê metîn her ma weku çiyayê metîn û dujmin ket nava kîfankê dîrokê⁽⁷⁾.

Li ser hêlengandna metîn Dr. Rizgar Zaxoy, sernivîskarê kovara Metîn yê berê dibêjê: Metîn çî wek belavok yan jî kovar, bi boçûna min derkirina wê karîbû valahyekê tijî bikê û rolekî baş hebê jibo aşnakirina kurên milletê me bi fidakarî û qurbanîya kur û keç û bra û bav û kes û karên wan li dijî rijêma tawanbar, jibo diyarkirina yan girovekirina vê boçûnê dikarim îşaretê bidim dirindiya dam û dezgehên rijêma Ba'îsî jibo dijayetiya metîn, anku ger ew role nedîtiba wan (rijêm) bi wî rengî hovane şerê metîn nedkin, belê bi boçûna min hêlengandina rast û dirist ya belavok û kovara Metîn ji aliyê cemawerê xwendevanên metîn ve dê êtekin⁽⁸⁾.

⁽⁵⁾ . H.Ç., R.31-33

⁽⁶⁾ . H.Ç., R.33-34

⁽⁷⁾ . Hebîb Keleş, *Hevpeyvîn Bi Rêka Viberê*, 28-7-2017, Roja Înê, Li Demjimêr 22:43

⁽⁸⁾ . Dr. Rizgar Zaxoy, *Hevpeyvîn Bi Rêka Viberê*, 2-7-2017, Yekşemb, Demjimêr 14:40

Ev kovare berdewambû li ser karê xwe û bûye temamkera kovara Metîn ewa li salên heştîyan li rojanên şoreşa gulane li devera Kumatey û zêweşkan li devera nêrweyya derdiket. Jimara yekê ji xula sê li mijdara sala 1991ê li duhokê derketîye û jimara (132) û dawyê li havîna sala 2003 derketîye. Li huzeyrana sala 1991 desteka nivîsîna kovara Metîn li baregayê liqa yek ya partî li zawîte hate destînîşankirin û li despêkê hêja Dr. Rizgar Zaxoy sernivîskarê wê bû û desteka nivîskaran ji van berêzan pêkdihat:

‘Ebdulkerîm Fîndî, Enwer Mihemed Tahîr, Reşîd Fîndî, Remezan ‘Îsa⁽⁹⁾. Lê piştî derketina yasa çapemeniyê li sala 1993 ji perlemanê Kurdistanê ew bû Necmedîn Yusifî bûye xudanê îmtiyazê û Hemîd Surî bûye sernivîser û Me'sûm Mayî bûye sekreterê pişka 'Erebî û Diyar Mihemed Se'îd Doskî bûye sekreterê pişka kurdî, paşê li jimara (42-43) ya Tîrmeh û Tebaxa sala 1995 desteka nivîskaran bi vî awayî bû:

Necmedîn Yusifî xudanê îmtiyazê û Fehîm Ebdulla Hemo sernivîskar û Diyar Mihemed Doskî sekreterê nivîsînê... Û ev desteye bi vî şêweyî ma heta jimara (87) ya li havîna sala 1999 derketî... Û li havîna sala 1999 û jimara (88) û pêhel heta jimara (132) Diyar Mihemed Se'îd Doskî sernivîskar û Dr. Fazl Omer bûye sekreterê nivîsînê⁽¹⁰⁾.

Ev qonaxe di jyê metîn da ya girînge û em dikarin bêjin qonaxa pêgehiştinê, çunkû di vê qonaxê da weku kovareka hizrî û rewşenbîrî ya giştî pê dgehê û çendîn guhertinên bneretî di naverok û ruxsarê metîn da têne dîtin⁽¹¹⁾.

Di vê qonaxê da her partiyeka siyasî li kurdistanê karbikê, wan pêdvî bi alavekê hebû jibo ragehandina siyaseta xwe, ne bes partî, her parteka dî jî alavek hebû, ragehandna siyaseta xwe belav bkin, jiber ku hêsta televîzyon nehatbû damezrandin, kar jibo televîzyonê li dawîya sala 1991 hate kirin, li heyva gulane sala 1992 televîzyona xebat derket ew jî ya partiya demokrata kurdistanê bû, berî hemya kovara Metîn derket ziman halê liqa yekê ya partî bû, her partiyekê siyaseta xwe pê belav bikê jiber hindê ew kovarên gotarên siyasî têda hebûn jibo cemawerê

⁽⁹⁾ . H.Ç., R. 62-63

⁽¹⁰⁾ . H.Ç., R.63

⁽¹¹⁾ . Dr. 'Arif Hîto, *Metîn Di J. Sedê Da*, Ko. Metîn, J. 100, Gulan, 2000, R.72

xwe agehdar bikin, zêdebarî ku hindek mijarên dî yê li ser dîroka kurda û vekolînên edebî têda belavdibûn⁽¹²⁾.

Her weha di vê ponaxê da, naveroka kovara Metîn ji van mijarên serekî pêkdihat: vekolînên dîrokî yan mêjûya li ser mêjûya Kurd û Kurdistanê yan ew tiştên peywendî bi kurdave heyî, hindek vekolerên 'Ereban û Farisan vekolîn kirin li ser mêjûya kurdan, û hindekên dî jî ku peywendî bi Kurd û Kurdistanê ve hebê daku vekolînên edebî bi şêweyekê baştir bêtekirin û dîrasekirin, her vekolînek li her çar parça hatbû belavkirin di vê kovarê da.

Her weha rolê nivîskara di kovara Metîn da di wergêrana babetên edebî da berçav bûye ku ew babete wergêrayne ji zimanê îngilîzî jibo zimanê 'Erebî û ji îngilîzî jibo zimanê kurdî û wergêran dnavbera zimanên kurdî û 'Erebî da hebû.

Babetên mijarên edebî ji herdû parêzgehên herêmê (Hewlêr û Silêmanî) dihatine şyandin jibo vê kovarê daku têda bêne belavkirin⁽¹³⁾ piştî çapxana xebat dest bi karê xwe kir jimara (57) heta jimara (100) li vê çapxanê hatine çapkirin. Hêjayî gotinêye ku jimara cot (31-32) û pêhel ji kovara Metîn bi kombûterê xwe hatine çêkirin. Û jiber çend egerên zordest ew jî ku hatbû rawestandî jibo demê çar heyvan, desteka nivîskara neçarbû çend jimarên cot ji metîn derbêxê, ew jimare jî evene: (27-28), (31-32), (37-38), (42-43)⁽¹⁴⁾.

Û her çendî kovara Metîn taybetmend nîne bi hunerî ve, lê kovara Metîn jê bê par nebûye ji hunerî û jimareka gotara li ser hindê belavbûne her weha bê guman kovara Metîn rê daye gotarên zansitî û giştî jibo kûrkirina hizir û bîr û boçunên xelkî li ser wan babetan, babetên aborî jî pencereka jibo hatiye vekirin li kovara Metîn da bi taybetî piştî vebûna kulîja aborî li zanîngeha duhokê û bi harîkarya hindek kesên taybetmend li deverê ev kare encam daye⁽¹⁵⁾.

⁽¹²⁾ . Dr. Reşîd Fîndî, *Hevpeyvîn*, 23-5-2017, Sêşemb, 12:00, Pertûkxana Bedirxaniyan, Duhok

⁽¹³⁾ . H.Ç.

⁽¹⁴⁾ . Ebdulrehîm Badî, *Biblografya Jimarên Neh Salên Xula Sê Ji Jyê Metîn* J. 1 Îlûna 1991 Taku J. 100 Gulana 2000, Ji Belavokên Ko. Metîn, J. 14, 2001, R.3

⁽¹⁵⁾ . Reşîd Fîndî, *Çend Tîrojkek Li Ser Rojnamevaniya Kurdî*, Berêweberayeti Çapxaney Rewşenbîrî, Hewlêr, Ç1, Hewlêr, 2002, R.100-102

Xula (qonaxa) dawyê ji kovara Metîn bi jimara 133 despê dikê û dawî jimara wê 232 bû li heyva mijdarê sala 2015 derketîye. Sitafê kovarê ji van berêzan pêkdihat: Enwer Mihemed Tahîr (xudanê îmtiyazê), Muhsîn Qoçan (sernivîskar), her weha ji desteka nivîskaran jî: Dr. Selah Hirûrî, Hîzirvan 'Ebdûlla, Erşed Hîto, Dr. Nî'metulla Hamid Nihêlî û Bavê Nazê.

Ev xule tete jimartin wek xuleka vekolînên giştî û ji mijarên siyasî, dîrokî, zimanî, hizrî, felsefî, vekolînên edebî û hunerî pêkdihat, û di vî demî da kovareka serbexwe ya girêdayî bi encûmenê wezîran vebû⁽¹⁶⁾.

1 Rojnamegrî: Pênase û Corên Wê

1.1.1 Kurtiyek Ji Dîroka Rojnamegerîya (Cîhanî)

Hindek çavkanîyên dîrokî despêka rojnamegeriyê jibo Mîsra kevin dizivînin, amaje bi wê yekê didin berî çendîn hezar sal desthelatdarên kevin yên Mîsrê karubarên welatî û şerên leşkerî û gelek tiştên di yên wekî wan bi awayekê xemlandî li ser kevran dikolan yan li demê mirinê dikirne di nav gorê wan da yan jî jibo nişên piştî xwe di hêlan, di ser vê hemiyê ra bêhtiriya deng û basên xwe li ser dîwarên peristgehên xudavendên xwe didaleqandin û dikolan bi merema xelk wan deng û basan bibînin⁽¹⁷⁾..

"Lê lidûv hizra hindek dîroknasan despêka serhildana karê rojnamegerî dizivîrê jibo parzemîna asiya û bi dirustî jî ev despêk li sala (911 b.z) ew jî rojnama (kîn yat) ya çînî bû (li welatê çînê hukumeta desthelatdar belavkiriye), ev rojname bi awayekê heyvane derdiket"⁽¹⁸⁾ û li demê belavbûna wê berifrehbûye, kiriye rojnameka rojane û bûye ziman halê hukumeta çînê ya wî demî⁽¹⁹⁾.

⁽¹⁶⁾ . Hîzirvan 'Ebdulla, *Hevpeyvîn*, 23-7-2017, 11:45, Roja Yekşembê, Li Avahîya Yekîtiya Nivîskarên Kurd, Tayê Duhokê

⁽¹⁷⁾ . Dr. Dr. Kemal Mezher Ehmed, *Têgehîştinî Rastî, Şiwênî Le Rojnamenûsî Kurdî Da*, Ç. Korî Zaniyarî Kurd, Bexda, 1978, R.19

⁽¹⁸⁾ . Biraymî Mella, *Rojnamegerî Le Seretay Serheldanewe Ta Çerxî Niwêkarî*, Wezaretî Rewşenbîrî, Lîjney Çapemenî, Hewlêr, 1998, R.10

⁽¹⁹⁾ . Edîb Merue, *Elsehafa El'erebîye Neşetuha We Tetureha*, Dar Mektebet Elheyat, Beyrût, 1961, Ç1, R.54

Hindek dîroknasên dî despêka rojnamegeriyê dizivîrînine Romaniyan, ew jî despêka rojnamegeriya xulnameyî sala (59 b.z) demê şahê Romanî (Yulyous Qeyser) rêwresim û biryarên xwe bi awayekî xulnameyî bi navê (Ekta Dîyurna – Acta Diurna) anku karubarên rojane, yan rûdanên rojane derdxistin û bi dîwarên Romave didaleqandin⁽²⁰⁾.

Li despêka wê puxta rûniştîncên encûmenê pîran yên Romanî têda belavkirine⁽²¹⁾.

Zaravê Xulnameyî*:

Di sedsala sêzdê da pêşeyê deng û basên bi destî dihatine nivîsîn li Îngiltera peydabû⁽²²⁾ çêdibê her ji verêj û encama van karên nû yên li sala 1275 fermaneka paşayeti ji vî welatî derket jibo rêgirtin li beramber nûçe û haberên derew, eve jî yekemîn belgeyê destnivîsiye di dîrokê da, yê taybete bi belavkirina deng û basan⁽²³⁾.

Piştî dû sed salan anku di sedsala pazdê da, ev corê ragehandinê bi awayekê berifreh li Elmaniya û Îtaliya serhildaye, li bajarê Vînişiya li welatê Îtaliya belavoka destnivîs bi navê (Avvisi) hatiye bi navkirin û çîna erristoqrat pare û nirxekê baş bi van belavukan dida⁽²⁴⁾. Û jibo cara yekê çapxane peydabû, ew bi xwe bûye şoreşeka nû li seranserê Ewropa⁽²⁵⁾.

Serhildan û derketina xulnameyan bi awayekî rêk û pêk nebû, xulnameya salane wekî salnameya despêkê, di navbera salên (1448 heta 1470) li bêhtirîya

⁽²⁰⁾ . Pro. Dr. Todorof, *Tarîx Elsehafe El'alemîye*, Wer.: Edîb Xedûr, Dîmeşq, 1990, Ç1, R.7

⁽²¹⁾ . Edîb Merue, H.Ç., R.54

* . Mebest pê tabloyeka rojaneya wî serdemî bûye, berdewam babet û rûdan û karubarên rojane têda dihatine tomarkirin û dihatine daleqandin bi dîwaran ve û li gor rûdana rojê dihate guhartin anku li cihê rojnamê girtîye di wî serdemî da

⁽²²⁾ . Amîl Biwafan, *Tarîx Elsehafe*, Wer.: Muhemmed Îsma'îl Muhemmed, Dar Elmîsrîye, Qahîre, 1949, R.13

⁽²³⁾ . Dr. Mehmûd Necîb Ebû Leyil, *Tarîx Elsehafe Fî Ewropa We Emrîka Muniz Bîdayetîha We Heta Qiyam Elherb El'alemîye Elsanîye*, Ç. Eltehrîr, Qahîre, 1954, Ç1, R.11

⁽²⁴⁾ . Amîl Biwafan, *Tarîx Elsehafe*, Wer.: Muhemmed Îsma'îl Muhemmed, Dar Elmîsrîye, Qahîre, 1949, R.13

⁽²⁵⁾ . Wirya Caf, *Karwanê Rojnamegerî Kurdî*, Gulan J. (195) Ç. Wezaretî Rewşenbîrî, Hewlêr, 1998, R.4

welatên Ewropa serhildaye, jibo mînak li welatê Elmanya û Firensa û Îtaliya û Îsvîçra zêdetir jî giringî bi deng û basên stêrnasiyê dida⁽²⁶⁾.

Eger dîroka serhildana rojnamegeriyê li Firensa jibo salên di navbera (1409 – 1449) vegeŕînin, maweyê derketina rojnameya (Borcuvazî) li Parîsa paytext, belê yekemîn xulnameya Firensî ku navê wê (Mêrkur Firansîs – Mercure Francais) bû, li sala 1611 bergê yekê jê derketîye, ev xulname salanebû⁽²⁷⁾.

Li 16 gulana sala 1622 xulnameyeka rastîne li Îngiltera bi navê (A Curent of General News) derket⁽²⁸⁾ jimareya rojnameyan li Birîtaniya ber bi zêdebûnêve çûye, li sala 1641 çar rojname hebûn û li sala 1642 jimara wan gehiştê 167 rojname û li sala 1645 gehiştê jimareka endazeyî ew jî 722 rojnamebûn⁽²⁹⁾.

Parzemîna Emerîka li sala 1492 ji aliyê Kirîstofê Kolombosve hate vedîtin, serhildana rojnamegeriyê li Emerîka bi merem û armanceka siyasî nebû, belê jibo mifa û qazanceka Aboŕî bû, li roja 25 eylûna sala 1690, koçberekî Ingilîz bi navê Binyamîn Harîs (Benjamin Harris) kariye yekem jimara rojnameya (Public Occurrences) li bajarê Postin bi awayekî heyvane derbêxê⁽³⁰⁾.

Cihê amajepêkirinêye li sala 1892 Cozêf Polîtriz xudanê rojnameya (Newyork World) yekemîn kolîja rojnamegeriyê li cîhanê damezrand. Despêka serhildana rojnamegeriyê li welatê Rûsiya jibo sedsala hevdehê vedgerê, li gor wê yasaya şahê Petrûsê yekê li heyva kanuna yekem ya sala 1702 derêxsitî, her di wê salê da yekemîn jimara rojnameya bi navê (Lîste) derket⁽³¹⁾.

Li sala 1665 Firensa yekem welatbû di cîhanê da kovareka wêjeyî derêxsitî, piştî hindêk rewşenbîran hizra derêxistina yekem jimara (Lo Jornal Dî Savan) kirin. Ev kovar ne kovareka taybete bi wêjeyê ve, lê belê kovareka zanestî û wêjeyî bû,

⁽²⁶⁾ . Dr. Mehmûd Necîb Ebû Elleyl, *Tarîx Elsehafe Fî Ewropa We Emrîka* R.26

⁽²⁷⁾ . H.Ç., R.38

⁽²⁸⁾ . H.Ç., R.36

⁽²⁹⁾ . Fîlîb Taylûr, Qesîf El'îqûl, *Eldî'aye Lîlhereb Muniz El'alem Elqedîm Heta El'esr Elnewewî*, Wer.: Samî Xeşbe, *Zincîreya Weşanên 'Alem Elme'rîfe 256*, Encûmenê Rewşenbîrî û Hunerî û Wêjeyî, Kwêt, 2000, R.162

⁽³⁰⁾ . P.Dr.Todorof, *Tarîx Elsehafe El'alemîye*, R.23

⁽³¹⁾ . Dr. Selwa Ebû Se'de, *Elsehafe Fî Elîtîhad Elosofîtî*, Dar Elmewqîf El'erebî, Qahîre, R.10

paşî û serdemê Luysê çardê û li jêr çavdêrîya wî li sala 1672 kovara (Lomêrkor) derket. Evê kovarê nûçeyên civaka Firensî belav dikrin⁽³²⁾.

Dewleta Osmanî, li ser binemayên Feodalî û Begayetî peydabûye, çî binemayên dewletên modêrn û hevçerx têda nebûn, bêhtir giringî dida şer û cengê, her jiber vê yekê jî bêhtirîya deverên vê dewletê şer û pêkdadan û ne aramî têda hebûn û bi paşketî jîyan dikirin, giringî nedane zanest û rewşenbîriyê, (li dawîya sedsala hejdehê, demê çapxaneya 'Erebî înyayê Îstenbolê, desthelatdarên hukumetê dijî wê rawestiyane û zanayên ayinî Fetwe dane ku çapxane tişteki pîse û destçêkiriyê şeytanîye)⁽³³⁾.

Yekem rojname li Îstenbolê paytexta dewleta osmanî, li sala 1831 bi zimanê Firensî wekî çavlêkirinekê li rojnameya parîs ya fermî ewa bi navê (Moniteur Ottoman) derket.

Piştî salekê, wate li sala 1832 daneyek bi zimanê Turkî – Osmanî – bi navunîşana (Tequyim weqafî) jibo belavkirina ferman û deng û basên fermî yê dewletê derket, paşî jibo demekê rawestiya, dûvra careka dî derket⁽³⁴⁾.

Di sala 1865 da sultan Ebdulezîz yasaya çapemeniyê derxist. Ewe yekemîn yasabû bi vî rengî ji hukumeta Osmanî derketî⁽³⁵⁾.

Desthelatdarên Firensa li Mîsrê, li wî welatî çapxaneyên xwe birin û di encamê da rojname rawestiyan jî belavbûnê. Li sala 1819 û li ser demê Muhemmed 'Elî paşa, çapxana (Bolaq) hate damezrandin. Li sala 1828 rojnama (Weqafî Mîsriye) belavbû. Li despêkê ev rojname bi zimanê Turkî bû, paşî bi her dû zimanên Turkî û 'Erebî belav dibû, dûvra û li dawiyê bi zimanê 'Erebî dihate belavkirin. Ewe yekemîn rojnama 'Erebî bû li wî welatî derdiket. Nivîserên mezin yê wî serdemî têda

⁽³²⁾ . Dr. 'Ebdul'ezîz Şeref, *Elecnas Elî'lamîye We Tetewir Elhedarat Elîtsalîye*, Elheye Elmîsrîye El'ame Lîlkîtab, Qahîre, 2002, R.112-113

⁽³³⁾ . Fethî Elabarî, *Sehafet Elmusteqbîl Wel Tenzîm ElSiyasî*, Dar Elme'rîfe Elcamî'îye, Îskenderîye, Mîsr, 1958, Ç3, R.30

⁽³⁴⁾ . Îbrahîm Zekî Xûrşîd Ê Hindekên Dî, *Daîret Elme'arîf Elîslamîye*, B.11, R.253

⁽³⁵⁾ . Cozêf Elyas, *Tetewr Elsehafe Elsûriye Fî Maet 'Am 1865-1965*, Beşê 1, 1865-1918, Dar Elnîdal, Beyrût, 1982, Ç1, R.25

dinivîsîn. Muhemmed 'Elî Paşa bi xwe serperşitîya nivîsîna (Weqaf' Mîsrîye) dikir⁽³⁶⁾.

Belavkirina vê rojnamê bitenê jibo mirovên ma'qul, fermanberên mezin û efserên leşkerabûn, jibo xelkê sakar û sade nebû⁽³⁷⁾.

Merema serekî ji derxistina vê rojnamê, belavkirina agehdarî û beyanname û rêwresm û fermanên waliyê Mîsrê bû⁽³⁸⁾.

Di her heftiyekê da sê caran bi diwazde rûpelên qebara navîn derdiket⁽³⁹⁾.

Hindek dîroknas dibêjin yekemîn rojnama Farsî li cîhanê (Ram Mohan Roy) bû, ronakbîr û îslamî û belavkerê dîwana Hafîzê Şîrazî bû û yek ji pêşengên hizr û bîrên nû li Hîndîstanê, yek – dû jimar ji rojnamê belavkirin û şiyandine jibo welatê Îranê jî, belê bi rastî heta nuha ti şûnwarên vê rojnamê di ortê da nînin⁽⁴⁰⁾.

Ji aliyê hindek mezinên biyanî bi taybetî Ingilîza, yekemîn rojname li Bexda belav bûye, rojnama (Jornal El'îraq) bû bi zimanê 'Erebî û Turkîbû, belê jimareka zêde ya nivîskaran îsrar dikin ku rojnama (Elzewra) yekemîn rojnamebû li 'Iraqê, li roja 15- 6- 1869 di serdemê Midhet Paşa da belavbûye, çapxanek ji parîsê înbû, navê wê çapxanê (Wîlayet) bû. Rojnama Elzewra bi awayekî rêk û pêk jibo demê 49 salan belavbû heta wî demê Ingilîzan di berbanga roja 11 – 3 – 1917 gehiştine Bexda û Elzewra rawesta⁽⁴¹⁾.

"Di demê şerê cîhanê yê yekem da Kurd rastî tengaviyeka mezin bûn, û cengê doza milletê Kurd berev çareseriyê ve nebîr, Kurdistan bû meydana şerê sê leşkerên mezin ew jî leşkerê Osmanî û yê Ingilîz û Rûsan, lewra milletê Kurd nedkarî bê alîgirî bê ji rûdanên şerî û li cîhê xwe rawestê û em dikarin bêjin pişkdarî her ji

⁽³⁶⁾ . Xelîl Sabat, *Wesâil Elîtisal Neşetuha We Tetewreha*, Mektebet Enclo Elmîsrîye, Qahîre, 1999, Ç1, R.130

⁽³⁷⁾ . Fethî Elabarî, *Sehafet Elmusteqbîl Wel Tenzîm ElSiyasî*, Çavkanya Berê, R.32

⁽³⁸⁾ . Dr. Ebdulletîf Hemze, *El'lam Lehu Tarîxwe We Menahîcehu*, Dar Elfîkir El'erebî, 1965, Ç1, R.108

⁽³⁹⁾ . Yas Xidêr Elbeyatî, *Alî'lam Eldwelî Wel'erebî*, R.252

⁽⁴⁰⁾ . Hesên Hac Seyîd Cewadî, *Birsî We Tehqîq Der Edebyat Mu'aser Îran*, Întîşarat Tirwa Siz û Hîşkikran, Îran, 1382k., Ç1, R.66. Bi Zimanê Farsî

⁽⁴¹⁾ . Wirya Caf, Ktêb Gulan, H. 19, *Karwanî Rojnamegerî Kurdî*, Ç. Wezaretî Rewşenbîrî, Hewlêr, 1998, R. 5-6

despêkê ve têda kir, bê ti tişteq di destê wî da hebê, yan hezeka bi dursitî jibo şer hebê, yan berjewendiyek têda hebê⁽⁴²⁾. Û di heman demî da hukumeta yekbûyan (Elîfîhadîyun) ya berdewambû li ser tepeserkirina Kurdan û di demê şer da sê çarîk milyon Kurd derbderkirin, her weha çendîn gund û bajar wêrankirin⁽⁴³⁾.

Cenga cîhanê ya yekê û rûdanên di hundur da bûne astenga mezin di rêya pêşveçûn û şiyarbûna bizava rizgarîxwaza neteweya Kurdî da⁽⁴⁴⁾.

Yekbûyan delîveya şerî jibo lêdana bizavên rizgarîxwazên milletên dewleta Osmanî bi fîrset zanî, û ji wan bizavan bizava Kurdî⁽⁴⁵⁾.

Ya taybet bi komele û rojnamegerîya Kurdî ve, çalakiyên wê rawestiyên, di wê rewşê da bêhtirîya rewşenbîrên Kurd birine xizmeta leşkerî û jibo meydanên şer hatine virêkirin⁽⁴⁶⁾ û rêkxiraw û komele û rojname û kovarên pêş şerî damezrandin jikarketin⁽⁴⁷⁾ jibo mînak Zinar silopî dibêjê: Demê ceng berpabûy bêhtirîya endamên komela Hîwa û nivîskarên Hetawî jibo xizmeta leşkerî hatine daxwazkirin, û di encamê da çalakiyên wan ji karketin⁽⁴⁸⁾.

Li maweyê di navbera havîna sala 1914 da heta heyva çile ya sala 1918 hîç kovar û rojnameyeka Kurdî jibîlî rojname Kurdistan li Qahîre dervediketin. Li serdemê sedsala nozdehê û bîstê da û piştî derketina pêngava nû ya zansetî weke teknolojiya elkitronî û bilindibûna asta kertê çapemeniyê û cîhangîrbûna civakên cîhanê û giringî pêdana civakên cuda digel yek, li ser binemayê berjewendiyên, digel da rojnamevaniyê jî gaveka nû bixweve dît û neçarbûye digel pêşketina nû xwe biguncînê û ber bi tîkeliyê, yan jî cîhanîbûnê ve biçê, elbet Kurdistan jî ji vê pêşketinê bê behir nebûye û îro gelek caran nûçeyên Kurdistanê bûye manşetên rojnameyên cîhanî û her li ser encamê vê pêşketina nû rojnamegeriyê li cîhanê bi

⁽⁴²⁾ . Dr. Dr. Kemal Mezher Ehmed, *Kurdistan Fî Senewat...*, R.148; Si Lazarîf, Çavkanya Berê, R.415

⁽⁴³⁾ . Belec Şêrko, Ç.B., R. 59- 63; 'Ezîz Elhac, *Elqezîye Elkurdîye Fî El'îşrînat*, Bexda, 1985, Ç1, R.12 – 13

⁽⁴⁴⁾ . Dr. Dr. Kemal Mezher Ehmed, Ç.B., R. 199- 200

⁽⁴⁵⁾ . Serwe Es'ed Sabîr, *Kurdistan Min Bîdayet Elherb El'alemîye Elûla Îla Nîhayet Mûşketîl Elmûsîl 1914- 1926*, Xwendneka Dîrokî – Siyasî Û Belgelesele, Hewlêr, 2001, R. 37- 67

⁽⁴⁶⁾ . Dr. Kemal Mezher Ehmed, Ç.B., R.355

⁽⁴⁷⁾ . H.Ç., R.199

⁽⁴⁸⁾ . Dr. Kemal Mezher Ehmed, Ç.B., R.49

giştî û li Kurdistanê jî bi taybetî rolekê yekcar mezin dîtîye û pêşketina serdemiyane hembêzkişîye, mînak jî li ser asta herêma Kurdistanê piştî jimareka gelek ji kenalên asmanî û rojname û kovar û radio û sîteyên înternê... Htd derketin, digel da hevrikî li ser pêşketinê peydabûye. Rojnameya Kurdistan ev rojname rojnameyeka awarebû, bi yekcarî li ti cihan binecih nebûye, belku her maweyekê li cihekê derdiket⁽⁴⁹⁾, rojnameka nîv heyvanebû, û bi zimanê Kurdî û Turkî derdiket⁽⁵⁰⁾.

Pênc jimarên yekê, Mîqdad Midhet Bedirxan li Qahîre derxistine. Û derxistina jimarên (6- 31) birayê wî yê biçûktir (Ebdûllrehman Bedirxan) wergirtine û li bajarên cîhanê yên cuda belavkirine⁽⁵¹⁾.

Jimara (25) ji vê rojnamê hate guhertin û heyvê carekê derdiket, her jimarek ji rojnameya Kurdistan (4) rûpelbûn, bi rênivîseka kevin hatiye nivîsîn, armanc jê belavkirina zanîn û fêrkirin û şiyarkirina xelkê Kurdistanê bû, jibo bicih înana vê armancê her ji rûpelê yekê despêkrîye û hatiye nivîsîn: (her car dû hezar cerîdeya bê pare ezê rêkime Kurdistanê da bidin xelkê).

Qebareyê rojnameya Kurdistan di hemî jimarên wê da (25,5×32,5 cm) bû, duruşmê rojnamê li jimara (1-2): Kurd paldidan ku bizav û serhildanê bikin û huner û zansetê fêrbibin⁽⁵²⁾.

Belê ji jimara (3) û heta jimara dawiyê ev duruşm hate guhertin û bû (Kurd paldidan jibo bidestve înana zanset û huner û fêrbûna pend û edebê Kurdî, jimara (1-5) li bajarê Qahîre derdiket⁽⁵³⁾. Jimarên (6-9) li bajarê Cinêv derketine. Jimarên (20-23) careka dî li bajarê Qahîre derketine. Jimara (24) li bajarê Lenden derketine.

⁽⁴⁹⁾ . Îdrîs Ebdûlla Mustefa, *Le Barey Rojnamegerî Kurdiyewe (Çiwarde Lêkolînewe)*, Ç. Xanî, Duhok, 2008, Ç1, R.2

⁽⁵⁰⁾ . Hogir Tahir Tewfîq, *Rolê Rojnamegeriya Kurdî Di Pêşvebirna Hizra Neteweyî Ya Kurdî Da 1898-1918*, Wer.: Muhsîn Ebdullrehman, Ç. Hecî Haşîm, Hewlêr, 2001, Ç1, R.213

⁽⁵¹⁾ . Cemal Xeznedar, *Murşîd Elsehafa Elkurdiye*, Bexda 1973, R.17; Cebâr Muhemmed Cebârî, *Tarîx Elsehafa Elkurdiye Fî El'îraq*, 1975, R.17-18

⁽⁵²⁾ . Kemal Fuad, *Kurdistan Yekemîn Rojnamey Kurdî 1898- 1902*, Le Belawkrawekanî Binkey Edebî Û Ronakbîrî Gelawêj, Silêmanî, 2000, Ç1, R.11

⁽⁵³⁾ . 'Ebdulselam Îslam Doskî, *Rolê Binemaley Bedirxanîyekan Le Geşepêdan Û Pêşxistinî Hunerekanî Rojnamegerî Kurdî Da 1932 Bo 1946*, Wezaretî Rewşenbîrî, Berêweberayeti Çap Û Belawkirdnewe, Silêmanî, 2010, R.21

Jimarên (25-29) li bajarê folkiston li Birîttaniya derketine. Jimarên (30- 31) careka dî li bajarê Cinêv derketine.

Jimara dawiyê ya rojnameya Kurdistan ku jimara (31) li (1-4-1902) derketîye⁽⁵⁴⁾.

Hêjaye bêjin peyama rojnameya Kurdistan peyameka neteweyî – dînî bû, li wî serdemî ev hizir û bîr di nav milletên hevder û derdorên Kurdan da gelek berbelavbûn.

1.1.2 Zaravê Rojnamegeriyê

Bi pêşveçûna civakî ve, pêwîstî bi peywendiyê û têkeliyê zêdetir lê dihat, peywendîkirin (Communication) ji sê regezan peyda dibê: serçave, hokar, armanc, ev sê regez bi pêşketina jiyane birêve diçin, heta dighêje pileyeka weha ku di qonaxeka dîrokî da, mirov dikarê rojnamegeriyê wekî hokarekî (fakterekî) di vê prosêsê da bikarbînê. Her ji wê rojê rojnamegeriyê rolekê gelek mezin di durustkirin û stemkirina raya giştî û ber bi pêşvebirina civakî da gêra. Her jiber vê yekê rojnamegeriya bûye nîşanek jibo pileya şaristanî û pêşketina civakî û giringiyeka mezin pê tete dan.

Peyva rojnamegerî, yan rojnamenivîs yan rojnamevanî di zimanê Kurdî da, beramber peyva (Press) ya zimanê Ingilîzî tete bikarînan, di zimanê 'Erebî da jî, dibêjinê (Elsehafa) ramana wê pişe û kiriyara rojnamenivîsane⁽⁵⁵⁾.

1.1.3 Pênaseya Rojnamegeriyê

Her weha bi ramana (pişesaziya rojnameyan tete bikarînan)(56).

Ku ji aliyê zaravî ve jibo wê têgehê tete bikarînan (binemayên wê karê nivîsîna rojnameyên rojane û zansetê derhênaniye, heta dighêje (Tensîq) û çapkirin û firotina rojnameyan(57).

⁽⁵⁴⁾ . H.Ç.

⁽⁵⁵⁾ . Kîwî Mukiryani, *Ferhengê Kurdistan*, Dezgay Çap û Belawkirdnewey Aras, Hewlêr, 1999, Ç1, R.501

⁽⁵⁶⁾ . Dr. Yusif Mihyeddîn Ebû Helale, *Elî'lam Neşetwe Wesalibe*, Ma Yuesîr Fih, Mektebet Elrîsale Elhedîse, Eman, Êrdûn, 1978, Ç1, R.33

⁽⁵⁷⁾ . Mecdî Wehbe, *Mu'cem Mustelehat Eledeb*, Mektebet Lubnan, Beyrut, 1974, R.270

Her weha peyva rojnamegerî pêkhatîye ji: (roj) + (name) = rojname. Ew roja ku têda nîşan didê û name jî wekî nameya wê rojê hatiye destnîşankirin⁽⁵⁸⁾.

Hindek caran pênasî rojnamegeriyê ji edebî nêzîk dibê, ku dibêjinê: (rojnamegerî awêna jiyana komelayetî û siyasî û aborî serdemê xoyetiyê ye)⁽⁵⁹⁾.

Her li dor rojnamegeriyê, sêyem serokê Emerîka (Tomas Cîverson) dibêjê: eger bêjine min te hukumeteka bê rojname yan rojnameyeka bê hukumet, bê dû dilî dê ya duwê helbijêrim, li vir da merema min miroveke di nav vî milletî da ku wekî pêdivî îmkanên xwendinê hebin⁽⁶⁰⁾.

Her nîşek vî alavî li ser demê xwe û li dûv dîtî û nêrî û hizirkirina xwe bikartîne jiber vê yekê jî (Voltêr) dibêjê: Rojnamenivîsî dezgeheke kes nikarê bişkênê, belê ew cîhana kevin diherfênê bê xemet cîhaneka nû dadmezrênê⁽⁶¹⁾. Û hindek pîspor û şareza bi awayekî nûdemî pênasîya rojnamegeriyê dikin (rojnamegerî berhemê rengê peywendiyên mirovîye di sedsaliya bîstê da, xwendingehêka jimareka mezin ya xwendekaran sexmeratî fêrbûnê dû tayên zansetê ragehandinê: anku zansetê teknîkî û peywendiyên (Tele Communication) û zansetê peywendiyên mirovî (Human Communication) jibo aliyê xwe radikêşê)⁽⁶²⁾. Her di warê pênasîya rojnamegeriyê da, Pro. Dr. Todorof ji aliyekî çîneyetî ve berê xwe didê vî hunerî û dibêjê: rojnamegerî fakterê belavkirina îdiyolojiya Borcuvaizîye, hizir û bîr û rewîştên Borcuvaizî diyar dikê, bi rêkeka bileztir û misogertir û berfirehtir û bi karîgerîyeka zêdetir ji edebî belav dikê⁽⁶³⁾.

Jiber ku rojnamegerî jibo meremên cuda cuda tete bikarînan, pênasîyan corawcor jibo wê tenekirin, wekî yek ji vekolerên Emerîkî ew jî (Con R. Bitner) di vî

⁽⁵⁸⁾ . Cemîl Oguz, *Rojnamegerî û Pîvanên Wê Yên Serekî*, Berhevkrin, Muhemmed Mela Hemdî, Ç. Hawar, Duhok, 2006, R.35

⁽⁵⁹⁾ . Pro. D. Todorof, *Tarîx Elsehafê El'alemye*, Wer.: Edîb Xedûr, Elmektebe El'lameye, Dîmeşq, 1990, Ç1, R.10

⁽⁶⁰⁾ . Ehmed Bedir, *Elîtsal Bîlcemahîr Weldî'aye Eldewlîye*, Dar Elqelem, Kwêt, 1974, Ç1, R.59

⁽⁶¹⁾ . Dr. Kemal Mezher Ehmed, *Têgeyîştîni Rastî, Şiwênî Le Rojnamenûsî Kurdî Da*, Ç. Korî Zaniyarî Kurd, Bexda, 1978, R.18

⁽⁶²⁾ . 'Ebaselî Muhacirî, *Wajename 'Ulum Metbu'at û Roznamegarî*, Îngilîsî, Farsî, Danişiyar, Tehran, Îran, 1383, Ç1, R.10

⁽⁶³⁾ . Todorof, *Elsehafa El'alemye*, Ç.B., R.10

warî da dibêjê: (rojnamegerî, diyardeyeka aborî û komelayetîye di nav komelê da, hêzeka serekîye jibo çêkirina raya giştî li hemî cîhanê û karîgerîyeka gelek ya li ser xebat û têkoşîna nîştîmanî û navneteweyî heye ji rolê pêşketina aborî û têgehiştina gerdûnî ve)⁽⁶⁴⁾.

Her weha nivîskarekî dî, pileya şaristaniyê û fêrbûnê di civakê da dikête merc jibo serhildana rojnamegeriyê, çunkû ji aliyê wî ve (rojnamegerî hunerekî şaristaniyê, girêdaye bi pêşketina zansetîve, jiber ku da aloziyên civakê bigehîne xelkî, pêdvîye bi belavkirina fêrbûnê)⁽⁶⁵⁾.

Bê guman rojnamegerî sîmboleka mezin ya pêşketina mirovayetiye ye û ev pêşketin di hemî civakan da di yek ast deye, jiber vê çendê û bi pêşketina civakê û astê rewşenbîriyê xelkê wê civakê, her weha bi armanc û meremên belavkirinê, pênaseyên cuda jibo tenekirin û çend taybetmenidiyên corawcor jibo tene destînşankirin. Li sala 1928 zanayê Elman (Otogroz Ottogroth) pênc taybetmendî jibo rojnamegeriyê destînşan kirin, zanayên hevçerx yê rojnamegeriyê van taybetmendîyan bi pîverekê pesend dizanin jibo destînşankirina rojnamegeriya rast:-

Yekem: divê ya perîodîk (dewrî) bê û ji demê heftiyekê kêmtir nebê.

Duwem: divê bihête berhemînan bi awayekî mîkanîkî, li dûv vê boçûnê, rojnameyên romanî û çînî yê kevin naçîne di nav vî corî da.

Sêyem: hemî mirovan îmkanên kirînê hebin, wate jibo hemî mirovan hebê ne jibo hindek (jimareka) mirovên sînardar.

Çarem: naveroka wê ya rengîn û corawcor bê û her tiştekê giring bê jibo raya giştî têda bê, neku giringiyê bi hizrên hindeka bidê.

Pêncem: divê demê derçûnê yê diyar bê û bi awayekî berdewam li dezgehekî derkevê⁽⁶⁶⁾.

Di pênaseya rojnamegeriyê da hizir û têwrên cuda hene⁽⁶⁷⁾. Rojnamegerî weku (Nûreddîn Teraf) amajê pê kiriye bi gotina: rojnamegerî hêzeka mezine;

⁽⁶⁴⁾ . Con R. Bîtner, *Muqedîme Fî Elîtîsal Elcemahîrî*, Merkez Elkutb Elûrdûnî, Eman, Êrdûn, 1990, R.33

⁽⁶⁵⁾ . Dr. Îbrahîm Îmam, *Dîrasat Fî Elfen Elsehefî*, Mektebet Elînglo Elmîsrîye, Qahîre, 1991, R.8

⁽⁶⁶⁾ . Con R. Bîtner, Ç.B., R. 32- 34

kartêkirineka mezin heye; desthelateka berifrehe, desthelat wergirtiye belku sitandiye ji xudan desthelata lewra gotiyê xudana xweşiyê (Sahîbet Elcelale), û bi bejna xwe ya bilind xwe sepandiye di nav hêzên her welatekî birêvedibin, evca gotiyê desthelata care. (Makolî) yê Birîttanî yekem kesbû desthelata çarê li ser rojnamegeriyê danay, ew jî li sala 1828 di hevpeyvîneka xwe da li dor gengeşeya perlemanî û rolê rojnamegeriyê li dor wê⁽⁶⁸⁾.

Di warê rojnamegeriyê da Napolionê yekê (1769- 1821) gotiye: rojnamegerî yeke ji mezintirîn sitûnên şaristanî ku avedankirin li ser têtê avakirin⁽⁶⁹⁾.

1.1.4 Corên Rojnamegeriyê

Çend jiyan pêşkevê û awayên amadekirina babet û belavkirina wan berifrehtir lê bê, hind corên rojnamegeriyê dê bêhtir lê hên⁽⁷⁰⁾.

Çendîn pîver yên heyin jibo cudakirina reng û corên rojnamegeriyê wekî: pîverê corên rojnamegeriyê:

1.1.4.1 Pîverê Naverok û Hunerê Nivîsînê

Li dûv vî pîverî diyartirîn corên rojnamegeriyê ku nuha li cîhanê belavin evene:

A - Rojnamegeriya elternatîv - Alternative Journalism: Rojnamenivîsên pîşekar (şareza) vî corê rojnamegeriyê birêvedibin. Berengariyê ji kontrolkirina kompaniyên ragehandinê yên mezin dikê, ewên hewl diden awayê karkirinê û serederiyê bi rûdan û rêka çareserkirinê ya taybet bi siyasyeta bisepînin.

B - Rojnamegeriya rewşenbîriya beramber - Counter Culture Journalism: ew kesên vî corê rojnamegeriyê birêvedibin, ew ku bi awayekî lasaykeriyê rojnamegeriyê razî nabin û bizavê dikin elternatîvekê durust bikin, ku digel hez û pêdiviyên wan da biguncin.

⁽⁶⁷⁾ . Faîq Betî, *Elsehafe El'iraqye Miladuha We Tetewruha*, D.M, 1961, R.7

⁽⁶⁸⁾ . Meyzeke: Edîb Merue, Ç.B., R.60

⁽⁶⁹⁾ . Alîfîkont Fîlîp Dî Terazî, *Tarîx Elsehafe El'erebîye*, B.1, Beyrût, 1913, Ç1, R.9

⁽⁷⁰⁾ . Ebdulcewad Se'îd Rebî', *Fen Elxeber Elsehefî*, Dar Elfecir, Qahîre, 2005, Ç1, R.19

- C - Rojnamegerîya hûrdekarî - Precision Journalism:** ewên vî corê rojnamegeriyê birêvedibin rojnamenivîsên ekadîmîne, ewên jibo çespondina çemkê zansetî kardikin, nivîsîn û derhênana rojnamegeriyê, sererayi giringîdanê bi huner û nûjenkirinê, ev rojnamegerî dibêjinê (hûrdekariye, hûrdekariye, paşê hûrdekariye)⁽⁷¹⁾.
- D - Rojnamegerîya bergirîya bîr û hizran - Advocacy Journalism:** di vî corê rojnamegeriyê da, nivîser dakokiyê li ser bîr û hizrên taybet yên xwe dikê, derbirinê ji helwêst û hizrên ti aliyan nakê.
- E - Rojnamegerîya nû - New Journalism:** Evê dibêjine wî corê rojnamegeriyê, ku li salên şêstan da ji sedsala bîstê, jimareka nivîsera û rojnamenivîsan û hindê ji romanivîsan bikarînaye, têda bi hûrî çareseriyê babetan dikin, bi rêka rewanbêjiyê di dariştina raport û deng û basan da.
- F - Rojnamegerîya pîşekaran - Journalism Reviews:** Ev corê rojnamegeriyê derbirinê jibo nerazîbûna pîşekarên rojnamegeriyê, beramber karê kenalên ragehandinê dikin, û dixwazin astê babetan bihête bilindikirin, digel rewîştê ragehandinê (Media Ethicis) biguncê.
- J - Rojnamegerîya deftera çekî - Cheque Book Journalism:** Eve aristeyeka nûye di rojnamegeriyê da, rojname yan kovar babet û çîrokên seyr ji nivîseran dikrê û bi zincîre û xelean belav dikê⁽⁷²⁾.
- H - Peraşûfî - Parachute Journalism:** Ev corê rojnamegeriyê bilez piştî rûdanên germ digere jibo zûtirîn dem bighêje cemawerî.
- K - Rojnamegerîya ajansa deng û basan - Agenciy Journalism:** Eve deng û basan bi awayekê têr û tijî û bi lez amade dikê û piştî rûdanê dgerê û belav dikê.

⁽⁷¹⁾ Ebdulsemmed Îslam Doskî, *Rolê Binemaley Bedirxaniyekan Le Geşepêdan û Pêşxistinî Hunerekani Rojnamegerî Kurdî Da 1932 Heta 1946*, Wezaretî Rewşenbîrî, Berêweberayetî Çap û Belawkirdnewe, Nameyekî Doktorayê Hatiye Pêşkêşkirin Jibo Kolîja Ziman, Zanîngeha Selahedîn, Hewlêr, 2008, R.29

⁽⁷²⁾ . H.Ç., H.R.

Y - Rojnamegeriya azrandinê - Sensational Journalism: Ev corê rojnamegeriyê bi awayekî azrandin û mezinkirina rûdanan serederiyê bi babetan ra dikê û reng û reng dikê û zêdetir giringiyê bi rûdanên bê rewîşt û tawanbaran dikê⁽⁷³⁾.

1.1.4.2 Pîverê Dewrî, Yan Jî Pîverê Demê Derketinê

Ev corê rojnamegeriyê, li dîv pîverê perîotîkî û demê derketinê jî hev têne cudakirin, anku destnîşankirina demê di navbera jimareyekê û jimara dî ya dîvra, li dîv vî pîverî em dikarin bi vî awayê li xwarê dabeş bikin:

A - Rojnameya Rojane (Sibehê – Êvarî).

Ev corê rojnamegeriyê, ku rojane derdikevê rojnameye, eve giringî bi deng û basan û rûdanên rojekê didê, ku jibo 24 demjimêran rûdabê, dîsa ev core bi demê derketinê di rojekê da, dî corn: ewên sibehê derdikevin û ewên êvariyan derdikevin. Bêhtiriyaya wan sipêdeyan derdikevin. jibo nimûne li Kurdistanê wekî: rojnama xebat û Kurdistanî niwê... Htd.

B - Rojnameya Heftiyane (Heftename).

Eve heftiyê carekê derdikevin, giringî bi deng û bas û rûdanên şeş – heft rojan didin, jiber ku demekê berifreh heye jibo komkirina deng û basan û rûdanên giring, bi dirêjayî li ser di axfin. Nuha li Kurdistanê ev corê rojnamegeriyê heye, wekî: rojnameya HAWELATÎ, CEMAWER, EVRO nuha rojaneye, berê heftanebû. Dîsa kovarên heftiyane jî hene wekî kovara GULAN.

C - Rojnamegeriya Niv Heyvane

Ev rojname û kovar, ku di her heyvekê da dî caran derdikevin, wate her dî heftiya carekê, eve deng û basan û rûdanan belav dikin, ev corê rojnamegeriyê cemawer hez jê nakin, lewma ya kême, her weha ev corê rojnamegeriyê li navçeyên biçûk derdikevin⁽⁷⁴⁾.

D -Rojnamegeriya Heyvane

⁽⁷³⁾ . Ebdulsetar Cewad, *Fen Kîtabet Elexbar*, Dar Mecdelawî, Eman, Êrdûn, 2001, Ç1, R.12-13

⁽⁷⁴⁾ . 'Ebdulsemed Îslam Doskî, Ç.B., R.30

Di her heyvekê da jimarek jê derdikevê, ev corê rojnamegeriyê giringîdanê bi hindêk babetan didê ku dûr nebin ji çarçeveya pisporiyekê wekî Sipor yan Jin yan Siyaset...htd, wekî kovarên RAMAN û KARWAN û METÎN û MÊRG...htd.

E - Rojnamegeriya Demsalî (Werzî)

Ev core her sê heyva carekê derdikevê, bêhtiriyê vî corî kovarin, li bingeh û senter û dezgehên ekadîmî û pispor derdikevin, giringî bi vekolînên zansetî didin, belavbûna di nav cemawerî da ya kême, belê astê babet û keristan gelek bilinde, jibo wan corê xudan zanîn û rewşenbîriyeka berifrehin wekî: kovara (Rojnamenûs, Senterê Birayetî caran...htd)⁽⁷⁵⁾.

1.1.4.3 Pîverê Naverok û Suriştê Xwendevanan

Ev pîvere giringyê didê bi wê yekê ku babet yan jî naveroka rojnameyê yan kovarê ewa pêşkêşî xwendevanan dikin (siyasî, aborî, jin, zarok, wêje, huner, spor...Htd) bê, ev core tete dabeşkirin jibo dû pişkan:

A - Rojnamegerîya Giştî:

Ev core naverokeka giştî û rengîn bi xweve digrê, wekî siyaseta, aborî, wêje, huner, spor... Htd, û ev naveroke jibo ji hev cudane wekî rojnameya XEBAT û KURDISTANÎ NIWÊ.

B -Rojnamegerîya Pispor (Şareza):

Rojnamegeriyeka taybete ji aliyê naverokê û temenê ve, hindêk rojname hene derdikevin jibo hindêk xwendevanên taybet ku jiyekê taybet hene û hindêk jî di pisporiyekî taybet da (naverokeka taybet) derdikevin⁽⁷⁶⁾.

1.1.4.4 Pîverê Berifrehîya Jiyografîk

Merem ji vê, ewe gehiştina rojnamê yan kovarê jibo destê xwendevanan li wê dewleta lê derdikevê, yan jî li çend welatan dighêje ber destê xwendevanan û tete dabeşkirin jbo:

A - Rojnamegeriya Xwemalî

⁽⁷⁵⁾ . H.Ç., R. 30-31

⁽⁷⁶⁾ . Corên Rojnameyan Hittipis://Alsabahpress.Wordipress.Com/2011/07/09/

Ew rojnamegeriya derdikevê û tê belavkirin di çarçeveya parêzgehekê yan jî bajarekî yan jî devereka taybet.

B - Rojnamegeriya Netewî

Ew rojname yan kovara, ewên derdikevin jibo belavkirinê di nav hemî kesên li welatekî da bê alîgirîya ti aliyan yan herêman yan jî parêzgeheka taybet, û giringiyê didê bi deng û basan û rûdanan ewên li her welatekî rûdidin, her weha deng û basên cîhanê û welatî, dibê jî bête belavkirin li dervey welatî jî, li hindek welatên dî.

C - Rojnamegerîya Welatî

Hindek rojname û kovar ji sînorê welatê xwe derbaz dikin û tene xwendin li hindek welatên dî, ne li wî welatê lê derdikevê û hindek corên taybet hene tene çêkirin daku bêne xwendin ji dervey sînorî wekî: Ehrama Mîsrî⁽⁷⁷⁾.

1.1.4.5 Pîverê Ber Bi Semta Bizir û Bîrên Rojnamegeriyê ve

Li dûv vî pîverî, em dikarin dû corên vê rojnamegeriyê bibînin: -

A - Rojnamegeriya Xweser

Yan nîv xweser, eve ew corê rojnamegeriyêye, ku peywendîya siyasî li gel ti aliyên siyasî nîne, anku ti hizir û bîr û îdyolojiyên sînordarkirî nînin, her weha ne organ û peyvdarên ti girûp û ti partiyane, dergehê wê yê vekirîye jibo hemî dîtin û nêrînên siyasî û rêk û rêbazên hizirkirinê û civakî, ev corê rojnamegeriyê li Kurdistanê gelek yê kême, yan her bi yek carî nîne, belê pispor û şareza hest bi giringîya hebûna vî corê rojnamegeriyê dikin⁽⁷⁸⁾.

B - Rojnamegerîya Partiyan

Wî corê rojnamegeriyê bixweve digrê, yê ji aliyê partiyeka siyasî ve derdikevê û pareyekê baş jibo wê tê terxankirin, jiber hindê ev rojnamegerî dibê organ û axiftinkerê wê partiyê û derbirînê ji helwêst û dîtin û nêrînên wê dikê, beramber her rûdanekê û kêşeyekê ku li nav welatî û cîhanê rûdidê, her weha dibê egerek jibo gehandin û belavkirina hizir û bîr û boçûnên wê partiyê li nav civakê da,

⁽⁷⁷⁾ . H.Ç.

⁽⁷⁸⁾ Ebdulsemmed Îslam Doskî, Ç.B., R. 31-32

gelek nimûne hene jibo vî corî, taybetî li Kurdistanê gelekî, wekî rojnameya Xebat ku organê Partiya Demokrata Kurdistanê ye, her weha rojnameya (Kurdistanî Niwê) ku organê Yekîtiya niştîmaniya Kurdistanê ye, rojnameya (Alay Azadî) organê Partiya Zehmetkêşên Kurdistanê ye... Htd⁽⁷⁹⁾.

1.1.4.6 Pîverê Egerên Peywendîkirinê, Egerên Gehandina Rojnamegeriyê Jibo Xwendevanan

Rojnamegerî ne bitenê tê çapkirin li ser kaxezan daku bighêje xwendevanan, nuha dezgehên elkitronî jibo vê mebestê tene bikarînan û li dûv vî pîverî rojnamegerî dibê dû cor:-

1. Rojnamegeriya Kaxezê

Ev corê rojnamegeriyê yê kevne, li ser kaxezê û li çapxana tê çapkirin û li bazarê tê firotin.

2. Rojnamegeriya Elektironî

Ev corê rojnamegeriyê bi rêkên elektironî dighêje xwendevanî, yan jî bi rêka alavên elektironî xwendevan dikarê bixwênê, eve jî dibê sê cor:-

- A- projnamegeriya elektironî ya lezgîn **Online Journalism** Xwendevan dikarê naveroka vî corî bi rêka tor û binemayên servîsên zaniyariyan beramber aboneyekê yan bi xorayî bixwênê.
- B- rojnamegeriya elektironî neya lezgîn **Offline Journalism** Jimar û daneya vî corî yê rojnamegeriyê li ser sedemên elektironî tê tomarkirin wekî CD yan filopî, web site.
- C- mşeweyekê nû li ser rêk û fakterên nû tene tomarkirin û bi kombiyuterîve tene girêdan, wekî rojnamegeriya Dîskê Ronahiyê **Tablet News Paper**, yan jî ew rojnamegeriya ji rojnamegeriya kaxezê tê amadekirin⁽⁸⁰⁾.

1.1.4.7 Pîverê Yasayî

Li dûv vî pîverî rojnamegerî dibê dû cor:

- 1) rojnamegeriya yasayî, yan ya eşkere. (**Legal**)

⁽⁷⁹⁾ . H.Ç., R.32

⁽⁸⁰⁾ . Ebdulcewad Se'îd Rebî', *Fen Elxeber Elseheft*, R.24

2) rojnamegeriya neyasayî, yan ya veşartî. (Illegal)

Ev herdû corên rojnamegeriyê pêdivî bi sîstemê siyasî û destûrê welatîne, her desthelatekê sîstemê xwe yê taybet heye, destûrek çarçevê yasayî yê wê desthelatê destnişan dikê, û li dûv wî destûrî jibo her warekî yasayekê didanê. jibo rojnamegeriyê jî yasayek dê hebê, dikarê rojnamegeriyê da pêdivîye ew yasaye bê li li berçav wergirtin.

Di sîstemê demokratî da derxistina rojnameyekê yan kovarekê pêdivî bi moletê nabê, belê di sîstemê dîktatorî da her tiştek bê belavkirin û derbikevê pêdivî bi moletê heye û gelek caran rêk nahê dan jibo hemî kesan yan girûpekê yan partiyekê, ku rojnameyekê, yan jî kovarekê derbêxê. Û çunkû molet jibo nayê dan, neçarî dibin rojnamegeriyê bi awayekê veşartî derbêxin jibo mînak gelek rojnamegeriya Kurdî ya serdemê şoreşê diçê di bin rojnamegerîya nihênî (ne fermî) de⁽⁸¹⁾.

1.1.4.8 Pîverê Xudanwarî (Sipartî)

Bêhtirîya welatên cîhanê, bi taybetî di welatên rojava ewên sinaveka dûr û dirêj ya demokrasîyê heyî, hukumeta xudan rojnamegerî nîne⁽⁸²⁾.

Belê li hindêk welatên dî bi sîstemekê siyasî, hukumet tê di nav meydanê da. Li dûv vî pîverî rojnamegerî dibê dû cor:-

A - Rojnamegeriya Hukumî, yan ya fermî:-

Ev rojnamegerîye kardikê jibo berjewendîya hukumetê, propogendaya siyasî dikê û dibê organ û helwêst û derbirînê ji nêrînên hukumetê dikê, beramber her rûdanekê û pirs û kêşeyekê, ku li nav welatî, yan jî ji dervey welatî rû bidê, her

⁽⁸¹⁾ . Jibo Zaniyariyên Bêhtir Li Ser Rojnamegerîya Nihênî Ya Kurdî Temaşe Bike:-

1- Newşêrwan Mustefa Emîn, *Çend Lapereyek Le Mêjûy Rojnamewanî Kurdî 1938-1958, Rojnamewanî Nhênî*, B.3, Beşî Yekem, Silêmanî, 2004.

2- Newzad 'Elî Ehmed, *Raberî Rojnamegerî Nhênî Kurdî*, Wezaretî Rewşenbîrî, Berêweberayeti Çap û Belawkirdnewe, Silêmanî, 2001, Ç1.

Ebdulsemmed Îslam Doskî, Ç.B., R.33

⁽⁸²⁾ . Se'deddîn Xidir, *Elsehafe Wel'esr*, Rêveberîya Karubarên Rewşenbîrî Û Belavkirinê, Însiklopediya Biçûk, 187, Bexda, 1986, R.79

wesa yasa û biriyarên hukümetê belav dikin. Karmendên vî corê rojnamegeriyê, wekî fermanberên hukümetê serderî digel tê kirin⁽⁸³⁾.

B - Rojnamegeriya Ne Hukumî, Yan Ne Fermî

Ev core yê xwesere anku ser bi ti aliyên siyasî, pîşeyî ve nîne, derbirîna bîr û boçûnên ti aliyekî siyasî nakê, anku bi hemî rûpelên xweve dikê jibo bîr û boçûnên hemî komel û siyaseta û civakan sererayî bîr û boçûnên wan yê cuda⁽⁸⁴⁾.

1.2 Ew Lêkolînên Edebî Li Ser Rojnamegerîya Kurdî Li Devera Badînan (1991-2000)

Piştî serhildana pîroz sala 1991ê û rizgarkirina her sê parîzgehên (duhok û hewlêr û silêmanî) ji dagîrkeran û nemana desthelata be'siyana li van parîzgehên navbirî, û çunkû rewşenbîrî bi giştî û rojnamevanî bi taybetî li bin sîbera aşî û azadyê werarê dikin, bizava rewşenbîrî û edebî li kurdistanê jibo cara yekem di vê qonaxê da berev pêşveçûye û kariye alyekî mezin ji griftên rewşenbîran li kurdistanê çareser bikê.

Her weha ji aliyê siyasî, aborî û rewşenbîrî ku berî vê qonaxê nedkarîna dirêjayê bi weşana xwe bîna, karîna bibîne alavekî bi hêz di vê qonaxê da jibo pêşvebirna bizava rewşenbîrî û werara edebî û bûye egerekê serekî yê serhildana bizava wergêrana edebî û encamdana corên vekolînên edebî û belavbûna wan di rojname û kovaran da mîna:

1.2.1 Rojname

Ew rojnamene ewên me di vekolîna de wergirtî evên jê rî ne:

1.2.1.1 Rojnameya Botan(1991 - 1992)

Rojnameka Siyasî û Rewşenbîrî Giştîbû, her pazdeh rojan carekê derdiket, ji aliyê partiya gela demokrata kurdistanêve, tayê Duhokê, bi zimanê Kurdî û bi zaravê kurmançî û soranî dihate weşandin, ji vê rojnamê (13) jimar derketine û ji jimara yekê despêkrîye ku li roja sêşembê 25- 6- 1991 derketîye û jimara dawî jî li dawîya heyva tebaxa sala 1992 derketîye. Desteya nivîskarên

⁽⁸³⁾ . Ebdulsemed Îslam Doskî, Ç.B., R.33

⁽⁸⁴⁾ . Corên Rojnamegeriyê, <https://Alsabahpress.Wordpress.Com/2011/07/09/>

xwe ebebûn: Se'îd Dêreşî, Necîb Ballayî, Muhsin Qoçan, Behcet Hirurî, Kerîm Biyanî. Her weha jimara dawî ji (8) rûpelan pêkhatibû û nêzîkî (100) dane dihatine çapkirin. Jibo mînak bê: "Di jimara 2 da, gotarek bi navê (Hozanvanê Canemerg û Pêzanînên Alîxanê, ku Isma'îl Badî nivîsîbû, sîniyalên vekolînê di vê gotarê da tene dîtin"⁽⁸⁵⁾.

1.2.1.2 Rojnama Peyman(1994- 2003)

Rojnameka Siyasî û Rewşenbîrî Giştîbû, bi zimanê Kurdî û bi zaravê kurmancî, nîv heyvanebû, ji aliyê dezgehê Xanî yê rewşenbîrî û ragehandinê ve derdiket, ji vê rojnamê 413 jimar derketine, jimara yekê li roja dûşembê 11 - 7- 1994 û jimara 413 bûye jimara dawî li roja 16- 4- 2003 derketîye, her weha dû rûpel bi elfebaya latînî Jibo parçeyên dî yên kurdistanê dihate derêxistin, desteya nivîskarên vê rojnamê ebebûn: Xudanê îmtiyazê: Hebîb Keleş, sernivîskar: Edîb Nadir, sekretêrê nivîsînê: Behcet Hirurî.

"Di jimara (2) da gotarek hatiye bi navê (Koçka Nemiran) ji aliyê (Ehmedê Nalbend) hatiye nivîsîn, li dor hozanvanê mirovayetî Ehmedê Nalbend (1890- 1963) hatiye nivîsîn"⁽⁸⁶⁾.

1.2.1.3 Rojnama Resen(1995- 2010)

Rojnameka rewşenbîrî giştîye, nîv heyvaneye, bi zimanê kurdî zaravê kurmancî derdikevê, ji aliyê Ragehandina Melbendê sê yê Partiya Yekgirtûyê Îslamî, liqê Duhokê ve belav dibe. Yekem jimara vê rojnamê li roja 1- 9- 1995 li parêzgeha Duhokê derketîye û hijmara 504 bû dawî hijamare di rojnamê de li roja 8-9-2010 derketiye.

Li despêka derêxistna vê rojnamê (Ehmed Husên Zawîteyî) xudanê îmtiyazê bû, sernivîskar jî: Sadiq Hamid Nizarkî bû, rêveberê nivîsînê: Mihemed Îsa, desteya nivîskaran: Mihemmed Salih Hecî, Nazim Salih Rêkanî, Selah Qasm Amêdî, Mihemmed Sadîq Koçer.

Bi berdewamî guherîn di Sitafê rojnamê da hatiye kirin, lê vekolînên giring têda hatine belavekirin, Jibo mînak: "Gotarek bi navê (Ma Îslamê Edebê

⁽⁸⁵⁾. Isma'îl Badî, *Hozanvanê Canemerg*, Rojnama Botan, Duhok, H.2, 14-8- 1991, R.5

⁽⁸⁶⁾. Ehmedê Nalbend, *Koçka Nemiran*, Rojnama Peyman, Hijmarên 16 - 17, 1995, R.3

Kurdî Paş Êxsiîye?!) hatiye nivîsandin ji aliyê Isma'îl Ibrahîm Silêman ve, di vê gotarê da ev babet hatiye şîrovekirin û vekolînkirin"⁽⁸⁷⁾.

1.2.2 Kovar

Ew Kovar ewên me di vekolîne de wergirtî evên jêrêne:

1.2.2.1 Kovara Tîroj(1991- 1992)

Eve yekem kovare li bajarokê sêmêlê derdikevê û kovareka rewşenbîrî û gişîye, bi zimanê kurdî û heyvê carekê derdiket, ji aliyê bingehe rewşenbîrî yên ser bi (Y.N.K) komîta sêmêlê ve dihate weşandin, ji vê kovarê (12) jimar derketine û jimara yekem jî li heyva tebaxa sala 1991 derketiye û jimara dawî jî li heyva tîrmeha sala 1992 derketiye. Desteka nivîskaran ya evê kovarê evene: Ibrahîm Ehmed Simo, Bilind Mihemmed Tahir, Hesên Ibrahîm Ebdulla, Ismet Mihemmed Bedel, Kurmanc Hekarî.

Di kovara Tîroj da gotarek bi navê (Romannivîsekî Kurd Li Ewropa) ji aliyê Hazim Hacanî ve hatiye nivîsîn, di vê gotarê da behsa romanê hatiye kirin û rewşa romanê hatiye şîrovekirin⁽⁸⁸⁾.

1.2.2.2 Kovara Nûxwazî(1991- 1992)

Ev kovare girêdayi ye bi pêla nûxwazîya devera behdînan, ew gurupa bi navê (Nûkirin Her û Her). Kovareka wêjeyî û hunerî bû, ji aliyê hindêk nivîskarên Duhokê ve dihate derxistin, bi zimanê kurdî zaravê kurmançî, bi awayekî demsalî (werzî) dihate derxistin, bi giştî sê jimar ji vê kovarê hatine weşandin, jimara yekem jî li naverasta sala 1991 bi alavê fotokopî hatiye derxistin, jimara sêyem jî bûye jimara dawî ji vê kovarê, desteka nivîskaran ji van nivîskarên hêja pêkhatibû: selman kovlî, şukrî şahbaz, Dr. Fazil Omer, Muhsîn Qoçan, Hizirvan Ebdulla, Celal Mustefa, Muhsîn Osman, Isma'îl Badî, Se'îd Dêreşî, Isma'îl Mustefa, Necîb Balayî.

Di jimara (3) da, gotarek hatiye bi navê (Projê Beyanêkî Helbestî) ji aliyê Kerîm Deştî ve hatiye nivîsîn. "Di vê gotarê da li ser helbestê û rawestiyaye û

⁽⁸⁷⁾ . Isma'îl Ibrahîm Silêman, *Ma Îslamê Edebê Kurdî Paş Êxsiîye?!*, Rojnama Resen, Ç. Wezaretê Rewşenbîrî, Hewlêr, H. 6, Roja 24- 11- 1995, R.4

⁽⁸⁸⁾ . Hazim Hacanî, *Romannivîsekî Kurd*, Ko. Tîroj, H. 2, 1991, R.5

şîrovekirîye. Hêjay gotinêye, ev kovar qebarê wê 29,5×20cm bû, û ji (54) rûpelan pêkhatibû, bihayê her daneyekê jî (1) dînarbû"⁽⁸⁹⁾.

1.2.2.3 Kovara Rasterê (1992- 1994)

Kovareka rewşenbîrî - îslamî - tebayî bû, ji aliyê Yekîtiya Zanayên Îslamî liqa Duhokê ve derdiket, bi dû zimanan, bi zimanê Kurdî zaravê Kurmancî û bi zimanê Erebî jî, heyvanebû, yekemîn jimar ji vê kovarê li heyva remezana sala 1412 mişextî = adara sala 1992 li bajarê Duhokê derketîye.

Ji vê kovarê (17) jimar hatine derxistin, jimara 17 jimara dawîye, ew jî li heyva Nîsan û Gulana sala 1994 derketîye, desteka nivîskarên vê kovarê jî evene: Mella Hemedî Ebdulmecîd, Tehsîn Doskî. Qebarê kovarê (20,5×16 cm) bû, jimarên (1 - 2) ji (38) rûpelan pêkhatibû, di jimara (17) da (36) rûpel hebûn.

"Di vê kovarê da, gotarek hatiye bi navê (Hozaneka Ne Belavkirî Ya Nalbendî) ji aliyê Mella Ebdulgefâr Mihemmed Selîm ve hatiye nivîsîn, di vê gotarê da sînyal daye vekolîna wêjeyî û helbesta Nalbendî hatiye şîrovekirin"⁽⁹⁰⁾.

1.2.2.4 Kovara Çeper(1992)

Kovareka siyasî û rewşenbîrî ya giştîbû, ji aliyê Partiya Zehmetkêşa Kurdistanê, liqa Duhokê ve dihate derxistin, bi zimanê kurdî, zaravê kurmancî û heyvanebû, jimara (0) li heyva gelavêja sala 1992 derketîye ku ji (32) rûpelan pêkhatibû, û tenê dû jimar jê derketine. Qebarê kovarê (22,5×16,5 cm) pêkhatibû.

"Di vê kovarê da gotarek bi navê (Emîn Bozarşlan û Nivîseka wî) ji aliyê Sekvan yusivî ve hatiye nivîsandin, vekolîn li ser babetî hatiye ravekirin"⁽⁹¹⁾.

⁽⁸⁹⁾ . Kerîm Deştî, Projê Beyanêkî Helbestî) Ko. Nûxwazî, H.3, 1992, R.19 – 22; Jibo Zêdetir Pêzanînan Meyzeke: *Rojnamevaniya Kurdî Di Navbera Bizava Siyasî û Rewşenbîrî Da*, Berhevkin: Isma'îl Badî, 2004

⁽⁹⁰⁾ . Ebdulgefâr Mihemmed Selîm, *Hozaneka Ne Belavkirî Ya Nalbendî*, Ko. Rasterê, H.5, 1992, R16-17

⁽⁹¹⁾ . Sekvan Yusivî, *Emîn Bozarşlan û Nivîseka Wî*, Ko. Çeper, H. (0), Sala 1992, R.24- 26

1.2.2.5 Kovara Serhildan(1993- 1996)

Kovareka siyasî û rewşenbîrî û giştîbû, ji aliyê komîta (çarê) ya Yekîtiya Nîştmaniya Kurdistanê, liqa Duhokê ve derdiket, jimara yekê li heyva sibata sala 1993 derketîye, di vê kovarê da jimara 16 di heyva huzêrana sala 1996 da li bajarê Hewlêrê derketîye, jimara 16 bûye jimara dawî ji vê kovarê, desteka nivîskaran: Hesên Kuyistanî: xudanê îmtiyazê, Sitar Elî: sernivîskar, Ebdulrehman Mzûrî cîhgirê sernivîskarî bû, Celal Mustefa rêveberê nivîsînê bû, Îdo Baba Şêx, Fazil Omer, Hecî Ce`fer, Mihemmed Salih Zêbarî, Muhsîn Osman, Nîzar Ehmed Ubêd, Hebîb Mihemmed Hesên, Hesên Kofî jî nivîskarên wê bûn.

Jimara (2) da gotarek bi navê (Hozan û Kawdanên Nû) hatiye nivîsîn ji aliyê Îsmet Mihemmed Bedel ve. Di vê gotarê sîniyal daye vekolîna wêjeyî û ravekrîye⁽⁹²⁾.

1.2.2.6 Kovara Metîn (1991 - 2015)

Kovareka siyasî rewşenbîriye, ji aliyê ragehandina liqa yekê ya Partiya Demokrata Kurdistan li Duhokê derdiket, bi devoka kurmancî û bi zimanê Kurdî û 'Erebî derdiket û kovareka heyvanebû.

Her weha ev kovare temamkerê wê kovarê bû ewa xulên li nav şoreşê di salên heştêyan da li rojanên şoreşa gulana li devera Kumatey û zêweşkan li deverê derdiket wekî belavokeka girîng ya bi nav û dengbû, ji aliyê liqa yekê ya Partiya Demokrata Kurdistanê ve bi devoka kurmancî û bi zimanê Kurdî û 'Erebî derdiket, jimara yekê ji vê belavokê di heyva nîsana sala 1981 da li biryargeha liqa yekê ya Partî Demokratî Kurdistan li Kumatey derket, dawî jimar jî ji vê belavokê jimara 72 ye li dawîya heyva nîsana sala 1988 derketîye⁽⁹³⁾ û jiber enfalên reş ku bi ser devera behdînan ve hatîye ev belavok rawestiyaye. Ê despêkê van nivîskaran têda

⁽⁹²⁾ . Îsmet Mihemmed Bedel, *Hozan û Kawdanên Nû*, Ko. Serhildan, Weş. Rewşenbîrî, Hewlêr, 1993, H. 2- 3, R.38

⁽⁹³⁾ . Wesfî Hesên, *Rojnamegerî Li Devera Behdînan (1950- 2005)*, Ç2, Weşanên Dezgehê Xanî, Duhok, 2012, R.30-31

xebatkirîye: Dr. Rizgar Zaxoy sernivîskar, 'Ebdulselam Berwarî û Sebrî Bamernî û Edîb çelkî, 'Imad Cemîl Mizûrî jî hevkarên belavoka Metîn bûn li wî serdemî⁽⁹⁴⁾.

Her weha kovara Metîn di xula sê da yekem jimar li heyva eylûn û çirîya yekê li sala 1991 derketîye. Û jimara 132 dawî jimara di vê kovarê da li sala 2003 derketîye.

Li huzêrana sala 1991 desteya nivîskarên kovara Metîn li biryargeha liqa yekê li zawîte hatiye destînîşankirin, despêkê bi vî away bû:

Dr. Rizgar Zaxoy sernivîskarbû, endam jî evên jêrê bûn: 'Ebdulkerîm Fîndî, Enwer Mihemed Tahîr, Reşîd Fîndî, Remezan 'Îsa⁽⁹⁵⁾.

Di vê kovarê da gotarek bi navê (Xwendinek Bo Helbesta Kêçxane) ji aliyê Hoşeng Şêx Mihemed ve hatiye nivîsîn, di vê gotarê da li ser vê helbestê sekinîye û îşaret daye vekolînên wêjeyî li dor helbestê û hatine ravekirin⁽⁹⁶⁾.

Her weha gotareka dî bi navê (Şanamey Firdewsî) ji aliyê Ehmed Berzencî ve hatiye nivîsîn, di vê gotarê da lêkolînên edebî li ser şanamey Firdewsî hatine şîrovekirin⁽⁹⁷⁾.

Her weha kovara Metîn di xula çarê da bû kovareka ramiyarî û rewşenbîrî giştî ya serbixwe, ev xule jî bû temamkera xula sê, di xula çarê da jimara 232 bûye jimara dawiyê. Li heyva çirîya yekê sala 2015 derketîye. Desteka nivîskaran di vê xulê da bi vî awayî bû: xudanê îmtiyazê Enwer Mihemed Tahîr, sernivîskar Muhsîn Qoçan. Endam jî evene: Bavê Nazê, Dr. Selah Hirûrî, Hizirvan, Erşed Hîto.

1.2.2.7 Kovara Laleş (1993- Heta Nuha Berdewame)

Kovareka demsalîye, ya taybete bi dîrok û çanda Êzdyan, ji aliyê desteya Bingehê Laleş yê rewşenbîrî û civakî ve li parêzgeha Duhokê derdikevê, bi zimanê Kurdî zaravê kurmancî û zimanê Erebî û Êngilîzî û beşek jê bi elfebaya Latînî belav dibê ji bo kurdên bakur, jimara yekê li payîza sala 1993 derketîye.

⁽⁹⁴⁾ . H.Ç., R.31

⁽⁹⁵⁾ . H.Ç., R. 62- 63

⁽⁹⁶⁾ . Hoşeng Şêx Mihemed, *Xwendinek Bo Hozana Kêçxane*, Ko. Metîn, J. 69, Çirya Yekê, 1997, R. 43- 49

⁽⁹⁷⁾ . Ehmed Berzencî, *Şanamey Firdewsî*, Ko. Metîn, J.70, Mijdara Sala1997, R.49-30

Desteka nivîskarên kovara Laleş: Xidir Pîr Silêman xudanê îmtiyazê, Mecîd Baba Şêx, Xeyrî Ne'mo cêgrên sernivîskarî bûn, Mirad Mado rêveberê nivîsînê, endam jî ebebûn: Bedel Feqîr Hecî, Mecîd Heso, Zêdo Ba'edrî, Dexîl Şemo, Şêrdil Simo. Heta niha ev kovar berdewame.

Di vê kovarê da gotarek bi navê (Laleş Di Helbesta Kurdî Da) ji aliyê Mecîdê Heso hatiye nivîsîn, di vê gotarê da sînyal daye vekolînê û têda ev sînyal bi rengê xuya diyar dibê⁽⁹⁸⁾.

1.2.2.8 Kovara Gazî(1994- 2000)

Kovareka rewşenbîrî giştî bû, ji aliyê Dezgehê Ragehandina Gazî ve, li bajarê Duhokê derdiket bi awayekî heyvane, bi zimanê Kurdî zaravê kurmancî, jîmara yekê li mijdara sala 1994 derketîye, jîmarên (4-5) bi yek berg di heyvên (Adar û Nîsana) sala 1995 derketine.

Ji vê kovarê 65 jimar derketine, jîmara dawiyê jî di sala 2000 da belavbûye. Desteka nivîskaran: Ebdulla Salih xudanê îmtiyazê, Mihemmed Seîd Jorî sernivîskar, Beşar Kêkî sekretêrê nivîsînê, Sitar Taha rêveberê nivîsînê, endam jî ebebûn: Mueyed Teyib, Ismayîl Badî, Behcet Hirurî, Ce'fer Ibrahîm, Reşîd Fîndî, Fehmî Balayî, Huşiyar Rêkanî... Htd) berdewam guhartin li ser sitafî dihatine kirin.

Qebarê kovarê (20×14,5 cm) mijarên kovarê bêhtir (siyasî, zanistî, hunerî, wêjeyî, werizî, çîrok, helbest, pexşan, rexneyî... Htd).

Di jîmara (34) da gotarek hatiye, bi navê (Seruberê Romanê Li Deverê) ji aliyê Îzet Fîndî ve hatiye nivîsîn, di vê gotarê da sînyal daye vekolînê û hatîye ravekirin⁽⁹⁹⁾.

1.2.2.9 Kovara Vejîn(1995- 2002)

Kovareka rewşenbîrî û dîrokî ya giştî bû, bi zimanê Kurdî, zaravê kurmancî û zimanê Erebbî dihate belavkirin, bi awayekî demsalî derdiket, jîmara yekê di demsala payîza sala 1995 da derketîye, û jîmarên (18 - 19 - 20) di sala

⁽⁹⁸⁾ . Mecîdê Heso, *Laleş Di Helbesta Kurdî Da*, Ko. Laleş, H. 2, Bingehe Laleş Yê Rewşenbîrî Û Civakî, Hewlêr, 1994, R.38-39

⁽⁹⁹⁾ . Îzet Fîndî, *Seruberê Romanê Li Deverê*, Ko. Gazî, Ç. Hawar, Duhok, 1997, H. 34, R.28

2000 da derketine, jimara (29) dawî jimarbû ji vê kovarê ku li payîza sala 2002 belavbûye.

Desteka nivîsînê ebebûn: xudanê îmtiyazê Mela Hemdî Ebdulmecîd Elselef, sernivîskar Tehsîn Ibrahîm Doskî, sekretêrê nivîsînê Nayif Mîkayîl Tahîr, endam jî Mihemmed Emîn Doskî, Me'sud Husên Botanê, Nî'met Allah Mihemmed Nihêlî.

Di vê kovarê da gotarek bi navê (Resenî Di Karê Edebî Da) ji aliyê Nayif Mîkayîl Tahîr ve hatiye nivîsîn, di vê gotarê da vekolîn hatiye şîrovekirin⁽¹⁰⁰⁾.

1.2.2.10 Kovara Duhok(1997- 2007)

Kovareka rewşenbîrî giştîbû, ji aliyê serokatiya Bajêrvaniya Duhokê ve derdiket bi zimanê Kurdî û zaravê kurmançî û bi zimanê Erebî, jimara yekê li heyva eylûna sala 1997 derketîye, jimara (34) jimara dawiyê ye ji kovarê li sala (2007) derketîye, di jimara (10) da ya sala 2000.

"Desteka nivîskaran: xudanê îmtiyazê Yunis Ebdulezîz, sernivîskar Ebdulfetah Elî Botanî, Musediq Tovî sekretêrê nivîsînê bû, sitafê kovara Duhok her qonaxekê hindekin"⁽¹⁰¹⁾.

Di vê kovarê da gotarek heye bi navê (Nişterê Rexnê Ê Helçûna Xuyinê) ji aliyê Mihemmed Emîn Doskî ve hatiye nivîsîn, di vê gotarê da vekolîn hatiye ravekirin⁽¹⁰²⁾.

1.2.2.11 Kovara Dîcle(1998-2001)

Kovareka rewşenbîrî û siyasî û giştîbû, ji aliyê wezaretê rewşenbîrî ya hukumeta herêma kurdistanê ve dihate derxistin, bi zimanê Kurdî, zaravê kurmançî û bi elifbaya Latînî li Duhokê derdiket û heyvane bû. Jimara yekê ji kovarê li heyva sibata sala 1998 destpêkirîye û 42 jimar ji vê kovarê belavbûne.

⁽¹⁰⁰⁾ . Nayif Mîkayîl Tahîr, *Resenî Di Karê Edebî Da*, Ko. Vejîn, Ç. Hawar, Duhok 1995, H. 1, R.101-108

⁽¹⁰¹⁾ . Ji Bo Bêhtir Pêzanînan Li Ser Sitaf Ê Nivîskarên Ko. Duhok, Meyzêne: *Bîbloyafya Ko. Duhok Li Salên (1997- 2003)*, Berhevkin: Salih Casim Osman, Qadir Casim Osman, Duhok, 2004.

⁽¹⁰²⁾ . Mihemmed Emîn Doskî, *Nişterê Rexnê Ê Helçûna Xuyinê*, Ko. Duhok, Weşanên Xebat, Duhok, 1998, H. 2, R.27- 32

Jimara 42 jimara dawyê ye li heyva eyluna sala 2001 derketîye. Desteka kovarê ebebûn: wezîrê rewşenbîrî xudanê îmtiyazê bû, Ebdulkerîm Fîndî sernivîskarbû, Remezhan Îsa sekretêrê nivîsînê, Îzet Fîndî rêveberê nivîsînê. Endam jî ebebûn: Heval Zaxoy, Salar Fîndî, Derbaz Mustefa, Segvan Cemîl, Ismayîl Taha Cangîr.

Di jimara (1) da ya sala 2000 gotarek hatiye bi navê (Yılmaz Guney Nivîskar Û Derhêner) ya nivîskar Ismayîl Badî, têda sînyal daye vekolîna wêjeyî û hatiye ravekirin⁽¹⁰³⁾.

1.2.2.12 Kovara Huner(1998- 2009)

Kovareka hunerîbû, taybet Jibo rengên hunerî bû, ji aliyê cvata blind ya hunerî li parêzgeha Duhokê derdiket bi zimanê kurdî, zaravê kurmancî û awayekî demsalî belav dibû. Jimara yekê di heyva tebaxa sala 1998 û jimara dawyê (41) bû li dawîya sala 2009 derketîye, desteka nivîskaran: Ebdulezîz Teyîb xudanê îmtiyazê, Ibrahîm Îsa sernivîskar, Mihemmed Elî Etruşî sekretêrê nivîsînê bû. Endam jî ebebûn: Rifet Receb, Sîrwan Şakir, Reşîd Elî, Mihemmed Omer, Mesud Arif, Bijyar Mihemmed. Sitafê kovarê di gelek qunaxan da hatiye guhartin.

Di vê kovarê da gotarek bi navê (Sitrana Fulklorî) ji aliyê Îsif Îşabazî ve hatiye nivîsîn, di vê gotarê da vekolîn li ser sitrana kurdî hatiye kirin û hatiye şîrovekirin⁽¹⁰⁴⁾.

1.2.2.13 Kovara Zankoya Duhok (1998 - Heta Nuha Berdewame)

Kovareka Mirovayetî - Ekdîmiye, ji aliyê serokatiya zankoya Duhok derdikevê, bi devoka kurmancî bi zimanê Kurdî û 'Erebî nîv salaneye, yekem jimare ji vê kovarê li heyva tebaxa sala 1998 derketîye, heta nuha xebatên vê kovarê berdewamin, despêka nivîskaran ji van nivîskaran pêkhatiye: sernivîskar Dr. Se'îd Isma'îl Silêvaney, sekreterê nivîsînê Dr. 'Ebdullfetah 'Elî Botanî, sitafê kovarê gelek qonaxan hatiye guhartin mîna Dr. Nazm Silêman Ciqsî sernivîskar, sekreterê nivîsînê Dr. Mewlûd Hemed Nebî, endam jî evene: Dr. Xeyrî Mihemed Se'îd, Dr. Odîd 'Odîşo Asî, Hêja Cebar Paşa 'Elî, Dr. Izeddîn Hesên Cemîl, Hêja Taha Zubêr Serhan,

⁽¹⁰³⁾ . Ismayîl Badî, *Yılmaz Guney Nivîskar Û Derhêner*, Ko. Dîcle, H. (1), Duhok, 2000, R.32-34

⁽¹⁰⁴⁾ . Îsif Îşabazî, *Sitrana Fulklorî*, Ko. Huner, Ç. Hawar, Duhok, 2000, H.9, R.7-8

Dr. Tarîq Heme Kerîm, Dr. Selah 'Ebdal 'Ezo, Dr. 'Ebdulmecîd Silêman Zahîr, Dr. Se'dî Salih Mihemed, Hêja Cotiyar Mihemed Reşîd.

Di vê kovarê da gotarek bi navê (Şêwazên Cevengê Di Hozanên Hozanvanên Devera Behdînan Da (1970 - 1991) ji aliyê 'Îmad Weysî Xalîd û Mihemed Bekir Mihemed ve hatiye nivîsîn, di vê gotarê da îşaret êxistîye li ser vekolînên wêjeyî û şêwazên cevengên hozanvan hatiye ravekirin⁽¹⁰⁵⁾.

Mîna gotareka dî bi navê (Binemayên Avakirna Şanoya Zarokan) ji aliyê Îbrahîm Ehmed Simo û Nijîn 'Omer Hesên hatiye nivîsîn. Di vê gotarê da îşaret daye vekolînên wêjeyî û binemayên şanoya zarokan hatîne ravekirin⁽¹⁰⁶⁾.

1.2.2.14 Kovara Bîyav(1999 -2014)

Kovareka rewşenbîrî û hizrî û rexneyî bû, ji aliyê bizava rewşenbîrî li bajarê Akrê derdikevê, bi zimanê Kurdî zaravê kurmançî bi awayekî demsalî, yekem jimara vê kovarê li heyva sibata sala 1999 derketîye, heta niha (42) jimar belavbûne, jimara dawyê jî li sala (2014) derketîye, desteka nivîskaran ji van nivîskaran pêkhatîye: xudanê îmtiyazê Karwan Akreyî, sernivîskar Azad Dartaş, sekretêrê nivîsînê Emîn Botanî, endam jî evene: Ebdal Nurî, Macid Akreyî, Emîr Fîndî, Cemal Ebdulla, li dûv çend astan ev sitaf guhartin bi ser da hatiye.

Her weha jimara çarê li havîna sala 2000 belavbûye û qebarê wê (24×18cm) û çendîn nivîskaran berhemên xwe têda belavkirne, wekî kelepûr, helbest, roman, felsefe, mijarên rexneyî, mînak: Dr. Fazil Omer, Muhsîn Aware, Adil Osman, Şemal Akreyî û gelekên dî.

Di vê kovarê da gotarek bi navê (Dema Cudahiyê Hembêz Diket) ji aliyê Azad Dartaş ve hatiye nivîsîn, di vê gotarê da sînyal êxistîye li ser vekolîna wêjeyî û ravekirîye⁽¹⁰⁷⁾.

⁽¹⁰⁵⁾ . 'Îmad Weysî Xalîd û Mihemed Bekir Mihemed, *Şêwazên Cevengê Di Hozanên Hozanvanên Devera Behdînan Da - 1970- 1991*, Ko. Zankoya Duhok, Ç. Hawar, Jimar 2, 2004, R.1-21

⁽¹⁰⁶⁾ . Îbrahîm Ehmed Simo û Nijîn 'Omer Hesên, *Binemayên Avakirna Şanoya Zarokan*, Ko. Zankoya Duhok, Ç. Hawar, 2012, J.1, R. 23- 39

⁽¹⁰⁷⁾ . Azad Dartaş, *Dema Cudahiyê Hembêz Diket*, Ko. Bîyav, Ç. Zankoya Selaheddîn, Hewlêr, 1999, H. 1, R.6

1.2.2.15 Kovara Peyv(1993- Heta Niha Ya Berdewame)

Jibo yekemîn car kovarek bi navê (kovara Peyv) li devera Behdînan, bajarê Duhokê bi kurmancyeka zelal ji aliyê Yekîtiya Nivîskarên Kurd, tayê Duhokê ve derdikevê, jimara yekê li heyva sibata sala 1980 derketîye, ji berhevkirina (Ehmed Ebdulla Zero) li çapxana Elhewadis li Bexdayê hatiye çapkirin roja 9-2-1980, ji heştê rûpelan pêkdihat û sê hizar lib hatine çapkirin, bi qebara (23,5×16,5 cm) û bihayê wê (300) filis bûn⁽¹⁰⁸⁾.

Her weha jimara dûyê di sala 1989 heta sala 1990 hatiye berhevkirin lê nehatiye çapkirin, niha ew jimar li ba nivîskar Ehmed Ebdulla Zero hêsta parastîye.

Kovara Peyv kovareka rewşenbîrî bû, ji qursê duwê ji aliyê Yekîtiya Nivîskarên Kurd, tayê Duhokê bi awayekî demsalî hatiye çap û belavkirin, bi zimanê Kurdî û bi elifbaya Latînî, belê bêhtir rol daye vekolînên wêjeyî, jimara yekê di bihara sala 1993 da derketîye û heta bi jimara 73 belavbûye ji vê kovarê. Ev kovar heta niha berdewame û jimara dawyê li sala 2016 derketîye.

Herdû jimarên (14-15) ku bi yek berg hatine çapkirin di sala 2000 da, bi qebareya (28×19,5 cm) desteka nivîskaran evene: Xidir Silêman, Muhsîn Qoçan, Hesên Silêvanî, Ebdulkerîm Fîndî, Remezan Îsa, Fazil Omer, Mihemmed Emîn Mihemmed. Jibo zanîne jî desteka nivîskaran di çendîn qonaxan da hatiye guhartin.

Di vê kovarê gotarek bi navê (Ronkirinek Li Ser Şerhâ Mella Ebdulsalamê Cizîrî) ji aliyê Mueyed Teyib hatiye nivîsandin, vekolîneka wêjeyî ye hatiye ravekirin⁽¹⁰⁹⁾.

1.2.2.16 Kovara Maf(1996- 2003)

Kovareka rewşenbîrî û siyasî, giştîbû, ji aliyê lîjna ewrupîya mafên mirovan, nûneratiya kurdistanê ve derdiket, nîv heyvanebû, bi zimanê kurdî,

⁽¹⁰⁸⁾ . Ehmed Ebdulla Zero, *Hevpeyvîn*, 3-4-2017, Yekîtiya Nivîskarên Kurd, tayê Duhokê, demjimêr 18:00, roja şembiyê.

⁽¹⁰⁹⁾ . Mueyed Teyib, *Ronkirnek Li Ser Şerhâ Mella Ebdulsalamê Cizîrî*, Ko. Peyv, Yekîtiya Nivîskarên Kurd, Duhok, 2006, H. 38, R.14-16

zaravê kurmancî li bajarê Duhokê derdiket, jimara yekê ji vê kovarê li roja 4-7-1996 derketîye, ji vê kovarê (44) jimar belavbûne, jimara 44 bûye jimara dawî li heyvana adara sala 2003 derketîye, desteka nivîskaran pêkhatibû ji van berêzan: dawud baxistanî xudanê îmtiyazê, huşyar rêkanî sernivîskar, ebdulla berbîrî sekretêrê nivîsînê û niyar mihemmed Salih dîzayna wê krîye.

Di vê kovarê da gotarek bi navê (Şa'iran Maf Heldesengênin) ji aliyê Taha Mella Teyfûr ve hatiye nivîsîn, û têda nirxandnek li ser vekolîna wêjeyî kirye⁽¹¹⁰⁾.

Her weha mînakeka dî têda bi navê (mihemmed şêxo) ji aliyê heval zaxoy ve hatiye nivîsîn, vekolînek li ser hozanvan û hunermendê bi nav û deng (mihemmed şêxo) hatiye kirin û ravekirin⁽¹¹¹⁾.

⁽¹¹⁰⁾ . Taha mella teyfûr, *şaêranman heldesengênin*, J. 5, 1996, R.31

⁽¹¹¹⁾ . Heval zaxoy, mihemmed şêxo, J. 20, 1998, R.21- 22

2 Vekolîna Wêjeyî: Çemk û Pênase û Cor

2.1 Zaravê Vekolînê

Peyva vekolîn li dawîya sedsala 16an ji peyva frensî hatiye wergirtin û ji dû axiftnan pêkhatiye. (Re) û (Cerchier) wate dûbare li dor tiştê gerîn⁽¹¹²⁾.

Di zimanê îngilîzî da dibêjinê (Research) anku vekolîn, ev peyv ji dû pişkan pêkhatîye:

- Beşê yekem (Re) = taze - dûbarekirin.
- Beşê duwem (Search) = gerîn, têtstkirin, bizavkirin⁽¹¹³⁾.

Mîna di zimanê îngilîzî da bi vî awayî tete ravekirin û ramana wê jî lê geriyaneke bi rêk û pêke yan jî afrandineke yan jî dûbarekirineka pêzanîna daku bêne bikarînan di (pertûk û programan da...) û di ferhenga îngilîzî da vekolîn xwendineka taybet Jibo wê heye, û têda hatiye, Jibo xulqkaryeka di zaniyaryeka nû da, yan jî jibo gehandina têgehiştneka nû ye⁽¹¹⁴⁾.

2.2 Dîroka Vekolîna Wêjeyî

Çêbûna vekolîna zanistî ya kevne, girêdayi ye bi dîroka mirovan ve li ser ruwê erdî, jiberku xudê adem afrandîye, hatina li ser rûyê erdî û karên ku hizra mirovan digre jibo bînînên herî baş jibo piratîkkirina li ser rûyê erdî, û paşî jibo bîcîhînanana karên xelîfê ku xudê mirov jibo wê afrandin û xudayê mezin gotîye di Qurana Pîroz da: { وَإِذْ قَالَ رَبُّكَ لِلْمَلَائِكَةِ إِنِّي جَاعِلٌ فِي الْأَرْضِ خَلِيفَةً }. (Surta elbeqere, ayeta 30). jiberku wê rojê, piratîka mirovan hewildanên zanîn û têgehiştina gerdonê yên ku

⁽¹¹²⁾ . <https://En.Oxforddictionaries.Com/Definition.Research>

⁽¹¹³⁾ . www.Dictionary.Cambridge.Com

⁽¹¹⁴⁾ . <https://En.Oxforddictionaries.Com/Definition.Research>

ew li ser dijîn û mirov berdewambûn li ser sedsalên dirêj jibo bidestve înanan zanîne bi rêkeka rasterast bikarînan hestên xwe destpêkê yên mirovî. Bê gûman ti rêbaz nehatine kirin daku bighêjine rastiyeke zanistî, yan jî ti bizav jibo têgehiştina diyardên li derdora mirovî çêdibin nehatiyekirin.

Eve lêgerînên pêşketî di dîroka mirovan da girt, lê bi zehmete ku mîkanîzmên li ser dîroka lêkolînên zanistî di hûrbînan da, di van çend rûpelan da behsa hindêk xebatên pêşketî di warê lêkolîna zanistî û çalakyên wê da bikin.

*** Vekolîna Zanistî di Demên Kevin Da**

Di wê waneyê da ku di demên sedsalên kevin da dijiyan, misra kevnar û babîlîyan, yunanî û romanîyan jiberku ew dîroka hizirkirinê jibo li cem Misryên kevnar bi zanistê yan serê li cihê ku ew pîlankirina, Endaziya, Derman, Sitênasî û Çandinê⁽¹¹⁵⁾.

*** Vekolîna Zanistî di Serdemên Navîn Da**

Eve di waneya serdema demeke ku şaristaniya dema rêsansa îslamî li Ewropayê berifrekkirina wê demê da li ser sed sala (8) da heta sedsala (16) da, Musulman di wê warê da ji zanistê berê yên kevnar, Misir, Yunan û Romanî dapûrt kirine û ragehandinê şaristaniya îslamê di navbera şaristanyên kevnar wek şaristanyên kevin yên Misrê û Yunanê û Grîk û Romanî û ne bitenê şaristanî veguhastiye belku zanist û artên taze li ser zêdekirine⁽¹¹⁶⁾.

Her weha Ereb di berhem înanan wan da ya zanistî li dûv hindêk mîtûdên baş di vekolînê da çûne, gelek zanayên Musulman zîrebûn di warê vekolîna zanistî da weku (Elhesen kurê Elheysem, Cabir kurê Heyan, Xewarzimî, Beyrûnî, û Îbin Sîna) û hindêkên di û van zanayan pişkarî kiriye di berhem înanan zanistî da û pêşkeftina şaristanyê. Pêşengên Ewropayê mifa dîtiye weku (Rugirbakun) sala 1214 zayinî û Lîyonardo Davînşî sala 1452 ji zanistên Erebî ewa Ereba ji bo wan hêlayî û avakirina bingehên şaristaniya Ewropayê ya nû li ser bûn.

⁽¹¹⁵⁾ . - Ehmed Bedir, *Îsûl Elbehîs El'ilmî We Menahîcih*, Pertûkxana Elekadimiye, Lîbya, 1977, Ç2, R.74.

⁽¹¹⁶⁾ . H.Ç..

Ev ewlehî em dikarin bêjin ku tiştêkî zanîna mirovan bitenê jibo Musulmanên li wêrê, di vekolînên xwe yên zanistî da lojîka kevin û lojîka xwe bikarînanê⁽¹¹⁷⁾.

Li ser demê navîn da demê ku ewrupa di tarriyatiya nezanînê da, hizra Erebi ya îslamî çemên mezin yên zanînê di peqandin, piştî vê çendê Rojavayê rewşenbîriya îslamê veguhast û hindêk tiştên nû li ser zêdekirin heta wêne temam buye û rêbaza zanînê ya dirist aşkerabû di çarçovekê giştî da pêk dihat ji rêbazên vekolînê yên cuda û rêkên wê di zanistên cuda da, yên piratîkî û mirovayetî, ew rêbaza ku Ereba bi xwe pîlankirî û danayî di vekolînên wan da mîna gelek ewên niha li ser demê me û li ser vê çendê hindêk ji (rojhelatnasan) ku pertûk têda behsa îmkanên Musulmanan kirine di rêbaz û çêkirina vekolînan da, û ji wan pertûkan (menahic alu'lama almuslimîn fî albehis ali'lmî = rêbazên zanayên musulman di vekolîna zanistî da) ya firantiz rozintal⁽¹¹⁸⁾.

Piştî şerê cîhanê yê duwê, zanayan bi awayekê temam dest pêkir Jibo hebûna peywendîyan di navbera pişknîn û pêşketnê da kir, û jiber giringîya wê pêşketin dana.

Di nîva yekê da wî çaxî, zanayan çîzgiyeka rast di navbera vekolîna esasî û vekolîna cîhgir da danan.

Li hemî dema nabê em jibîr bikin ku li welatên senayî vekolîn û pêşkeftin dî beşên ji hev cudane, cuda nedikirin di nexşekêşana pîşesazî û aborî da⁽¹¹⁹⁾. Di kevin da bitenê ew kes hêjayî vekolînabûn ewên jêhatî û zîrek.. Ewan zanayan corên amîrên taybet dirist kirin û esasê diristkirina laberatwaran damezrandin. Elmaniya, piştî Frensa, bûye navenda diristkirina alavên taqîgehê, her weha bikarînanana wan û bidestve înanana encamên vekolînan û sedan zana û vekoler li ser kar dikirin, di warê vekolînan bi giştî da û vekolîna zanistî bi awayekî taybet.

⁽¹¹⁷⁾ . Mehmûd Qasîm, *Elmentîq Elhedîs We Menahîc Elbehis El'lmî*, Pertûkxana Elînglo Ya Misrê, Qahîre, 1949, Ç4, R.22

⁽¹¹⁸⁾ . Dr. Welîd Erefat, *Menahîc Elulema Elmuslîmîn Fî Elbehis El'lmî*, Wer.: Enîs Firîhe, Dar Elseqafe, Dezgehê Firankilîn Yê Çap û Belavkirinê, Beyrût, R.232

⁽¹¹⁹⁾ . Xazî Fatîh Weyis, *Rêbazî Lêkolînewe*, Dar Elhîkme Ya Çap û Belavkirinê, Hewlêr, 1990, R.12,14,15, H.Ç.

Her weha piştî Elmaniya, Emrîka bûye navenda karê vekolînan, û jibo cara yekê laberatwarên eliktironî damezrandine⁽¹²⁰⁾.

Jibo cara yekem zanist hatiye bikarînan jibo bi destxistina îhtiyacên civakê û jibo parastina xwe û welatî û pêşxistina civaka firensî bû, di vê demê da şoreşa firensî lidişî hemî welatên di yên ewrupî rawestiyabû. Û di encamê da, zîrekîya zanayan kete warê piratîkî jibo dîtin û dirist kirin û li dûvçûna corên alavan. Her weha dîtina baştirîn rêkên li dûvçûna pêşketî.

Hêjaye em bêjin, berî şerê yekê yê cîhanê, vekolîn heta radeyekê berfirehtir dest pêkirin û gelek corên taqîgehane hatine damezrandin, jibo vekolînkirina gelek corên babetan, di vê demê da, Elmaniya ji hemî welatên di zêdetir giringî bi vekolîne dabû bi radeyekê baş, piştî vê çendê, Firensa û Elmaniya û Emrîka, li Îngiltera jî karê vekolîne dest pêkir, bi taybetî piştî sala 1900z.

"Şerê cîhanê yê yekê bûye egerê guhartineka yekcar mezin di cîhanê da, rewşa şerî li wan welatan, hêlaye bilez vekolînan bikin, û bi yekcarî berfirehtir lê hatin laberatwar, û bi taybetî di aliyê (meydanî) da, çek dirist kirin. Ev rewşe bûye sedemê bikarînana zanistê di nav şer û cengan da"⁽¹²¹⁾.

Şerê cîhanê yê duwê bûye sebebê wêrankirina gelek dezgehên senayî yên ku berî û piştî şerê cîhanê yê yekê hatibûne damezrandin û bi diristî karê xwe dikirin, weha jî Emrîka rizgarbû ji wêrankirine çunku dûrbû di aliyê cografîk da, belê dewlemend û xudan îmkanên mezin bû.

"Rûsiya jî, hemî îmkanên xwe bikarînan jibo pêşketina zanistî di warê vekolîne da û giringiyeka berfirehtir daye vekolînan"⁽¹²²⁾.

Di çerxê hevdehê da ku tete jimartin wek giringtirîn çerxê vekolînan, çunku di vê çerxê da zanayan giringiyeka mezin daye vî warî û gelek pertûk li ser nivîsîne.

"Li berî hemîyan (Firensîs Bîkon) bû, pertûkek bi navunîşanê (Lojîkê Nû) di sala 1620 da nivîsiye, lê belê li çerxê hejdehê zana û filozof zêdetir hatine û mêjiyê mirovan firehtir lêhatîye, û rêbaza vekolîne êşkere û diyartir lêhatîye, ewa (Kant:

⁽¹²⁰⁾. Encyclopedia Britannica, No.I (15) 1973. R.738; Www.Mohyysin.Com

⁽¹²¹⁾. Xazî Fatîh Weyis, Çavkaniya Berê, R.14

⁽¹²²⁾. H.Ç., R.15

1724-1804) rêbazeka nû bi navê Mîtodolojî (Methodology) avakirîye, di vê rêbazê da weha ragehandîye her zanistekê û zaniyarekê rêbazeka cuda û taybet heye"⁽¹²³⁾.

Di çerxê nozdehê da rêbaza vekolînê hejiyaye û êşeka giran pêketîye, heta her yek ji zanist û zaniyarî wekî: Civaknasî, Aborî, Derûnasî û Dîrok, bûne xudan rêbazên taybet yên vekolînê⁽¹²⁴⁾.

"Vekolînên wêjeyî di nav kurdan da, taybet li başûrê kurdistanê dereng dest bi nivîsînê kirine, belê yekemîn berhem li serdemî da hatiye nivîsîn wekî pertûkeka xweser hatiye nirxandin, ew jî li dor wêje û zimanê Kurdî bû bi navê (Encûmenî Edîban) ji aliyê Emîn Feyzî ve li sala 1920 li bajarê Îstenbolê hatiye çapkirin û giringiyeka mezin hebûye jibo destpêkirina dîroka edebiyata Kurdî"⁽¹²⁵⁾. Her weha berhemekî dî li ser wê mijarê da, "ewa bi navê (Komele Helbest Hozanvanî Kurdî) ji aliyê Ebdulkerîm Hekzî sala 1938 li Bexdayê hatiye çapkirin, rolekî mezin dîtîye di dîroka gelê kurd da"⁽¹²⁶⁾.

"Mîna li ser rojnamevaniya kurdî berî wan rolê xwe di vekolînên edebî da dîtîye, yek ji van kovara ku rolekê berçav hebûye jibo zengînkirina vekolînên edebî wek di kovara Hawar da û gelek nivîskarên dî yên her çar parçên kurdistanê rolekê mezin dîtîye di vekolînên edebî da"⁽¹²⁷⁾.

2.3 Têgehê Vekolîna Edebî

Vekolîn bi rêya guman û pirsiyarskirinê (vekolerî) ber bi wê armancê dibe ko ew dixwaze. Her wisa li vê derê diyar dibe ko dema vekoler bi kiriyara vekolînê radibe, ew pêdivî arîkariyê ye ji bo ko bigehe wê rastiya ew dixwaze yan bi awayekê dî (arîkariya wî dê biêt kirin û ew pêdivî belge û çavkaniyan e ji bo ko bigehe wan rastiye ko ew dixwaze. Her wisa dibê bi zanîna zanistekê xwezayî yan zanistî yan mirovatî taybet bit an jî ji bo arêşeyeka takekesî yan bi awayekê giştî ji bo civakê yan

⁽¹²³⁾ . H.Ç..

⁽¹²⁴⁾ . Elî Mehmûd Cûkil, *Rêbazî Lêkolînewe*, Ç. Zankoya Selaheddîn, Hewlêr, 1999, Ç1, R.5-6.

⁽¹²⁵⁾ . Emîn Feyzî Beg, *Encûmenî Edîban*, Vekolîna Lîjneya Wêje û Kelepûr, Weş. Korî Zaniyarî Îraq, Bexda, 1983, R.5

⁽¹²⁶⁾ . Dr. Merûf Xeznedar, *Mucez Tarîx Eledeb Elkurdî Elmuasîr*, Wer. Ebdulmecîd Şêxo, Belavker Hoşeng Kurdaxî, Beyrût, 1992, R.145

⁽¹²⁷⁾ . Ebdulsemed Îslam Taha (Doskî), *Rengdanewey Edeb Le Kovarî Hawar Da (1932- 1943)*, Nameya Masterê, Jibo Fakulteya Adabê, Zankoya Selaheddîn, Hewlêr, 2001, R.145-146

mirovatiyê li ser astê cîhanê çareserî ye yan jî ji bo diyardeyekê yan rûdaneka paşerojê pêşbînîkirin e).(128)

Nemaze dibê vekolînan hindêk armanc hebin, wekî wesifandin, ronkirin, têgehiştin û şirovekirin û dibê ji bo pirsiyarekê ji hindêk bersivan pêk biêt an jî ji encamê hindêk pirsiyaran biêt azirandin, her wisa ronkirinek ji bo rêyên ko hatine bikaranîn. Her wisa dibê vekoler encaman bi dest xwe bixe û rave bike. ⁽¹²⁹⁾ Yanî di vekolandina her babetekî da, em pêdivî hindê ne ko arêşeyekê destnîşan bikin û paşî bizava çareserkirina wê bikin.

“Mîna vekolînên edebî bi vê çendê ko rêyeka ron e yan jî rêya xilasbûn û nemana nezanîne yan dudiliyê yan arêşeyeka tak û komelgeh anko kom dibînit bo zanîna rast bo helwîstan yan jî çareseriyeka bizehmet e ji bo astengekê . ew rêyeka cîhanî ye bi konsept û pêngav an westgehên giştî, li ser diçe mirovên bivên bigehin rastiyekek yan wergiritna rastiyan diyar dibe.”⁽¹³⁰⁾ Bi awayê biryar û pêngavên serekî wekî em di vî wêneyê li jêr da dibînin ko awa û biryar û pêngavên serekî yê vekolînê diyar kirine. Binêre wêneyê jimare (1).

Vekolîn rêyeka pirsiyarkirinê ya rêkxistî û birêkûpêk ya xwandinê li ber çav werdigire ko li dû hewcedariyên paşerojê pêş dikeve bi rêya serederiya wê ko bi awayekî ko pêngavên xwe li dû piştbestinê bi hindêk armancan ko dibê biên bicihanîn dihavêje. Anko vekolîn bi rêya gomanê û pirsiyarkirinê (vekolerî) ber bi armanca wî dibe.

⁽¹²⁸⁾ Dr. Mihemed Ziyad Hemdan, *El-Behs El-Ilmî Kenîzam*, Ç., 1, Dar Et-Terbiye El-Hedîse, Emman – Urdin, 1989, R., 16.

⁽¹²⁹⁾ Saunders, Et Al, *Research Methods For Business Students*, 4th Edition, Financial Times/Prentice Hall, 2007, R. 5.

³H. Ç. R.

⁴H. Ç. R.

Biryarên Rerwiştî yên Zanistî	Bagrawi ndê arêşeyê Û danan wê li cem Vekolerî	Bizava çareserki rina Wê bi rêya Xwandin ê/zanînê	Pêşxistina pirsyaran Û armancan an jî Girîmanan	Komkirin a datayan Bi rêya vekolînê	Şirovekirina Datayan	Encam
	Hestkirin Bi arêşeyê	Rêya ron an jî rêya xilasbûnê ji arîşeyê				Çarekiri na Arîşeyê
Biryarên Rewiştî yên Derûnî	Dudiliya Derûnî	Dîtina harîkar iyeka Bilez	Pişkdarîki rin ji bo Xilasbûnê ji dudiliya Arêşeyê	Hizirîneka baş ya Derûnî û rewiştî Ji bo ko xwezaya Û dudiliyê biêt Diyarkirinan an jî Biêt fehimandin	Fehiman dina arêşeyê Û kontirok irina Dudiliya wê	Biryarda n Li ser Bidawîb ûna Arêşeyê û Nemana Dudiliyê

Wêne (1): awayekê ronkirî ji bo diyarkirina vekolînê bi biriyar û pêngavên pirrî armanc⁽¹³¹⁾.

2.4 Pênasên Vekolînê

Bê gûman pêwîstî bi xwandin û vekolînan roj bi roj zêdetir dibê, çunkî zanîn û vekoler di pêşbirkê dene, daku bighêne mezintrîn rêjeya zanîna hûr, ewa jiyana mirovî bi hesanî û xweş dikê, û her weha jî jibo mirovî daku yê serkeftî bê di jiyana xwe da.

⁽¹³¹⁾ Saunders, Et Al, H. Ç., R. 5.

(Vekolîn) bi vî awayî pênase dibê, vekolîn pirs û nêrîneka hûre jibo eşkerakirina pêzanînan yan peywendiyên nû û mezinkirina pêzanînen niha û ji wan pêzanînan piştrastbûn⁽¹³²⁾.

Her weha bi vî awayî pênasa (vekolînê) têtekirin: (pirseka bi rêk û pêke, armanca wê ewe hindê pêzanînen nû zêde bikê, tete gehandin û piştrastikirin jî têtekirin bi rêka têstkirina ekadîmî⁽¹³³⁾.

Bi vî awayî pênasa vekolînê têtekirin: vekolîn daxwaza rastyê ye û veguhastna wê Jibo xelkî⁽¹³⁴⁾.

Wekî dî jî vekolîn: bizavên pîlankirîne jibo ravekirina arîşeka destînîşankirî⁽¹³⁵⁾.

Û zanayek weha vekolînê pênase dikê: girtna rêkekê û pêngavên berniyas divê qutabî yan jî vekoler bzanê berî ku pê rabît, bi her bizavekê Jibo vekolînê⁽¹³⁶⁾.

(Vekolîn hewleka hûrdibîne) Jibo xwe gehandina çarserkirina arîşên ku mirovî dûdil dikin⁽¹³⁷⁾.

Weha jî pênase dibê: raporteka temame vekoler pêşkêş dikê li ser karekî, ku kirbît û bi renekî xwe girtbê, pêkhatîye ji raporteka hemî qunaxên xwandinê, demê yek bûye encamên nivîsên bi belgeve⁽¹³⁸⁾.

Dr. Ezîz Gerdî dibêjê li ser vekolînê: Ew tişte bi xweve digrê, jibo wêjeya dahênanê û bi vê wateyê pêkhatîye ji ravekirin û komkirin û nirxandna berhemê dahênanê wêjeyî û dîtina yasayên wêje û jîyan û serdem û zanistên dî⁽¹³⁹⁾.

⁽¹³²⁾ . Francis Rummel, *Ani Troduetion Of Research Procedure*. Newyork: Harper And Row, 19. 4, P.9

⁽¹³³⁾ . N. Polonsky, *Social Work Research*, Chicago: University Of Shicag, Press, 1962, P.2

⁽¹³⁴⁾ . Dr. Mihemmed Ebdulrehman Elşamî, *Dar Elulûm Ya Çap Û Belavkirinê*, Riyad, 1985, Ç1, R.21

⁽¹³⁵⁾ . Dr. Sededdîn Elseyid Salîh, *Îsûl Elbehîs Elîlmî*, Pertûkxana Elsi'habe, Jeda Rojhelat, 1993, R.14

⁽¹³⁶⁾ . Dr. Mihemmed Zeyan Omer, *Menahîceh We Tîqeniyateh*, Dar Elişrûq, Jede, 1983, R.9

⁽¹³⁷⁾ . Van Dalîn, *Menahîc Elbehîs Elîlmî Fî Elterbiye We Elîlm Elnefs*, Pertûkxana Englo Ya Misrî, Qahîre, R.9

⁽¹³⁸⁾ . Dr. Ehmed Şelebî, *Keyfe Tektub Behsen Ew Rîsale*, Pertûkxana Elnehde, Misr, 1968, Ç6, R.13

⁽¹³⁹⁾ . Xazî Fatîh Weys, *Rêbazî Lêkolînewe*, Dar Elhîkme Ya Çap Û Belavkirinê, Hewlêr, 1990, Ç1, R.17

Her weha bi vî awayî pênasaya vekolînê têtêkirin: vekolîn geriyane li dûv rastiya meselekê yan jî mijarekê û li dûv diyarkirina yan (eşkerekirina) wê rastiye ye⁽¹⁴⁰⁾. Û li gora nêrîna min pênasakirina vekolînê wehaye:

Vekolîn ew rastiye jibo xelkê tete ravekirin, da nameya wê bigehê xwandevevanan.

(Vekolîn piroseka xirvekirin û rêkxistinêye di destipêkê da, paşan berawirdikirin û beramber yek danan (Muqabîl) paşan gehîştin bi encaman)⁽¹⁴¹⁾.

Bi vî awayî pênasaya vekolînê têtêkirin: taqîkirine, yan lêgeriyaneka taybete armanca wê ewe diyarkirin û eşkerekirina rastiya, yan dûbarekirina têtewriyan yan jî yasayan di ronahîya rastiye nû da⁽¹⁴²⁾.

Her weha " Meryn Shutt Lew Worth" bi vî awayî pênasaya vekolînê dikê: vekolîn komkirina data, pêzanîn û rastiyan bi xweve digrê jibo pêşxistina zanîne⁽¹⁴³⁾.

Weha jî (Johu. W. Creswell) bi vî awayî pênasaya vekolînê dikê: Gav bi gav kar têtêkirin jibo komkirin û ravekirina agahîyan jibo zêdekirina têtêgehîştina me li ser mijarekê yan jî pîrsekê hatiye dayin, eve ji sê qonaxan pêktê: (Pîrskirin, Berhevkirin, yan Bersiva pîrsa û hebûna bersiva pîrsê)⁽¹⁴⁴⁾.

2.5 Pênasaya Vekolîna Wêjeyî

Gelek vekolera hewldaye (vekolîna edebî) pênasaya bikin, her vekolerekî li dûv dîtina rewangeya xwe pênasaya xwe dikê, emê bizavê bikin hindêk ji van pênasayan binin:

⁽¹⁴⁰⁾ . Yasîn Reşîd Hesên, *Rolê Rojnamey Kurdistanî Niwê Le Bayexdanî Be Hunerekanî Edebî Kurdî (2000- 2007)*, Vekolîneka Şîkarî Û Rexneye Ye, Fakulteya Ziman, Zankoya Koye, 2010, R.174

⁽¹⁴¹⁾ . Farûq Xurşîd, R.126.

⁽¹⁴²⁾ . Unattributed. *Research In edictionary Itabu*. Meriamm Webster (M-W.Com). Encyclopedia Britannica. Retrired 13 August 2011.

⁽¹⁴³⁾ . Shuttleworth, Martyn,2006, *Definition Of Research*, Explorable. Explorable.Com. Retrieved 14 August 2011

⁽¹⁴⁴⁾ . Creswell, J. W. 2008, *Educational Research: Planning, Conducting, And Evaluating Quantitative And Auditative Research (Srded.)*. Upper Saddle River: Pearson.

Vekolîna Wêjeyî: Em dikarin bêjin vekolîna edebî hizirkirine jibo edebê, bersivdane ji wan pirsiyaran, ewên nav berhemekê edebî da hatine û ji ba xwendevan û rexnegirê edebî dirist dibê⁽¹⁴⁵⁾.

Anku afrandina hindêk pirsane ku xwendevanî û rexnegirî divên bi rêka wan pirsan bigehne hindêk encaman.

Her weha di pênaseka dî da bi vî awayî hatiye (vekolîna wêjeyî) têtê pênasekirin: (Pêkhatiwe le karê pişkinîn û lêkdanewey têkiste edebye dahênrawekan, hemî rêbazî vekolîn û rexneyî cuda cuda bikrêt, şewekan zorin, hemî dikarin bo karê edebî dahênrawekan bikin, û berew ayindeyekê ron dibin)⁽¹⁴⁶⁾.

"Rexnegirekê Emrîkî (Rêşardiz) bi vî awayî vekolîna edebî pênase dikê: têtêwrêk heye jibo têtêgehiştin û ji edeb û vekolîna edeb ew jî eveye hewildana zanistê (Norolojî) jibo têtêgehiştin û ji edebî û vekolîna edebî bikartê, jibo rêka karînanana amar û grafîk û dayagram di warê vekolîna edebî da, evene jibo vekolîna edebî hene mifa jê dihête wergirtin"⁽¹⁴⁷⁾.

Her weha vekolîna edebî, bi vî awayî jî dihête pênasekirin:

Vekolîna edebê lêgeriyane li ser rastiyan edebî li dûv mîtodên vekolîna edebî bi piştbestin bi çavkaniyan bawer pêkirî⁽¹⁴⁸⁾. Û li dûv vê pênasê erkê vekolerî ewe pala xwe bidê çavkaniyan bawerpêkirî, da vekolîn berev zanistîbûnê ve biçê.

Her weha (vekolîna edebî) bi vî awayî pênase dibê: Daxwaza rastiya edebîye ji wan çavkaniya ewên rewşenbîrî jibo me parastîne û veguhastina wê rastiye jibo xelkî krîye⁽¹⁴⁹⁾. Vekoler dibê pirek di navbera zanistê û xwendevanê asayî da, ew rolê aşkerakirina rastiyan bi karê xwe dibîne.

⁽¹⁴⁵⁾ . Ehmed Qazî, Wer. *Edeb û Lêkdanewey Edeb*, Ko. Raman, 2011, H. 174, R.103

⁽¹⁴⁶⁾ . Îdrîs Ebdulla, Ko. Nûserî Niwê, Hijmarên (24-25) R.128

⁽¹⁴⁷⁾ . Husên Arîf, *Edeb û Vekolîna Edebî*, Ko. Raman, 2011, H. 174, R.4

⁽¹⁴⁸⁾ . Jivan Ne'man Hecî, *Rojnamegeriya Edebî Li Başûrê Kurdistanê (1991-2003)* Kovarên (Peyv, Gelawêjî Nwê) Wek Nimûne, Nameya Dukturayê Jibo Cvata Fakultiya Zanistên Mirovayetî, Skola Adabê, Zankoya Duhok Hatiye Pêşkêşkirin, 2014, R97

⁽¹⁴⁹⁾ . Dr. Mihemmed Ebdullrehman Elşamî, *Îdad Elbehîs Eledebî*, Dar Elîlum Ya Çap û Belavkirnê, Riyad, 1985, Ç1, R.21.

Vekolîna edebî bi vî awayî dihête pênasekirin: pişkdarîkirina fikrîye, û zêdekirina zanistîye, eger xwendevan ti tişt zêdenekirin jibo gorepana zanînê û ti pişkdarî nekirin di pişkekê da û di warê fikrî da, nexasim pişka wê dê ji kar kevê û dê jinavçê⁽¹⁵⁰⁾.

Li dawiyê me amaje bi hindex pênaseyên vekolerên cuda cuda kiriye, gehiştine wê encamê ku vekolîna edebî li dûv nêrîna min: Vekolîna edebî pêkhatiye ji ked û xizmeta wî vekolerî ewê zanist înyaye di nav meydana edebî da, da bighêje xwendevanî, bi merema têgehiştina vekolînan û jibo her têkistekê bibê nivîsîn wekî çirayeka ji ronahiyê li ber vekolînên ekadîmî.

Bi vî awayî pênasa vekolîna edebî têtêkirin: Karekî çalak çêdibê bi awayekî sîstemkirî jibo zêdekirina zanînê jibo kesan û civakan di warê çand û rewşenbîryê da bi mercê ev zanîn li ser mijarên nû bixebtin⁽¹⁵¹⁾.

Vekolîna edebî ne gotare, belê karekî zanistîye berî her tiştî, li ser biniyatê berawirdkirin û nirxandinê radibît û danana pêşekiyan jibo ghiştina encamên zanistî⁽¹⁵²⁾.

2.6 Taybetmendiyên Vekolîna Edebî

A - pirosêseka rêkxistîye jibo lidûvçûna rastiyeke yan jî jibo bi destve înana çareseriyên gerek bi meremeka zanistî yan civakî û lidûvçûna vekolerî jibo pîlanekê bi çavdêryeka baş û çareserkirina arîşa, anku hemî rêkên vekolînê bikarbînê daku bighêje armanca xwe û ghiştina armancê bi sitûyê xweve digrê, eveye rêka vekolînê.

B - pirosêseka lojîkiye harîkariya vekolînê dikê wek pirosêseka rêkxistî, vekoler bi sitûyê xweve digrê û pêşketin di çareseriyaya arîşa xwe da bi rêka rastî û pêngavên hev temam dikin. Ew rêka vekoler lidûv diçê hindex

⁽¹⁵⁰⁾ . H.Ç., R.33

⁽¹⁵¹⁾ . [Http://Abdallamutwakil.Blogspot.Com/2014/03/Blog-Post7.Html](http://Abdallamutwakil.Blogspot.Com/2014/03/Blog-Post7.Html)

⁽¹⁵²⁾ . Farûq Xurşîd, *Beyn Eledeb We Elsehafe*, Eldar Elmîsrîye Ya Çap Û Belavkirinê, Qahîre, 1961, Ç1, R.126

caran (Îstiqrayî gehiştin bi rêka xwendinê) û (Îstintacî gehiştin bi encam) ye, hindek carên dî jî her dûkin.

C - pirosêseka hemwarî ya taqîkirinêye, vekolîn ji hemwarî dizê ji aliyê têbînîyên xwe û pirosêsên bicih înanana wê û rahênana encamên wê. Ew bi pila yekê arastekirîye jibo baştirkirina hemwarê kitekes û malbat û civakê, pêwîstiyên wan yên cuda di warê ekadîmî da çî taybet yan civakî û kargêrî bin wekî me gotî⁽¹⁵³⁾.

D - di pêvajoya lêkolînan da, anku afrandina tiştên nû, her weha encamên vekolînê gelek pêzanîn nikarin bibine vekolîn, belkî divê rê û rêbazên karê zanistî hebin da bibê sîmbolek jibo berhemên nû⁽¹⁵⁴⁾

E - di hemî guherbarên kontrolkirî da jiblî yên cerbandinî û cêgîr, pêwîstî heye bi rêberê vekolînê anku rêka vekolînê nîşa me didê û hemû encamên datayên hatine bikarînan û ravekirin û bê ku şaşî têda hebê⁽¹⁵⁵⁾.

F - mîtodên jîmaran anku îstatîk têda hebin data bhêne guhertin Jibo pîverên jimarey û her weha bi rêkên îstatîk bhête taqîkirin û ew vekolîn pêwîste karê wê resen bê neku yê vekolerekî dî bê. Pêwîste vekolîn li ser binemayekê zanistî bhêtekirin⁽¹⁵⁶⁾.

J - Jibo çêkirina vekolînê, vekoler pêwîstî bi îmkanên xwe westandinê heye, çunku vekolîn karekî ne hesanîye, vekolîn hewceyî wêrekî heye, weha jî bingehekî herî beraqle yê harîkar Jibo avakirina rastîya, weha jî pêwîstî bi prensîba heye⁽¹⁵⁷⁾.

⁽¹⁵³⁾ . Dr. Mihemmed Ziyad Hemdan, *Elbehîs Elîlmî Kenîzam*, Dar Elterbiye Elhedîse, Eman, Urdun, 1989, R.21

⁽¹⁵⁴⁾ . Elnecar, F.J., Alnecar N. J, Alzobî, M. R., *Rêkên Vekolîna Zanestî*, Dar Elhamid, Emman, Urdin, 2008, R.5-8

¹⁵⁵ . <https://en.wikiversity.org/wiki/Characteristicsofresearch>

⁽¹⁵⁶⁾ . Partly From: Wilson, E. B. Jr. *Introduction To Scientific Research*. Newyork: Mc Graw- Itill Bookco., Inc. 1952, Pp. 40- 47

⁽¹⁵⁷⁾ . Elnecar, F.J., Alnecar N. J, Alzobî, M. R., *Rêkên Vekolîna Zanestî*, Dar Elhamid, Emman, Urdin, 2008, R.5-8

H -vekolîn pêwîste berisva hemû corên pirsiyaran têda hebin, vekolîn di pêvajoya bazneyî deye, jiber ku ew bi pirsiyarekê dest pêdkê û bi pirsiyarekê bi dawî dibê⁽¹⁵⁸⁾.

K -pirosêseka bawerpêkrîye, anku têtê dúbarekirin û gehandin Jibo encamên (derûnî) yan jî encamên nêzîk, ev sîfet ya serekîye di vekolîna zanistî da, îmkana dúbarekirina wê ji aliyê vekoleran yan hindêk chên taybet ldûv pîlanê û rewşan li dawyê bdestve înana encamên wek hev, ji encamên dúbarekirina vekolîna:

1. Piştî rastkirin ji dirist bûna (rastîya) encamên vekolînê, datayên wê vekolînê Jibo komeka mirovan paşê bikêrhatna encaman îmkana belavkirina wan li ser milletekî.
2. Piştrastbûn ji dirist ya encaman, anku te kêmbûna wan yan jî têkelkirina wan digel hindêk datayên dî û corê wan yê baş û ka çendin Jibo mebestên vekolînê⁽¹⁵⁹⁾.
3. Piştrastbûn ji dirist ya çalakya vekolînê Jibo sruştê arîşê û encamên pêwîst ji vekolînê.

L - pirosêseka arastekrîye Jibo nûkirinêye, yan zêdekirina zanîna mirovayetyê. Encamên nû yên ku vekolîn dighêjyê, sîniyale Jibo pêşketna vê zanîna mirovayetyê, behra bêhtir ji vekolînan û projeyên xwedekar pê radibin li zanîngeh û peymangeha û kulîjên taybet, jiblî namên master û duktorayê, têne jimartin vekolîn ne yên resen çunku pêzanînen têda ne bawerpêkrîne, behra bêhtir dúbarekirina rêxistna û nîşandna ew tiştê hey û fêkirne bo nivîsîna vekolîna zanistî (ewa dibêjinê raport)⁽¹⁶⁰⁾.

Y - pirosêseka çalake û ya gîroye ji vekolerî dixwazê:

1. Zanîneka baş daku bikaribê pîlana vekolînê bicih bînî wekî têtê xwastin.

⁽¹⁵⁸⁾ . Ibid, Pp. 8- 11

⁽¹⁵⁹⁾ . Elnecar, F.J., Alnecar N. J, Alzobî, M. R., *Rêkên Vekolîna Zanestî*, Dar Elhamid, Emman, Urdin, 2008, R.40-47

⁽¹⁶⁰⁾ . Best, J. *Research In Education*. Englewood Cliffs, N. J.: Prentice- Hall. Inc. (End Ed), 1970, P.8

2. Ezeziyê û berjewendiyên kesayetî bihêlê ewên hindêk caran di hizra mirov da diçin û tîn, daku bighêje aranceka bilind û hindêk encamên nû yên bihayê xwe yê zanistî hebin yan jî bihayê xwe yê piratîkî.
3. Wêrekiyeka kesayetî hebê jibo gehandina encamên gerek (dû dil nebê) di ragehandina tiştên cuda û encamên nû û pêşbînîkirina pêşwext Jibo her kesên dîtir yan jî jibo ewê li cem wan hatiye naskirin⁽¹⁶¹⁾.

2.7 Corên Vekolînê

- bi şêweyekî giştî vekolîn dibine dû cor:-

1. Vekolîna Kurt
2. Vekolîna Dirêj, wekî nivîsîna pertûk û name û tezên ekadîmî.

2.7.1 Vekolîna Kurt

Ev corê vekolînê bi şêweyekî giştî têtê dabeşkirin li ser sê mijaran:

2.7.1.1 Gotarên Di Kovar û Rojnaman Da

ew gotarên di rûpelên kovar û rojnaman da belav dibin, nayêne jimartin wek vekolînên esasî yan jî yên zanistî, çunku çî mercên belavkirina gotarên zanistî têda nînin, weku pîlandanan û şiyandina vekolînê Jibo çend kesên şehreza û zana... Htd, jibî ew keşên serperşitiya belavkirina van corên gotara dikin, pêzanînen berifrehtir nebin û nezanin çî gotar ya başe û çî gotar xrabe, lê divê jibîr nekin gotara baş û ya bi nirx, yan jî ya hesanî jî dê cihê xwe girê û ya bi mifa bê û yan jî mifa wê kêmbê her belav dibê.

Her weha ew kesên serperşitiya belavkirina gotaran dikin divê pêzanînen rast û berifreh hebin daku gotara baş û ya xrab ji hev cuda bikin û xudanê exlaqên baş bin, û ti naskirin û biraderiyê bikar ne înin jibo biryardan li ser belavkirina gotaran⁽¹⁶²⁾.

- Van gotaran çend cor hene, ew jî evin: -

⁽¹⁶¹⁾ . Ibid. PP.8-11; [Http://Www.Mbaofficial.Com/Mba-Coarse/Researchmethodology/What-Is-Research-Write-A-Note-About-Features-Characteristics-And-Limitation](http://Www.Mbaofficial.Com/Mba-Coarse/Researchmethodology/What-Is-Research-Write-A-Note-About-Features-Characteristics-And-Limitation)

⁽¹⁶²⁾ . Xazî Fatîh Weys, *Rêbazî Lêkolînewe*, Dar Elhîkme Ya Çap û Belavkirinê, Hewlêr, 1990, R.26-27

1. Gotara Wesifkirmê (Descriptive Essay)
2. Gotara Edebî (Literary Essay)
3. Gotara Kartêker (Reflective Essay)
4. Gotara Nirxandinê (Argumentive Essay)⁽¹⁶³⁾

2.7.1.2 Vekolînên Xwendekarên Zanîngehan

Ev corên vekolînê dû corin:- ya yekê asayî û ya duwê zanistîye. Ew gotarên têne jimartin asayî ew raportên kurtin ewên xwendekarên xwendîngehan dinivîsn, bê gûman li ser biriyara mamustayên zanîngehê tête bicîhkirin û beşekin ji çalakyên xwendekaran, û naête amadekirin Jibo belavkirmê, lê ew gotarên têne jimartin zanistî bi pîlaneka taybet tête bicîhkirin ji aliyê xwendekar ve. Ê encamek taybet yê terxankirî heye û pêngav bi pêngav li bin çavdêrîya mamustayî berev encaman diçin, û li dawyê di kovareka zanistî da belav dibê⁽¹⁶⁴⁾.

Yek ji taybetmendiyên gotara asayî ya xwendekarê qonaxa zanîngehê, ya bi sînore û kurte di çerçoveya karê xwe da, babetekî destînîşan dikê ku ji deh rûpelan zêdetir nebê, çunku xwendekar di pêvajoyya têtê deye û nabê zêdetir ji îmkanên wî bê, ev corê babetî yê destînîşankirî yekem têtê jibo xwendekar di warê vekolînê da, û dibê esasê vekolîna pêşerojê ewa xwendekar amade bikê. jiber vê çendê ew mamustayê çavdêrîya vekolîna xwendekarî dikê, pêwîste şehreza û şyar bê. Ê jêhatîbûna xwendekarî destînîşan bikê, û esasê vekolînê di mêjyê xwendekarî da damezrînê, her weha dibê zanîngeh û peymangeh jî bi hemî rengan rêka vekolînê Jibo mamustayî û xwendekarî xweş bikin⁽¹⁶⁵⁾.

Her wekî me gotî, mamusta rolekî mezin heye di damezrandna esasê vekolînê da û serkeftna xwendekarî di warê vekolînê da û dikarê reşbînyê di dil û serê xwendekarî da nehêlê, Jibo bicîhkirina vî rolî pêwîste mamusta pêgîryê bi van xalên li xwarê bikê⁽¹⁶⁶⁾:-

⁽¹⁶³⁾ . Elî Mehmûd Cukil, *Rêbazê Lêkolînewe*, Ç. Zanîngeha Selaheddîn, Hewlêr, 1999, Ç1, R.29

⁽¹⁶⁴⁾ . Xazî Fatîh Weys, R.27-28.

⁽¹⁶⁵⁾ . H.ç., R.27-28.

⁽¹⁶⁶⁾ . Xazî Fatîh Weys, R.27-28.

1-nabê vekolîna xwendekar piştguhê xweve bihavêjê, daku xwendekar weha hest nekê ku vekolîn nivîsîn bitenê reşkirina rûpelaye⁽¹⁶⁷⁾. Û daku xwendekar hest bi vê çendê nekê, divê vekolîna wî di sinfê da bihête xwendin, û dûvra xeletî bihêne destnişankirin, bê ku xwendekar hest pê bikê destnişankirina xeletiyên di vekolînê rûreşîye jibo wî.

2- bi her awayekî hebê, divê xwendekar bhête xelatkirin, bi taybetî ew xwendekarên serkeftî di encamdana vekolînê da.

3-bi awayekî zanistî divê xwendekar bihête têgehiştin ku yekem bizava esasî ya damezrandna vekolînê ye ji aliyê vekolerê dest pêke û ji wê derê û pêve ber bi serkeftinê diçê.

4-bi hemî şîwazan divê xwendekar bîr û hizrên xwe têda binivîsê, çunku gelek caran bîr û hizrên xwendekaran dibne serkeftna pêşerojê, xwe eger ti ji wan bîr û hizran giring jî nebin, belê mamusta dikarê pêşxistina xwendekarî di warê vekolînê da bikê bi vê çendê xwendekar bîr û hizrên xwe derêxît.

5-terxankirina smînareka taybet Jibo xwendna wan vekolînên baş û granbha⁽¹⁶⁸⁾.

2.7.1.3 Vekolînên kurt (Yên Derçûnê)

Ev corê vekolîna ew kes pê radibin ewên xwendina temamkirî û piştî temamkirina van core vekolînan, li kovarên zanistî da têtê belavkirin û her weha padaştekekê maddî û ekadîmî pê werdigrê, belavkirina van core gotaran mercên xwe yên taybet hene û divê vekoler pêgîryê pê bikê, heykelê van core vekolînan pêkhatiye ji:

- (a) pêşekî
- (b) vekolîn: têtêkirin bi çend beşeka
- (c) perawêz (dehmen)
- (d) encam
- (e) bîblografya (çavkanî)⁽¹⁶⁹⁾

⁽¹⁶⁷⁾ . *Menhec Elbehis Eledebî*, Elî Cewad Eltahîr, R.31

⁽¹⁶⁸⁾ . Elî Mehmûd Cukil, R.33-34

⁽¹⁶⁹⁾ . Xazî Fatîh Weys, R.29

A - PÊŞEKÎ

Pêşekîya vî corê vekolînê (vekolîna kurt) bi dû awayan têtê nivîsîn:-

1- Pêşekîyeka giştî (Preface)

Ev corê pêşekîyê behsa cor û awayên babetên di nav gotarê da dikin, her weha jî ew rêka bikarîmayî Jibo nivîsînê û behsa wan arîşa dikê ewa gotar çareseriyê Jibo danê, di gel gotara nivîserên di ewên li ser babetî nivîsîn û destnîşankirina xeletî û rastyên wan gotaran⁽¹⁷⁰⁾.

2- Puxte (Raja) Vekolînê (Abstract)

Di vê pêşekîyê da nivîskar çend risteyên karîger bi ramana vekolîna serekî pêşkêşî xwendevanan dikê. Vekoler dikarê wan çend risteyan ji vekolîna serekî wergirê û pêşekîyê jê bînte der, ew risteyên rasterast ji vekolînê têtê wergirtin Jibo pêşekîyê debê bi hêz û bitenê serên babetên giring derbêxê, daku xwendekarî agehdar bikê li dor naveroka vekolînê û rêkixweşker bê Jibo tevaya vekolînê bxuynê. Ya giring ewe di van her dû corên pêşekîyê da vekoler bi awayekî serekî wan risteyên kilît jibo vekirina deryê vekolînê diyar bikê⁽¹⁷¹⁾

B -Vekolîn (Discussion)

Di vekolînê da divê vekoler bi hûrî keristeyên babetên nava gotarê berteref bikê û di gel hemwarî biguncênê⁽¹⁷²⁾.

Vekolîna serekî bîr û hizir û şhezayiya vekolerî û berifrehyababetan di nav vekolînê da têtê dabeşkirin li ser çend beşan. Mercê serekî ji dabeşkirina vekolînê bi hevve girêdane û qetandina beşên gotarêye⁽¹⁷³⁾.

C - Perawêz (Footnote)

Komek ji gotin û risteyane li dawiyê rûpelên vekolînê têtê nivîsandin û bîr û hizrên taybet pê têtê dan⁽¹⁷⁴⁾, û Jibo van mebestên li xwarê têtê bikarînan:

⁽¹⁷⁰⁾ . H. Ç., R.30

⁽¹⁷¹⁾ . H. Ç., R. 30-31

⁽¹⁷²⁾ . Dr. Îhsan Mihemmed Elhesen, *Turq Elbehîs Elîctimayî*, Ç. Zanîngeha Mûslê, 1982, R.35

⁽¹⁷³⁾ . Xazî Fatîh Weys, R.31

⁽¹⁷⁴⁾ . D. Menzel, *Writing Atech Itical Paper*.21

- 1- Ronkirina meseleka ne serekî peywendîyeka rasterast nebê di gel babetê vekolînê. Bêhtiriya vî corê perawêzan bîr û hizrên taybet yên vekolerîne.
- 2- Ronkirina bîr û hizrên ne serekî yên vekolerekî dî. (Ew bîr û hizrên ku peywendyeka ne rasterast digel gotarê da heye). Çunku ev bîr û hizrên di nav perawêzan yên vekolerekî dîne, divê vekoler amajê pê bikê yan jî wê çavkanyê destinişan bikê.
- 3- Vekoler di perawêzan da navên kevin û zaravên taybet ron bikê, eger ronkirin ji bîr û hizrên vekolerî bê pêwîst nakê vekoler behsa çavkaniyan bikê, lê eger ji vekolerekî dî wergirtbin, pêwîste di perawêzan da behis bikê û çavkanyê têda diyar bikê.
- 3- piştî wergirtina têkestê ji her nivîskarekî dî, divê vekoler di perawêzan da wê çavkaniyê destinişan bikê ewê têkest jê wergirtî.
- 4- di wergêranê da, wergêr di perawêzan da bîr û hizrên xwe dinivîsê û her weha ew peyv û zaravên kevin û gran di perawêzan da tene ravekirin û di her rewşeka heyî da dikarê li dawîya perawêzan binivîsê di nav dû kevanan da (wergêr).
- 5- Vekoler dikarê perawêzan li dawîya gotarê binivîsê bi mercekî jimarên di nav vekolînê da di gel jimarên perawêzan yekbin û hev bigrin.
- 6- Her têtîniyeka dî ku vekoler pîwîstî binivîsîna wê hebê di perawêzan da ron bikê, ewa hêjayî nivîsînê bê, bi hêlekê di têtîsta gotarê da tete cudakirin⁽¹⁷⁵⁾.

Hindek ji vekolerên bi navûdeng, tomarkirina perawêzan bi rêjeyeka mezin wekî zerer wesif dîkin, çunku dibê egerê qetandina zincîra bîra xwendevanî⁽¹⁷⁶⁾ û daku baştir bê, vekoler dikarê tomarkirina perawêzan kêmbikê. Û bîr û hizrên di nav perawêzan da di gel têkestê vekolînê bguncênê û perawêzê bitenê Jibo çavkanî û jimara rûpelan terxan bikê û şîrovekirina wan nedanê di nav perawêzî da⁽¹⁷⁷⁾.

D - Encam (Discussion)

Encamê vekolînê gelek giringin û divê vekoler giringîyeka taybet pê bidê, çunku encam rolekê navokî dgêrê Jibo xwendevanî, jiblî ku zîrekîya vekolerî têda xuya dikê.

⁽¹⁷⁵⁾ . Xazî Fatîh Weys, R. 31-32

⁽¹⁷⁶⁾ . Dr. Menzel, *Writing Atech Itical Paper*21

⁽¹⁷⁷⁾ . Xazî Fatîh Weys, R. 32-33

Encamên vekolînê bi dû awayan têne nivîsîn:-

- 1- ew encamên ku di vekolînê da bi rengekî eşkere û dûr û dirêj hatine ronkirin, di encaman da bi awayekî hûrtir û kurttir dûbare ron dibin, anku ronkirin di çend xalekan da.
- 2- ew encamên di vekolînê da bi şêweyekê rasterast nehatine ronkirin, di encaman da bi şêweyekê rasterast di çend xalan da têne ronkirin⁽¹⁷⁸⁾.

E - Bîblogirafiya (Çavkanî, Serçavkanî – Bibliography)

Bîblogirafiya tomarkirina navê wî danerîye ewê serçavkanîye, vekoler di nivîsîna gotara xwe da mifa jê wergirtîye û bikarînaye, eger vekoler bi her awayekî mifa ji her çavkanîyekê wergirt bê bi temamî destnîşankirina wî serçaveyî bikê û di bîblografya vekolînê da tomar bikê, çunkî çêdbê vekoler emaneta zanistî bi parêzê li hemî dema û chan, û naskirina çavkaniyan mafekî rewaye Jibo hemî nivîskaran û nabê vekoler rêkê li vî mafî bigrê, her weha jnavbirna wê çavkanyê ku vekolerî mifa û sîd jê wergirtî tete jimartin wek xeletiyeka mezin û gunehka li djî zanistê û xudanê wê çavkanyê maf heye doza jnavbirna gotara wê vekolînê bikê, her weha doza cezakirinê bikê, çunku berhemê her nivîskarekî bi rêkên yasayî parastîne⁽¹⁷⁹⁾.

Bîblogirafiya pêkhatîye ji tomarkirina van pêzanînên li xwarê:-

- 1- Navê yekê û dû û sê yê danerê çavkaniyê, navê sê (Nasnav) li destipêkê tete nivîsîn.
- 2- Navê pertûkê.
- 3- Nezgehê çapê.
- 4- Ew welatê pertûk têda hatiye çapkirin.
- 5- Sala çapkirina pertûkê.
- 6- Eger pertûk ya wergêrayî bê, divê li destipêkê navê danerê pertûkê tete nivîsîn paşê navê wergîrvanî.

⁽¹⁷⁸⁾ . H. Ç., R.33

⁽¹⁷⁹⁾ . Xazî Fatîh Weys, R. 33-34

7- Jimara çapa pertûkê⁽¹⁸⁰⁾.

Bîbloyafya bi dû awayan tomar dibê:-

- 1- Bi kevnatiya çavkaniyan, anku ew pertûka berî hatiye çapkirin paşê ewa dûvda hatiye çapkirin tête nivîsîn, mînak: ew pertûka sala 1970 hatiye çapkirin tête nivîsîn berî ewa sala 1971 hatiye çapkirin.
- 2- Bi elfabayê tête rêzkerin, anku bi tîpa yekê ji nasnavê nivîskarî tête rêzkerin. Mînak jî bi tîpa (A) destipêdikê û paşê tîpa (B) li dûv nasnavê nivîskarê berhemî⁽¹⁸¹⁾.

2.7.2 Vekolîna Dirêj

Ev awayê vekolînê ji aliyê wan kesianve tête encamdan ewên divên di warekî da bibne pispor û bawernama master û duktorayê pê werbigirin. Armanç ji masterê ewe xwendekar li bin çavdêriya mamustayekî serperşit xwe berhev bikê û sala duwê ya nivîsîna vekolînê⁽¹⁸²⁾, vekolîna tête çekirin piştî Bekeloryosê û demê wê dû salin, sala yekê sala şehrezabûnêye di rêbaza vekolînê da û di yek warê zanistî da jêhatî bê, û bibê palder Jibo xwe gehandin û rewşenbîriya xwe zêde bikê, tiştên nû jibo zanistên bilind zêde bikê û di vekolînan da berdewam bê û jibo pila duktorayê xwe amade bikê û di vî karî da bibê xudan îmkan, çunku bi destve înana duktorayê xwendekar neçar dikê taqîkirneka temamtir û vekolîneka berifrehtir pêşkêş bikê, bi diristî di pêşketna zanîne da beşdar bê û giyanê vekoleryê têkelî xuyna wî bibê, zanîn û zanist bibê armanca wî û heta nefesa dawiyê di jiyane da bigerê⁽¹⁸³⁾.

Eger master tişteki nû li zanist û zanîne zêde bikê, bê gûman ew zêdeyî vekolîna pila duktorayê ye, ewa têtêkerin bi awayekî bi hêztir û eşkera û rontir, çunku vekoler rêkdixêt û bi naxê bîr û hizran da şor dibê û biha pê didê û bi başî û bi awayekî xweşk û hevgritna babetî sazîkê, eve di astekî blind deye û di gel wê plê

⁽¹⁸⁰⁾ . H. Ç., R. 35

⁽¹⁸¹⁾ . H. Ç., R.34-35

⁽¹⁸²⁾ . Mihdî Ehmed Silêman, Wer. Newzad Zade Hilûrî, *Binemayên Vekolîna Zanistî*, Pertûkxana Bedirxaniyan, Duhok, 2013, R.9

⁽¹⁸³⁾ . Elî Mehmûd Cukil, R.35

diguncê ewa xwendekar digrê û eve wê çendê ron dikê ku xwendekar dikarê vekolîna xwe bi bawerî bi xwe temam bikê, bê serperşit vekolnîya xwe encam bidê⁽¹⁸⁴⁾.

Encamdana van vekolînan karê xwendekarê ple blinde û mercekî serekîye Jibo wergirtna pileyan, ewên bi pirogramên zanîngehan têne guhartin û her yek çendîn merc hene jibo vekolînê û taqîkirinan jibo didanin⁽¹⁸⁵⁾.

Pilên Xwendina Bilind Evan Pilanên Li Xwarê Werdigrin

1- Dîblom

Bêhtir bê nivîsîna vekolînê temam dibê.

2- Master

Master bi dû rêka tete xwendin:

(A) Bê Nivîsîna Vekolînê

(B) Bi Nivîsîna Vekolînê.

3- M. PMil

M. Fîll dû core û bi dû rêka tete temamkirin:

(A) Bi Nivîsîna Namê.

(B) Bê Nivîsîna Namê. Pêkhatîye Ji Derbastibûna Qonaxekê Hizra Dukturayê.

4- Duktora

Bitenê bi nivîsîna vekolînê temam dibê.

Jibo temamkirina pila duktorayê li zanistên mirovayetî, xwendekar divê bi kêmî pila dîblom temamkirbê, her weha li hindê zanîngehan xwendekar divê di qonaxa m. Fîll da derbast bibê, paşî dikarê duktorayê bixwênê.

Li hindê zanîngehên dî xwendekar divê her sal di ezmonên taybet da derbast bibê, paşî rêkê didnê Jibo nivîsîna namê û bawernama duktorayê pê werdigrê⁽¹⁸⁶⁾.

⁽¹⁸⁴⁾ . Ehmed Şelebî, *Keyfe Tektub Behsa Ew Rîsale*, Ç. Elmerîfe, Qahîre, 1981, Ç16, R.70

⁽¹⁸⁵⁾ . Elî Mehmûd Cukil, R.35-36

⁽¹⁸⁶⁾ . Xazî Fatîh Weys, R. 34

- Duktora di çend coran da:-

A - Duktora Zanîngehê

Ev corê duktorayê pêwîstî demekî kêmtir nebê ji dû salaye, di amadekirina nameyeka bi sînore (150) rûpelan kêmtir nebê.

B - Dukturaya Navnetewî

Ev core pêwîstî bi dû nameyan heye: yek ya serekîye (nêzîkî 350 rûpel). Ya duwê: neya serekîye (ya baştir ewe ku bicye înaneka zanistî bê)⁽¹⁸⁷⁾.

C -Dukturaya Pila Sê

Jibo temamkirina vî corê duktorayê divê xwendekar di taqîkirneka taybet da derbast bibê, her weha xwendekar raporteka taybet li dor babetekî pêşkêş bikê Jibo mamustayekî pispor, dûvra bi wê raportê xwendekar tête wergirtin Jibo temamkirina duktorayê, ev corê duktorayê li welatê Firensa heye⁽¹⁸⁸⁾.

D -Dukturaya Felsefê (PH.D)

Ev corê duktorayê li Ewropa û Emrîka û li hindex ji welatên Erebbî tête xwendin û pêwîste xwendekar nameyeka esasî binivîsê û bi serkeftin ji taqîkirinên wî warî derkevê.

E -Dukturaya (Kandîdat) Candidate

Bitenê li welatên sosiyalîst tête xwendin, ev duktora sê heta çar salan tête xwendin û pêwîste xwendekar nameyekê jî binivîsê⁽¹⁸⁹⁾.

F -Dukturaya Adabê:

Ev duktora tête dan jibo wan kesan ewên duktoraya felsefê (Ph.D) temamkîrbê û jiber pêşkêşkirina berhemekê jêhatî û nirxbuha û bi mifa û xizmetek mezin bê wek xelat tête dan⁽¹⁹⁰⁾.

⁽¹⁸⁷⁾ . Elî Cewad Eltahîr, *Menhec Elbehîs Eledebî*, Ç. El'anî, Bexda, 1977 R.30

⁽¹⁸⁸⁾ . H.Ç., R.36

⁽¹⁸⁹⁾ . Xazî Fatîh Weys, R. 38

Her weha hindex corên dî yê vekolînan hene, ew jî evên li xwarê:

2.7.3 Vekolîna Esasî

Lêgeriyaneke Jibo îdyomên esasî û egerên hebûna rûdaneka taybet yan jî pirosêsek yan jî diyardeka taybet, dibêjinê vekolîna têwrî. Xwendine yan jî lêgeriyane li hindex diyardeyên suruştî yan jî divegerin jibo zanistekî, her weha dibêjinê vekolîna esasî, vekolîna esasî merc nîne bête bikarînan di warê Piratîkî da⁽¹⁹¹⁾.

2.7.3.1 Mebestên Vekolînê Esasî

A - armanca prosîsên bingehîne (esasî)

B - hewl didê ravekirina tiştê bikê, ka Jibo çi diqewmin (çêdîbin)

C - bizavê dikê hemî rastîya bidestve bîne.

D - bi zimanekî teknîkî mijarê raport dikê (dinivîsê)⁽¹⁹²⁾.

2.7.4 Vekolîna Piratîkî (Tetbîqî)

Di vekolînên Piratîkî da hindex pirsîyarên karîger û têwr û prensîbên baş tene zanîn û pejrandin. Ew vekolîneye ewa encamê wê tete bicîhkirin (tetbîqkirin), wekî vekolîna bikarînana tetbîqî jibo çalakiyekê⁽¹⁹³⁾.

A - hewl didê bêjê ka çawa tişt dikarin bene guhartin.

B - bizavê dikê rastîya bugherê yan jî dirist bikê ewên arîşe jê çêdîbin.

C - di zimanê berbelav da mijarê berhev dikê û dike raport⁽¹⁹⁴⁾.

Vekolînên esasî û vekolînên tetbîqî tene dabeşkirin li ser sê coran û hindex taybetmendiyên vekolînê heldigrin weku evên li xwarê:-

1- Vekolîna Quantitative

⁽¹⁹⁰⁾ . Elî Cewad Eltahîr, R.29

⁽¹⁹¹⁾ . [Http://En.Wikibooks.Org/Wiki/Research-Methods/Types-Of-Research](http://En.Wikibooks.Org/Wiki/Research-Methods/Types-Of-Research)

⁽¹⁹²⁾ . Www.Innspub.Net/Types-Of-Scientific-Research

⁽¹⁹³⁾ . [Http://En.Wikibooks.Org/Wiki/Research-Methods/Types-Of-Research](http://En.Wikibooks.Org/Wiki/Research-Methods/Types-Of-Research)

⁽¹⁹⁴⁾ . Www.Innspub.Net/Types-Of-Scientific-Research

A- ya jimareyye, neya wesifdanêye, amarê (sitatîstîkîs)ê bikartînê yan jî jimaran û bîrkarî (matematik).

B- encam têne pêşkêşkirin di xişte û wêneyan da.

C- ya misogere.

D - lêdgerê ka kengî û çî û li kû biriyar têne dan û çêdibin⁽¹⁹⁵⁾.

2- Vekolîna Qualitative

A- neya jimareyye, ya wesifdanêye, peyvan bikartênê.

B- zaniyaryên wê naêne wênekirin.

C- vedîtnê (îcadê) dikê.

D - lêdgerê ka kengî û çawa biriyar têtê çêkin⁽¹⁹⁶⁾.

2.7.5 Vekolîna Têkel (Mixed)

Ew vekolîn ji her dû corên berê çêdbê û ji têkelkirina wan pêkdihê û saxletên her dû coran heldigrê. Datayên vê vekolînê û suruştê wan ji têkelkirina peyvan û wêneyan pêkdihê⁽¹⁹⁷⁾.

⁽¹⁹⁵⁾ . H. Ç.

⁽¹⁹⁶⁾ . [Www.Innspub.Net/Types-Of-Scientific-Research](http://www.Innspub.Net/Types-Of-Scientific-Research)

⁽¹⁹⁷⁾ . H. Ç.

3 Şîrovekirin û Polînkirina Gotarên Lîkolînên Edebî Di Kovara Metîn Da

Di vê kovarê da dê wan gotarên lêkolînên edebî nemaze yên me wergirtî dê bi hûrî şîrovekin, ka lêkolînên edebî di kovara Metîn da gehîştine çi astî?

3.1 Destnîşankirina Polînkirina Vekolînan

1- Ew Lêkolînên Edebî Li Ser (Helbestê) Hatine Nivîsandin, Her Wek Vî awayê Jêr Ron û Aşkera Dibe:

J.	Jimara Kovarê	Tarîx	Mijar	Nivîskar	Rûpel
1	15	1992 Kanuna Yekê	Xemên bilbilê dilşad	Ehmed 'Ewnî	46 – 49
2	17	1993 Sibat	Elhu bilind di firît	Reşîd findî	15 – 25
3	25	1993 Çiriya yekê	Hozana Evro	Selman Kovîlî	25 – 29
4	31 & 32	1994 Nîsan, Gulan	Xwendinek li deftera Îşqa Feqiyê Teyran (pişka yekê)	Reşîd Findî	50 - 57
5	33	1994 Huzêran	Xwendinek li deftera Îşqa Feqiyê Teyran (pişka duwê)	Reşîd Findî	31 – 35
6	33	1994 Huzêran	Pênc hozanêt Xanî	Enwer Mihemed Tahir	36 – 44
7	34	1994 Tîrmeh	Xwendinek li deftera Îşqa Feqiyê Teyran (pişka sê)	Reşîd Findî	36 – 42
8	35	1994 Tebax	Xwandinek li deftera Îşqa Feqiyê Teyran (pişka çare)	Reşîd Findî	34 – 36
9	40	1995 Gulan	Cizîrî felsefa	Mihemed	39 – 48

			sofiyatiyê	Emîn Doskî	
10	50	1996 Adar	Newroz di helbesta kurdî da	Mihemed Ebdulla	56 – 58
11	56	1996 Îlun	Naley Firaq	Dr. Şukriya Resul	61 – 69
12	61	1997 Sibat	Hozana evro	Selman Kovilî	41 – 43
13	63	1997 Nîsan	Niwîkirina hozanê	Mihemed Emîn Doskî	36 - 50
14	66	1997 Tîrmeh	Ebdulla Goran	Kemal Xembar	42 - 52
15	68	1997 Îlun	Ebdulla Goran	Kemal Xembar	44 - 53
16	68	1997 Îlun	Kartêkirina şoreşa Îlunê	Reşîd findî	30 – 38
17	69	1997 Çirya Yekê	Xwandinek bo hozana kêçxane	Hoşeng Şêx Mihemed	43 – 49
18	70	1997 Mijdar	Çemkî helbest le edebî kurdî da	Jîwar	20 – 25
19	74	1998 Adar	Li bin Sîbera çarîneyên Baba Tahirî	Tehsîn Îbrahîm Doskî	57 – 61
20	78	1998 Tîrmeh	Li bin Sîbera çarîneyên Baba Tahirî	Tehsîn Îbrahîm Doskî	66 – 69
21	78	1998 Tîrmeh	Vekolîna toreyî	Jîlwar	63 – 65
22	79	1998 Tebax	Sirûşt û helbest taze	Kiwîstan Cemal	59 – 62
23	82	1998 Mijdar	Çemkê niwîxwazî tiyor û waqî	Jîlwar	57 - 59
24	84	1999 Çile	Kêşeya niwîkirina	Jîlwar	62 – 64

			helbestê		
25	84	1999 Çîle	Ehmedê Nalbend û dewlata kurdî û Barzanî	Mihemed Elî Tovî	41 – 48
26	87	1999 Nîsan	Seyfî û sê helbestên veqetiyayî	Îsmâil Badî	39 – 45
27	88	1999 Gulan	Nalî le Bêronî taraw geda	Serkewt pêncwînî	52 – 55
28	90	1999 Tîrmeh	Dengvedana şoreşa Şêx Se'îdî	Musedîq Tovî	29 – 37
29	92	1999 Tîrmeh	Melevaniyek di nav deriyaya hozaneka Sebrî Botanî da	Reşîd Findî	42 – 51
30	93	1999 Çiriya Yekê	Cegerxwîn û serbora şirî	Amîna Sedîq Kovilî	38 – 64
31	94	1999 Mijdar	Dem di şî'ira kurdî ya hevçax da	Yasirê Hesenî	46 – 50
32	95	1999 Kanîna Yekê	Şeytan di hizra Cizîrî da	Fazil Omer	36 – 47
33	96	2000 Çîle	Ferhengoka dîwana Melayê Cizîrî	V: Bilind Mihemed	24 – 50
34	97	2000 Sibat	Qedrî Can û bizava hozana niwî ya kurdî	Rîbar Mihemed Hesen	35 – 51

2- Ew Lêkolînên Edebî liser (Jiyan û Berhem) Hatiye Nivîsandin, Her Wek vî Awayê Jêrî Ron Û Aşkera Dibe:

J.	Jimara Kovarê	Tarîx	Mijar	Nivîskar	Rûpel
1	9	1992 Huzêran	Rewşen Bedirxan stêreka geşe li esmanê ku di bînît û çî car ava nabît	Nacî Taha Berwarî	20 -25
2	9	1992 Huzêran	Giyânêt pîroz li esmanî	Reşîd Findî	10 -60
3	13	1992 Çirya Yekê	Jîn û jiyana seyda Cegerxwîn	Şewket Tahir	11 – 17
4	14	1992 Mijdar	Qedrî Can yê nemir	Revendê Tovî	19 -25
5	20	1993 Gulan	Hozanvan Tîrêj	Îsmâîl Badî	41 – 46
6	21	1993 Huzêran		Maîyê ne mir	14 – 20
7	28 & 28	1993 Kanîna Êkê 1994 Çile	Seyda Cegerxwîn bi kê daxbar bûye	Şewket Mela Tahir Sindî	60 -62
8	31 & 32	1994 Nîsan û Gulan	Mîhrî	Ebdilsetar Fetah Hesên	58 – 59
9	31 & 32	1994 Nîsan û Gulan	Hîbûna zarokan	Konê reş	76 – 80
10	34	1994 Tîrmeh	Bekir beg mîratiya bê biniyat	Mehemed Emîn Doskî	22 – 25
11	34	1994 Tîrmeh	Feqîyê Teyran û (mentiq elteyir)	Mesud Seîd Yasîn	26 – 30
12	35	1994 Tebax	Giranmêriya Ehmedê Xanê	Konê reş	55 – 58
13	35	1994 Tebax	Mela Yusifê	Tehsîn	29 – 33

			Kêsteyî	Îbrahîm Doskî	
14	36	1994 Îlûn	Pêdaçûnek	Dêrsim Memo	62 – 63
15	36	1994 Îlûn	Mela Yasîn Ebdula Bêduhî	Cemîl Mihemed Şêlazî	28 – 31
16	42 & 43	1995 Tîrmeh, Tebax	Ebdulrehman Eqtepî	Tehsîn Îbrahîm Doskî	44 – 57
17	49	1996 Sibata	Li bîreweriya wexerkirina Hejar Mokiriyani	Îsmâîl Badî	5 – 9
18	50	1996 Adar	Mela Elî Beroşkî	Tehsîn Îbrahîm Doskî	44 – 49
19	55	1996 Tebax	Hozana netewî li cem Mukiriyani	Reşîd Findî	52 – 64
20	64	1997 Gulana	Ebdulrehman Eqtepî	Tehsîn Îbrahîm Doskî	48 – 54
21	69	1997 Çirya Yekê	Şanamey Firdewsî	Ehmed Berzencî	24- 35
22	70	1997 Mijdar	Şanamey Firdewsî	Ehmed Berzincî	30 – 49
23	71	1999 Kanîna Êkê	Şerefyanê Edîb û hozanvan	Dr. Mehemed Bekir Mehemed	4 – 12
24	73	1998 Sibata	Hejar di jiyannama xwe da	Enwer Mehemed Tahir	35 – 45
25	76	1998 Gulana	Dengdanewey peyamî Xani û Hacî	Dr. Mihemed bekir	13 – 19
26	84	1999 Çîle	Nalbend di Gêjvanka havîbonê	Fazil Omer	49 – 61

			da		
27	85	1999 Sibat	Mem û Zîn boçûnek... bîblogirafiya û hevber kirinek	Îsmaîl Badî	56 – 62
28	98	2000 Adar	Seyid Tahirê Haşimî, zana û başnivîsî û şa'îr	Îsmaîl Badî	16 – 23

**3 - Ew Lêkolînên Edebî Li Ser (Kêşnasiyê) Hatiye Nivîsandin, Her Wek Vî
Awayê jêrî Ron û Aşkera Dibe:**

J.	J. Kovarê	Tarîx	Mijar	Nivîskar	Rûpel
1	72	1998 Çile	Le pê Naw nusînî helbestekanî Xanî, beşî yekem	Dr. Mihemed Bekir Mihemed	37 – 50
2	73	1998 Sibat	Le pê Naw nusînî helbestekanî Xanî, beşî diwem	Dr. Mihemed Bekir Mihemed	70 – 73
3	74	1998 Adar	Le pê Naw nusînî helbestekanî Xanî, beşî yekem	Dr. Mihemed Bekir Mihemed	24 - 28
4	80	1998 Îlun	Vegirtina erozê	Tehsîn Îbrahîm Doskî	49 – 63
5	81	1998 Çirya Yekê	Vegirtina erozê	Tehsîn Îbrahîm Doskî	53 – 63

**4 - Ew Lêkolînên Edebî li ser (Edebê berawird) hatiye nivîsandin, Her Wek Vî
Awayê Jêrî Ron û Aşkera Dibe:**

J.	J. Kovarê	Tarîx	Mijar	Nivîskar	Rûpel
1	72	1998 Çile	Rêbazekanî edebî berawirdkarî	Hêmin	51 – 58
2	74	1998 Adar	Di nav bera Şemdîn û Musîsana da	Jîlwar	52 – 56
3	80	1998 Îlun	Dadgeh û Kabos	Newzad Ebdula Hesên	42 – 48
4	82	1998 Mijdar	Ziman û nasnamey netewayetî deq	Hêmin	60 – 63
5	94	1999 Mijdar	Nalbend û VanKox	Şemzîn Xelîl	32 – 45

5 - Ew Lêkolînên Edebî liser (Rêbazên Edebî) Hatiye Nivîsandin, Her Wek Vî Awayê jêrî Ron û Aşkera Dibe:

J.	J. Kovarê	Tarîx	Mijar	Nivîskar	Rûpel
1	46	1996 Sibat	Êmaje û Hêma	Rewuf Hesên	40 – 52
2	65	1997 Huzêran	Dîtineka riyalîzmî Pişka Yekê	Hizirvan	32 – 50
3	66	1997 Tîrmeh	Dîtineka riyalîzmî Pişka Duwê	Hizirvan	22 – 41
4	82	1998 Mijdar	Biniyat û Pêşkeftina Fêrgeha Sembolîzim	Erşed Remezân Îbrahîm	64 - 70

6 - Ew Lêkolînên Edebî li ser (Wergêrana Edebî) Hatiye Nivîsandin, Her Wek Vî Awayê jêrî Ron û Aşkera Dibe:

J.	J. Kovarê	Tarîx	Mijar	Nivîskar	Rûpel
1	20	1993 Gulan	Gunar Egeluf	Mehfuz Mayî	30 – 37
2	85	1999 Sibat	Ew kiça du caran Jiyay	W: Ehmed Ebdulla	63 – 64
3	89	1999 Huzêran	Ehmedê Xanî û Mem	W: Teyib	54 - 62

			û Zîn	Deştanî	
4	92	1999 Îlun	Şi'îr û komelga	W: Se'îd Memozînî	52 – 53

7 - Ew Lêkolînên Edebî li ser (Çîrokê) Hatiye Nivîsandin, Her Wek Vî Awayê Jêrî Ron û Aşkera Dibe:

J.	J. Kovarê	Tarîx	Mijar	Nivîskar	Rûpel
1	46	1995 Mijdar	Teknîka axiftinê	Îsmâîl Badî	38 – 43
2	67	1997 Tebax	Cihnavekê şermula	Îsmâîl Badî	49 – 53
3	75	1998 Nîsan	Rolê Kovara Hawar bo pêşxistina çîroka kurdî	Enwer Mihemed Tahir	35 – 43
4	80	1998 Îlun	Cizîrî û çîroka afrandinê	Dr. Fazil Omer	64 – 74

8 - Ew Lêkolînên Edebî li ser (Rexneya Edebî) Hatiye Nivîsandin, Her Wek Vî Awayê Jêrî Ron û Aşkera Dibe:

J.	J. Kovarê	Tarîx	Mijar	Nivîskar	Rûpel
1	45	1995 Çîrya Yekê	Rexna û Yekgirtin	Emînê Osman	41 – 46
2	51	1996 Nîsan	Dîtinek bo edebê kurdî	Dilman Amêdî	46 – 50
3	59	1996 Kanîna Yekê	Rexneyeka zimanewey	Mihemed Ebdulla	25 - 37
4	86	1999 Adar	Mem û Zîn û Têkşêlan	Emînê Osman	37 – 49

9 - Ew Lêkolînên Edebî li ser (Şanoyê) Hatiye Nivîsandin, Her Wek Vî Awayê Jêrî Ron û Aşkera Dibe:

J.	J. Kovarê	Tarîx	Mijar	Nivîskar	Rûpel
1	10	1992 Tîrmeh	Şano ya me û şanogerên wê	Îbrahîm Ehmed Simo	44 – 47
2	58	1996 Mijdar	Berev şano ya zarokan, pişka yekê	Ziyad Giravî	37 – 49
3	59	1996 Kanîna Yekê	Berev şano ya zarokan, pişka Duwê	Ziyad Giravî	49 – 55
4	71	1997 Kanîna Yekê	Pêdaçûnek di şanogeriya (Melayê Cizîrî) da	Îsmâil Badî	48 – 52

10 - Ew Lêkolînên Edebî li ser (Romanê) Hatiye Nivîsandin, Her Wek Vî awayê jêrî Ron û Aşkera Dibe:

J.	J. Kovarê	Tarîx	Mijar	Nivîskar	Rûpel
1	67	1997 Tebax	Binema huneriyekanî (mesar)	Dr. Şukriya Resul	36 – 39
2	76	1998 Gulan	Çend layenekî bînay hunerî	Adil Mecîd Germiyanî	27 – 39
3	85	1999 Sibat	Çend pênaseyekî zarawekanî roman û çîrok	Adil Mecîd Germiyanî	48 – 55

11- Ew lêkolînên edebî li ser (Fuliklurî) Hatiye Nivîsandin, Her Wek Vî Awayê jêrî Ron û Aşkera Dibe:

J.	J. Kovarê	Tarîx	Mijar	Nivîskar	Rûpel
1	70	1997 Mijdar	Dengê resenî qefqasî kurd	Dr. Şukriya Resul	26 – 29

12 - Ew Lêkolînên Edebî li ser (Pexşanê) Hatiye Nivîsandin, Her Wek Vî Awayê Jêrî Ron Ş Aşkera Dibe:

J.	J. Kovarê	Tarîx	Mijar	Nivîskar	Rûpel
1	64	1997 Gulan	Pexşanekî kurdî bi Elifbay Ermenî	Dr. Ferhad Pîrbal	23 - 33

13 - Bi Giştî Lêkolînên Edebî li ser Corên Edebî Mina (Rêje) Bi Vî Awayê Jêrî Ron û Aşkera Dibe:

J.	Coreyên lêkolîn li ser hatine encamdan	Rêje
1	Helbest	35.051 %
2	Jiyan û Berhem	28. 865 %
3	Kêşnasiyê	5. 154 %
4	Edebê Berawird	5. 154 %
5	Rêbazên Edebî	4. 123 %
6	Wergêrana Edebî	4. 123 %
7	Çîrok	4. 123 %
8	Rexna Edebî	4.123 %
9	Şano	4.123 %
10	Roman	3.092 %
11	Fuliklor	1.03 %
12	Pexşan	1.03 %
Sercem		100 %

3.2 Şîrvekirina Gotarên Vekolînên Edebî Di Kovara Metîn Da

3.2.1 Şîrovekirina Girêday (Helbestê)

Di kovara Metîn da (100) heb me ji xula sê wergirtne, sercemê wan 34 hebin li ser (helbestê hatine nivîsîn) di vê kovarê da ev jandê edebî rolekê mezin dîtiye jibo lêkolînên edebî, em li ser hindê mînakên helbestê rawestî û şîrovekin. Gotarek heye bi navê (Kêşeya Nûkirina Helbestê û Kêşa Xomalî û Raberîya Helbesta Nû Ya Kurdî) ji aliyê Jîlwar ve hatiye nivîsîn li bajarê hewlêrê sala 1988. Di vê gotarê da nivîserê giringê daye kêşa hîca yan pence ev kêşeka xomalîye li çerxê

19 di nav edebyatên goranî da despêkrîye, pzavkirye renge ev kêşe hadbê ew jî dikevê li ser sînoren îraq û îranê.

Her weha (rengê dariştina helbestê di vê gotarê da bi awayekê dreng dest pêkirye û şêwazê helbestê yê nazbû mîna hozanvan li ser kêşa birgeyî dadrêjn penayê nabê bermalka kêşa erûzê şkestê ret dikê, ramana kêşa birgeyî pêşket û ji kêşa hozana kilasîkî ya kurdî û rizgarkirina tekista helbestê ji kêş û serwa, eve jî dbê sînorek jibo ber bi hizra naveroka helbestê ve bçin, ev kêşeye jî bi rêka helbestan hatîye di nav helbestên kurdî da)⁽¹⁹⁸⁾.

Mîna kêşeya xomalî di çarçevêkê taybet da wek di wan deryan da, jibo mînakê (Hezec, Remel) ev her dû derya sîmayekî taybet hebû jibo şêwazê kilasîkîya kurdî.

Her weha (cudahîya bekarînana birgeyên di navbera helbesta kevin û nû da, mîna helbesta kevin û hozanvan her dû deryayên 'erûzê bikarîname wek hezec û remel, belê helbestvanê nû yê azade di bikarîname hemî deryan da, belê kêşa xomalî xwe bi şêwazê nû dde nasîn. Mîna raberê nûkirina hozana kurdî dibê (Goran))⁽¹⁹⁹⁾.

Guhartina naveroka helbestê digel hez û daxwazyên civakê û mekanîzmê guhartinê, peykerê helbestê divê hevsengiyek hebê li dûv dû nîv malkan yeksan bê ji rûyê kêş û serwayê ve, eve jî dibê guhartina naveroka binema û mijarên helbestê, lê kêşa "kelepûrî ya xomalî ji deh- birgeyên kurdî pêkhatîye ku helbestvan di devera goran da bi şêweyekê berçav pêş dikevê di belavkirina edebyatên 'Erebî da û hatine nivîsîn ji aliyê nivîskar û helbestvanên wî bi taybetî (şêx nûrî, reşîd necîb) bi edebê turkî xembarbûn me pêkve nivîsîye. Çunkû paşeroja hozanê di guhartineka nû da çarserkirine"⁽²⁰⁰⁾ mîna şêx nûrî ji sînore bajarê Silêmanî derneketîye û nesaxya wî karekê saykolojî xrab krîye li ser dil û derûnê wî, belê goran bi endametiya rêkixrawên aştyê hawkarî 'îraqê kirye, seredana doza gelê kurd krîye û bizav kirine şêx nûrî bibîne hevalên wî hacî qadir û pîremêrd û rehîmê hekarî.

Gotareka dî heye bi navê (newroz di helbesta kurdî da) ji aliyê mihemed 'ebdullae-, ev gotar bi tîpên latînî hatiye nivîsîn di vê kovarê da ya xuyaye li her

⁽¹⁹⁸⁾ . Jîlwar, *Kêşeya Nûkirina Helbestê*, Ko. Metîn, Jimar84, 1999, R.62

⁽¹⁹⁹⁾ . H.Ç., R. 62-64

⁽²⁰⁰⁾ . H.Ç., R.63-64

welatekê cîhanê bîrhatin û cejn û tîtalên xwe sal jibo salê cejn û aheng jibo tênekirin, mîna cejna (zakmok ya babilyaye ku ev cejne şeş roja vedkêşê û cejn jibo tênekirin her weha yunanyan heyva adarê kirbû serê sala nû, ev heyve bûbû cwanya hînkatyê⁽²⁰¹⁾.

Her weha mîna "welatê kurdistanê ji wan cejn û bîrhatna heyva adarê û rêzgirtna vê heyvê rengtir û xweştir li dev kurdan ku cejna newrozêye, kurdaye li serdemê (cemşîd yan efrîd û hatiye rûdan jibo vê cejnê ku dzîvrê sala (440k.) her hemî şevên newrozê çîr û cwan û blind berev asmanî diçin gelek nivîserên dî yên 'ereb û byanî behsê newrozê kirine ku kirine sitran jibo gotnên firdewsî, her weha helbestvanê kurd giringiyeka mezin daye newrozê gelek srûd pê hatine gotin ji wan nivîseran evene (czîrî, xanî, mewlewî, pîremêrd,..Htd)⁽²⁰²⁾.

Mîna gelek hozanvanên kurd navê cejna newrozê di helbestên xwe da înane wek ehmedê xanî, melayê czîrî, Cegerxwîn, sebrî botanî, em dê yek ji van helbestvanan wegrin, helbestvanê navdar û nîştîmanperwer ehmedê xanî li ser hevdozya dastana mem û zîn wek serhatiyek li ser zarê pîremêrekî basê newrozê dike û dibêjê:

Danayê mu'emmerê kohen sall

Evrrengêhe go bome ji ehwall

Ku 'adetê pîşiyê zemanan

Ev bû le hemû cihe û mekanan

Weqtê weku şahsiwarê xawer

Te'uyil dîkir dimahê azer

Ye'nî ku dehate bircê sersall

Qet kes nedma di mesken û mall

Bîlcûmle diçûne der ji mallan

Heta digehişte pîr û kallan

⁽²⁰¹⁾ . H.Ç.

⁽²⁰²⁾ . Mihemed Ebdûlla, *Newroz Di Helbesta Kurdî Da*, 1996, J. 50, R.58

Roja ku dibûye 'îdî newroz

Te'zîm jibo me dema dill evroz⁽²⁰³⁾

Her weha gotareka dî bi navê (xemên bilblê dilşad) ji aliyê ehmed qirnî ve hatiye nivîsîn li ser vekolînên edebî, di vê gotarê da bi hûrî li ser rawestî û şrovekin, ku mamustayê helbestvan (TÎRÊJ) navê yekem dîwana wî bi navê (xelat) bû ev dîwane li dawîya sala 1991 li bajarê stokholmê bi tîpên latînî çapbûye (Dîwana Tîrêj) ji (213) rûpelan pêkhatiye bi qebarê navnicî hatiye çapkirin.

Her weha helbestên dîwana tîrêj bi vî awayê jêrê dabeş bûne:

- 1- SERPÊHATIYA EVÎNÊ. 2 HELBEST
- 2- BEŞÊ MARŞ Û RUSTAN. 21 HELBEST
- 3- BEŞÊ GAZÎ Û ŞÎNAN. 10 HELBEST
- 4- BEŞÊ EVÎNÎ. 36 HELBEST
- 5- ÇEND RISTÊN ÇANDIN Û ÇÎROKÊ. 9 HELBEST⁽²⁰⁴⁾

Her weha malkên helbestan di vê dîwanê da zorn, ku ya hêjaye bêjn naveroka helbestên dîwana wî ya paqij û sozpend û bi awaz û kêş xuya dibin, tîrêj herdem digel doza gelê kurdibû lewra helbestên wî jibo rizgarkirina arîşa gelê kurd mîna wekî (azadî, perwerdekarî, aştî, yekgirtin...Htd).

Bi kurt û kurmancî tîrêj kariye me fêrî 'şqa axa welatî bikê.

Her weha hozanvan tîrêj li sala 1923 li gundê (Nicîmî) ser bi qeza qamişlo hatiye ser dunyayê, navê wî yê dirist (Nayif)bû kurê Heso, û ji malbateka hejar, bi nasnavê Tîrêj dihate naskirin di temenê şeş saliyê da dest bi xwendna quranê krîye, û digel çend pertûkên olî li sala 1937 hatiye bajarê amûdê her ji temenê 5 salya dbistan xwendîye jiber barê aborîya xrab xwendin tmamnekrîye, belê tîkelya wî digel helbestvan û ronakbîran bi hêzbû, yên wekî Cegexwîn, Qedrî Can, Nuredîn Zaza...Htd.

⁽²⁰³⁾ . H.Ç., R.58-59

⁽²⁰⁴⁾ . Ko. Metîn, Jimar15, Sala 1992, R.46

Lewma "mamustayê tîrêj çî tişt mirov mezin nakin, jiblî xemên bilblê dilşad ku ew jî debrîne ji doza kurdistanê di dlê meda mezin krîye her weku nuha min doza cîhanê min deng vedayî, demê mirov dîwana tîrêj dxuynê bi hesanî dighêje wê rastyê ku tîrêj hozanvanekî şoreşa kurdistana başûrbû"⁽²⁰⁵⁾.

Mîna li ser helbesta (Bilbilê Dilşad) dê çend malkeka wegrin, evên li xwarê:

Ey bilblê dilşadî hela werbke fiğan

Derdê me grane ey bra brîna me kûre

Gorî tebêtin cerg û dil û mêlak û hem can

Dengê teye xweştir ji ney û nay û blûre

Sê awa te deng, yek ji sra bayê sbaye

Awayê dî ji dengê xuşîna dehil û rezaye⁽²⁰⁶⁾.

3.2.2 Şîrovekirina Girêday (Jiyan û Berhem)

Di kovara Metîn da li sercemê (100) dane ji wan (28) gotar li ser lêkolînên bi jiyan û berhem hatîne nivîsîn, em dikarin bi kûrî li ser hindêk mijarên li ser jiyan û berhemî rawestî û şîrovekin, gotarek li jêr navê (seydayê Cegerxwîn bi kê daxbar bû) ji aliyê şewket mela tahîr sindî ve hatiye nivîsîn.

Seydayê Cegerxwîn gelek yê daxbar bû bi dîroka kurdayetî bi taybet Cegerxwîn dîroknivîsbû û xwendîngeha kurdayetîbû, wan gul gulzarên baxê kurda geşebûye bi seydayê Cegerxwîn, bi kurdayetyê ser blindîbû, şanazî bi xizmeta mirovayetî dbir ku li despêkê amadebû xizmeta welat milletê xwe bikê.

Her weha Cegerxwîn di pertûka xwe da çar part hebûn, ewa (dîroka kurdistanê) gelek hozanên seyda helbesta (şahnama şehîdan, hozana kîme ez) şanazî bi hemî hozanvanên kurd dbir, giringîyeka mezin daye zana û nivîserên kurd, belê ji hemya Cegerxwîn gelek daxbarbû bi seydayê mezin ehmedê xanî (ehmedê nemir) xudanê (mem û zîn) jibo gel û welatê xwe ev mînaka li xwarê ye:

⁽²⁰⁵⁾ . H.Ç., R.48

⁽²⁰⁶⁾ . H.Ç., R.48

(kengî ji dîbaca mem û zîn xweştir dbêjî bes Cegerxwîn, dîsa Cegerxwîn yê daxbarbû bi dîbaca mem û zîna seyda, rêzgirtneka mezin hebû di nav milletê kurd da xebateka mezin hebû jibo kurd û kurdistanê⁽²⁰⁷⁾.

Cegerxwîn xwe bi berhemekê biçûk dizanî, belê seyda ehmedê xanî jibo şiyarkirina milletê kurd taybet jibo hejar û belengazan di helbestekê da milletê me ji xew rabin ehmedê xanî "helgirê alayê kurdayetyê bûye, ehmedê xanî dîbaca îdyolojya kurdî ya (mem û zîn) daxbarbû û Cegerxwîn bi rêbaza kurdayetyê, nemaze gehiştina mrada (mem û zîn) ewa li ser dibêjê:

(dlixweşn her wek stî û tajdîn

Nemaze Cegerxwîn û welat man wek mem û zîn"⁽²⁰⁸⁾.

Her weha gotarek heye bi navê (Mela Yasîn 'Ebdulla Bêduhî) ji aliyê cemîl mihemed şêlazi ve hatiye nivîsîn, em mijare yeke ji mijarên edebî di vê kovarê da hatiye nivîsîn giringiyeka mezin daye vî corê edebî, ev hozanvane yeke ji van hozanvanên kilasîkê kurd û hozanvanên kilasîkê kurd hatiye aşkrakin jimareka gelek ji helbestên di dîwanên wan da hatine çap û belavkirin, mîna hozanvanên nû heyam bi heyam li ser kaxezên rojnamegerîya kurdî dihatine belavkirin, "nemaze ev hozanvan, jimareka gelek helbestên hozanvanan komkirine û digel hozanên xwe û digel dû destxetên xwe belê hindek cara mixabin ew destxet hatine windakirin û pûçikirin mîna hozanên farsî dû hozan li dev hatine parastin li dev hozanvanî"⁽²⁰⁹⁾.

Navê vî hozanvanî (Mela Yasîn 'Ebdulla Bêduhî ye, li sala 1938 çûye ber dlovanya xudê, hebûna wî ya diyar nîne, evî hozanvanî navê xwe li ser helbestên xwe diyar nekrîye li bin helbestên xwe bi 'Erebî nivîsîne ew jî bi navê (E'lem Inehû Malî) her weha ev hozanvan helbestên xwe bi awayekê pexşanî nivîsîne bi hizra min ew jî jiber nebûn û kêmatiya kaxezê bû elbet hozanvanî hindek malkên bi kêş û serwa bikarîname ne diristin belê hîviya min ewbû ew jî bibê prek jibo dîroka hozanvanên kilasîkên kurd û çendîn helbest bi vî awayî malk bi kêş û serwa hatine nivîsîn⁽²¹⁰⁾.

⁽²⁰⁷⁾ . Ko. Metîn, J. 27-28, 1993 Û 1994, R. 60-61

⁽²⁰⁸⁾ . H.Ç., R.61-62

⁽²⁰⁹⁾ . Ko. Metîn, J. 36, 1994, R.28

⁽²¹⁰⁾ . H.Ç.

Gotareka dî li jêr navê (Mela Yusivê Kêsteyî Helbestvanê Kurd) ev gotare ji aliyê tehsîn îbrahîm doskî ve hatiye nivîsîn, ev hozanvane rehmeta xudê lê bê (Mela Yusiv Kurê Mela Ebû Zêdê Kêsteyî û "kêsteyî wek nasnav hatiye nivîsîn jibo vê xelkê, çunkû gundê hozanvaniye li devera Berwarî Balaye, gundekê kevne dikevê rojavayê bakurê gundê çelkê ya xuyaye di vî gundî da jimareka zana û xebatker hene jibo milletê xwe pêş dikevin û binemala yusivî peywendyên baş hebûn digel Mîrê Cizîrê û Bedirxan Begê girêdayî hakimê li Zaxo bû sala 1843, ev mîre yeke ji navdarên têkoşerê vî gundî bûn, Mela Yusiv li sala 1325 mişextî beramber 1906 zayînî jidaykbûye, ev helbestvan ji binemaleka olîbû her ji zarokîniya xwe dest bi xwendna quranê kirye li dev babê xwe bi dawî înyê û jimareka pertûkên şer'etê xwandne bi zimanê farsî û 'Erebî piştî seyday îcaza melatyê wergirtî li gundê bapîrê bi çemkê maltayê dewamkirye hejarî dîtiye jiber zulm û zordarya milletê xwe ev çende jî bûye kusp di edebî da"⁽²¹¹⁾ seyda jiber wan kawdanên li nav şoreşên jimareka nexweşyan li dev peydabûye sala 1408 mşextî beramber 1988 çûye ber dlovaniya xudê li gundê erzê hatiye veşartin, dîwana kêsteyî li ber dest ya tamamker nîne, belê em dikarin basê helbestên bi destxetên wî nivîsî bikin ew parastîne herdem li dev wî herdem helbestvan yê serferazbû, dêra xwe da dbêjî ku helbestvanekî hest sivkbûye li dev xwendevanan ku karîye axiftnên xweş û nazik bigehîne her kesekê û dîwana wî bxuyê wek navbera wî nalî da dibîne. Dîwana vî helbestvanî pêkhatiye ji nêzîkî sed rûpelan ji qebarê mezin û çar helbest hene li jêr van mijarên xwarêne (Şefa'et, Qewlê Melay, Peşemanî, Bihara Welatî, Hîvî, Pîrî, Welat, Xebat, Pêşmerge, Seyran, Karwan...Htd)⁽²¹²⁾.

Nemaze ya diyare seydayî têkelîya helbestvanên kurd yêr kevin despêkirye û tê jimartin kevintrîn helbest ewa bi navê (Qewlê Melayî) sala 1954 zayînî li gundê (Binavê) hatiye vehandin, para bêhtir helbestên wî li sala 1980 hatiye nivîsîn, helbestên dîwana kêsteyî di çend mijaran da hatine wekî (Xudê Ê Tris, Zuhdê, Kurdînî, Milletînî, Serhatî...Htd), seyda çend helbestên corawcor yêr giranbuha êxistine berdestê xwendevanan wek (Xebat, Pêşmerge, Koçkirin... Htd)⁽²¹³⁾.

⁽²¹¹⁾ . Ko. Metîn, J.35, 1994, R.30

⁽²¹²⁾ . H.Ç., R.32

⁽²¹³⁾ . H.Ç., R.31-32

3.2.3 Şîrovekirina Girêday (Kêş Nasiyê)

Di kovara Metîn da ji (100) dan me wergirtî ji wan (5) dane li ser gotarên kêş nasînê ye. Gotarek bi navê Vegirtneka 'Erûzê Bo Lengî Bergê Yekê Yê Baxê Kurda, ji aliyê Tehsîn Îbrahîm Doskî ve hatiye nivîsîn, têda behsa dîwana Kaxê Kurda kirye giringîya derketina wê çunkû xwendevanê kurd çaverê vê dîwanê bûye, lewra dibêjê dilê xwendevanê kurd xweşbû û çavên wî ronbûn, her weha supasiya her aliyekê kirye ku dest di parastina saxkirin û çapkirina vê dîwanê hebûye bi taybet seydayê hêja mela tahayê mayî ewê zehmet kêşayî bêxemet "rizgarkirina (Baxê Kurda) ji hişkbûnê stûnê nivîserê amajey bi wê pendê dikê ku dîwan hinde mezin, karekê bi hesanî nîne ji aliyê kesekê yan heta çar kesan jî ve bête komkirin û rast vekirin, wekî ya zanaye ku çi kar berhem nabin û ma hîvya xudanî her karekê ewe hindek di dûvra kêmasî yê nehêln, piştî pêdaçûneka hûr, hêja tehsîn bi ser baxê kurda da krî, aşkrabû ku çend deng yên kêşê ketne ji hindek malkên dî jiber çend egeran ku staşên çapê dikevne berî hemîyan wek pişkdaryek ji aliyê seydayê tehsîn ve jibo rastkirina baxê kurda vegirtna lengê bergê yekê 'erûzê ev mijare amadekirye"⁽²¹⁴⁾.

Seydayê tehsîn hişyarkirineka pêdvî jibo xwendevanî heye dibêjê: çunkû destnivîsên vê dîwanê li berdest nîne vegirtna xeletiyên da bêhtir dê palvedeme pêkhatiya ristê ji aliyê zimanî bi rengekê wesa ku di gel kêşa her helbestekê bguncê, ez di vê nivîsîna xwe da bitenê dê îşaretê deme lengên 'erûzê, es xwe di xeletiyên rênivîsê nagehînim her çende ew jî bi hizra min gelekî, li gelek chan seyda yên berhevker tîpa xwe ya bi latînî nivîsiye û ev çende gelek lengî êxistiye di kêşê da, belê bi hesanî xandevan dikarê bi ser vê çendê helbibê, me xwe di vê staşyê da negehandîye û li her chekê yekemîn çar malkê wekî dîwanê da çapûy ya nivîs paşê bi rengê ew hizir dikê ya diriste ya nivîsî her weha heta lê kêşê yan jimareka dengên piştî hingî berçavkirye jibo nimûne mixabin em ji vî warî bçîne qebrê reş û tarî ya dirist: mixabin em ji vî warî bçin qebrî reş tarî. Kêşa mifa'îln, mifa'îln, mifa'îln, mifa'îln. Pişka duwê di vê jimarê da dû sed vegirtne jibo dû sed lengên kêşê ewên ketîne (326) rûpelên bûrî yên bergê yekê (ji baxa kurdan) sercemê dîwana ehmedê nalbend, her weha çend têbînyek hene fere xwendevan lê agehdar bkin:

⁽²¹⁴⁾ . Ko. Metîn, J. 80, 1998, R.50

1- ev lengîye ne hemî lengyên bergê yekêne, belkî hêşta hene belê bitenê dû sed tenê me jê helbjartne.

2- gelek ji van lengan xeletyên çapêne û hindek jî xeletyên dakirinêne û dûr nîne hindek jî bin. Bi taybetî demê ku nalbendî helbest li ser pê vehandin.

3- di vegirtna lenkyan da berê me kêşa 'erûzê bûye, û li dûv zîrekya xwe xeletî dirist krîne.

4- ev nivîsîne çî j buhayê dîwanê yan karê amadekeran kê m nakê, belkî pêngavekê jibo tekûsîkirina vî karê jêhatîye.

5- jibo destnîşankirina her kêşeyekê me kêşa ojînal ya hozanê nivîsiye⁽²¹⁵⁾.

3.2.4 Şîrovekirina Girêday (Edebê Berawurd)

Edebê berawurd sercemê (100) dane me wergirtî bitenê (5) ji wan li ser edebê berawurdin dê hindek ji wan bi hûrî şîrovekin.

Gotarek bi navê dadgeh (kabûs) li ber ronahya edebê berawurdkarî, hatiye amadekirin ji aliyê newzad 'ebdûlla hesen ve, bi dîtina nivîserî ev corê vekolînan nav vekolên me evên li rûpelên kovar û rojnama belavdibin neku digiringin, belê hêşta kesê xwe li vê têla nedaye helbet bayexê ya ji vê corey nivîser dbêjî jibo mirov tiştek mezin û fere aşkra dibê ew jî hevbendîya di navbera milletan da ji aliyê rewşenbîrî, hizrî û edebî ku babetê me bi vî rengî hatiye pênasekirin berawurdkarî: "birîtîye berawurdkarî di navbera çend edebanda ji alyekê dîve çemkê edebî berawurdkarî berawurdkirina edebî digel huner û zansitên dî jî bi xwe digrê. Ev li dûv rêbaza xwendîngeha emrîkî bû, li dûv rêbaza xwendîngeha frensî: brîtîye ji lêkolîn û peywendîya edebî digel edebekê dî ji dervey sînore ziman û netewî da"⁽²¹⁶⁾.

(Kabûs) çîrokeke ji çîrokên çîroknivîs û romanivîsê mîsrê Dr. Necîb Geylanî, têda jibo çarenivîsê mirovekê stemkarî berçav dikê dê basa vê çîrokê kin (dadgeh) şanogeryeke ji nivîsîna Qasim Husên, bi çîroka geylanî karîgerbûye. Edebê berawurdkarî nîşa me didê diyarkirina karîgeryê em jî dê ji dû alyan ve diyarkin ji dervey û ji nav da.

⁽²¹⁵⁾ . Ko. Metîn, J. 81, 1998, R.63

⁽²¹⁶⁾ . Ko. Metîn, J.80, 1998, R.42

Grovên karîgeriyê ji aliyê derveyî meztir girov eveye nivîserê (dadgeh) bi xwe diyar dikê ku danpêdanê dikê ku yê bi (kabûs) karîger bûy:

- 1- li ser destxeta (dadgeh) nivîsîye (hizra serekî ji çîroka elkabûs ya nivîskarê navdar Dr. Necîb Geylanî ye eveye mezintrîn belge girov.
- 2- Rojnama Resen ewa li roja 27/10/1997 derketî çavpêketneka rojnamevanî digel kirye (qasm husên) kirye û têda pirsiyarê jê diket: hizra vê şanogeryê ji kîveye? Ew jî dbêjî: ji çîroka elkabûs ya nivîserê navdar Dr. Necîb Geylanîye, belê piştî gelek destkariyê.
- 3- paşbenda 'Erebî ya rojnamê ewa li roja 13/2/1998 derketî çavpêketinek digel kiriye⁽²¹⁷⁾ her dîsan dibêjê hizra serekî ji çîroka Elkabûs ya Dr. Necîb Geylanîye, Geylanî pêdaçûnek di vê çîrokê da xewneka bûye gelek daskeyê 'Ereb jibo me vedigrê têda digehê rojeka ku gelek têne li dev pisiyar avê ji xelkê dikê kes bersivê jibo nadê bitenê zelamek nebê, ku ew zelame dibê hevalê xewnê, ev zelame derdikevê, dergehvanekê zîndaneka erdî dyalokeka bhêz û şeredev dnavbera wan da çêdbê û her bîra wî li duniyayê tê û hevalê wî jî her bîra wî di zulm û stemkarya digel gelê wî fikir dhê, yekcar nexweş dibê û li dawyê ev heval xatra xwe jê dixwazê ji xew radbê dora xweve gelek dbêjî û her dibêjê kabûse, "elbet geylanî di vê temaşey hemwarê xwe bikê, li dûv hizra xwe nivîserê kabûs temaşey welatê xweyê bi navê demokratîyetê û azadîya hizir û bîran û welatê yek ji welatên musulman hatîye naskirin divê ew hizrên dibêjine hukümetê (ne) nebin, eve nemayn û nebaşyek cem geylanî. Gelo ebebû pê dê rojhelat û bi taybetî welatên 'ereb hebê, ev avahîye civakê wî li ser avabûyê, û çî tiştê xwe li ser nagrê, tû çî dbêjîye mirov bi taybetî mirovê djî hizir û bîrên çalabketin û azadîya hizir û bîran di nav civakê da çawa bibê serî, eveye ravekirina nivîserî jibo civakê weha xwe ev stemkare radestî roja dawyê kirye li dadgeha asmanî ewî dadgeh bikin ev hewildane jî hatiye piştî her mirovek ji çaryên berwext bê omêd dbê, dadgeh şanogerye eve jî xewna stemkarekê bû me vedgêrî û paşî nîşa me didê ev stemkare mafên milletan xwarye belku di netewîne, ev stekare jî remze jibo mafixwerên milletê nivîserî, piştî şanoya vala wê mirov diçe

⁽²¹⁷⁾ . H.Ç., R.43

ji nav nivîsîna dîne der û her dîsa şerekê derûnî digel dikin û rezîl û şermezar û şepirzedbê lê di dadgehê da bêhtir qalbekê netewîye li cem nivîserî çî hevdişî nînin di navbera hizra wî mafên netewî û yên gelê wî da belkî dakokyê li ser dikin û diyare li ser salên wî ev millete stemkare, gelek nexweşya dbînê û dête ser cihê wî radbîteve û derkevê û dibêjê: dadgeh - rastî – dîrok"⁽²¹⁸⁾.

Gotareka dî bi navê ziman û nasnama netewayetî deq, ji aliyê hêmin ve hatiye nivîsîn, li destipêkê pêdvîye fêrbîn, mebest ji behiskirina peywendiyê di navbera ziman û têkista edebî diyarkirina şîrovekirina zimanevanî nîne jibo têkestê, "belkî saxkirina xudanê têkista edebî û gelo heta çî radeyek ew zimanê têkestê pê nivîsî pêdivîye edebê netewayetî xwedanê zimanî. Diyarkirina nasnama netewayetiya têkestî kêşeyek ji kêşyên zansîtê edebî bê gûman her rêbazekê ji dû rêbazên serekî yên edebî. Berawurdkarî ji rewangeya taybet rêbaza frensî ji wê rewangêye li despêka serhildanê edebê berawrid li jê karîgeriya ne zelal ya hizir û hestê netewayetî da bû, jibo diyarkirina taybetmendiyên xwe bêhtir bi boçûna giyanekê nasîyonalizmî serederî digel çemk û mijarên edebî berawurdî kiriye û her weha zimanê têkestê dibê hêla sînorê cudabûna di navbera dû teksitên edebî bikê aşkratir em dikarin bêjn xwendîngeha frensî boçûna wê wehaye ku her tekistekê edebî bi ç zimanekê hatbê nivîsîn, ew mulkê edebê xudanê zimanîye wate wê zimanê teksitê biryarê didê ku tekisteka destînîşankirî ser bi edebê netewayetî û ewên dî li ser edebî"⁽²¹⁹⁾.

Mesela zimanî deq ta çî radeyek teksitê dêxîte nav xaneyaya edebê netewayetî da, "ev meseleye nuha giftûgo û boçûnên cuda li ser hene di nav milletê kurd û milletê dî da li qunaxeka diyarkirî da jiber çend hokarên siyasî û dîrokî û rewşenbîrî, çend nivîskar torevan nekarîne û delîve nebûye zimanê xweyê netewayetî binivîsn û bi j neçarî bi zimanekî byanî berhemê xweyê edebî belavkirine li dev me dehan nivîserên kurd hene ku bi zimanekê byanî (turkî, 'Erebî, farsî) nivîs û berhemên xwe kirine"⁽²²⁰⁾.

⁽²¹⁸⁾ . H.Ç., R.45

⁽²¹⁹⁾ . Ko. Metîn, J. 82, 1998, R.60-61

⁽²²⁰⁾ . H.Ç., R.61

Nemaze nuha yeşar kemal romanivîs bi turkî nivîsîye, û selîm berekat bi 'Erebî nivîsîye.

Diyarda ne nivîsîn bi zimanê kurdî hindek nivîserên kurd bi qeyraneka rewşenbîrî ya kurd ddanît û cihê giftugo û gengeşêye belku bzanbê heta çî radeyekê em dikarin vî corê berhemî bi edebê danîn anku li nav dîroka edebê kurdî da cîhekê bo bigrin.

3.2.5 Şîrovekirina Girêday (Rêbazên Edebî)

Di vê kovarê da ji (100) dane me wergirtî ji wan (5) dane neyê li ser rêbazên edebî bi hûrî li ser hindeka rawestî û şîrovebkin.

Gotarek bi navê (Biniyat û Pêşketna Fêrgeha Sembolîzm) ji aliyê Erşed Remezan Îbrahîm ve hatiye nivîsîn. Nivîserî dîtneka weha bî navî yê fer û pêdvî jibo nûkirina edebê cîhanê (Sembolîzm) peyveka frensîye, ev zarave bi kurdî dbîte (çeveng) yan (nîşan) fêrgeha çevengê li edebê rojava li sedê nozdeh-ê da peydabûye her weha di sedê nozdeh-ê da bi diristî sala 1886z, demê hozanvanê frensî (jan muryas) 1856 - 1910z, di rojnama vîgardo da beyannama wê ya belavkirî. Ev (Jan Muryas) ji revêşta xwe yunanîbû û li bajarê esîna sala 1856 jidaykbûye, hozan bitenê bi zimanê frensî vehandne, gelek bi volîn û rambo daxbarbûye, yekemîn dîwana xwe sala 1884 çapkirîye⁽²²¹⁾.

Sembolîzm bi gelek pênasa dhê naskirin wekî:

1. ewe ku ruxsar û îdyalê pê dnexşînin.
2. ewe ku felsefê û îdiyalê pê derbibrin.
3. ewe ku tiştekî bi tiştekê dî xuya dikê.
4. ewe ku nîva derûnê mirovî dvekole.
5. ewe peyvên ku (melelê - bêzariyê) jibo mirovî dirist dikan.

Egerên Serhildana Sembolîzmê:

⁽²²¹⁾ . Ko. Metîn, J. 82, 1998, R.65

1. berûvajîya hemwaryê: hemwar rêbazeka aşkraye ji hemî hîvî û omêdên xwe berçavtîne derbirîn belê çevengzan dibêjê: evê cîhanê wênegirtina cîhana duwê ye hez li dirêjayê nedkir anku li pêngavekê xwe ji rastiye dûr dixist.

2. paşketna welatan: jibo nimûne frensa li serdemê napolyon kete şerekê dirêj digel elmaniya û li encamê şer elmaniya serkeft, lewra hozanvan û nivîserên frensî behsê karwanê siyasî û aborî...Htd⁽²²²⁾.

Ew kesî neçarbûn hizra çareyekê bikin ku ev hozanvane û zanayên frensî edebekê nû dirist bikin ew jî (sembolîzme)⁽²²³⁾

Serhildana rêbaza sembolîzm: sembolîzm wek xwendingehek li dawîya çerxê nozdehê li frensa pêşket, pêş vê mêtîyê sembolîzm hebû, belê neya diyarbû ew kesên li ser rêbazên dî diçin neçarbûn wan rêbaza bhêln çunkû dîtin helbesta parnasî berev xav û sîstyê ve diçû, vê rêbazê gelek venekêşa, wate rêbaza sembolîzm ewe (tehcîn) kir, anku dareka kevin tû bînî taybekê ne ji wê darê ye berhemdare bi wê da nêzîk yek dibin. Ev nimûne zêdetir jibo hindêye ku sembolîzm dikevê dibin rêbaza serekî zû bi zû xemla xwe nekrîye biniyat jibo avakirina edebî li cîhanê. Saxletên çevengê gelek ji wan: rûdanekê aşkeraye berev ne aşkerabûnê ku zimanê asayî nkarn wê rûdanê îfade bkin, her weha reşbînî têda heye, çunkû wek behsê çeveng û hindek corên dî dikin bi temamî xwe li nav didê⁽²²⁴⁾ jibo nimûne Tirs - Birs - Xerîbî...Htd. Çeveng ji hemwarê dûrdikevê, her weha sembolîzm dibê liqek ji liqên fêrgeha edeb û peywendiyê digel fêrgehên dî hebûye, her digel navê çeveng û ruxsar jî hatiye avakirin û her ruxsarê peyvekê jî kêşana xwe heye li dûv wî ruxsarî tête nexşandin û xweşya helbestê didê xuyakirin, eve ji aliyê ruxsarî ve, ji aliyê naverokê ve, hozanvanên nûxazî ev xale li cem heye û sembol û (mecaz) têkelî yek dibin, çunkû sembol û (mecaz) weku pênase hevpişkî yekin, em wan cudahya nabînin ku jibo her peyvekê dîwarekê danin, bê guman şrovekirina naveroka sembol li hemî tiştêkî aloztre belê bşeweyekê giştî dikarin bêjn nepeniya hozanvanî neçare zimanekî wehî bi karbînê, xew yeke ji van nepeniya⁽²²⁵⁾.

⁽²²²⁾ . H.Ç.

⁽²²³⁾ . H.Ç., R.65

⁽²²⁴⁾ . H.Ç., R.65-66

⁽²²⁵⁾ . H.Ç., R.66

3.2.6 Şîrovekirina Girêday (Wergêrana Edebî)

Di kovara Metîn da (sed dane) me wergirtin, ji wan çar dane li ser wergêrana edebîne, bi hûrî dê li ser yek ji wana rawestin û şîrovebkin:

Ew keça dû caran jyayî, wergêran ji farsî ehmed 'abdulla eve wergêrana çîroka kçekêye ku navê wê (şantî dûy) ji çîneka navnicî bû û jiyana xwe li bajarê (dihlî) bi tenahî dibwarnid, şantî li sala 1926 jidaykbûye û kçeka saxlem bê kêmatî bûye, jiber vê çendê dayk û bav jê bê gûmanbûn, li zarokatyê dayka wê ageh lê bû ku ev kçe berdewam ya heyran û perîşane, digel hindêk hizir û xeyalan digrê û jiber sivkatiya mêjyê wê dayk û bavê wê berdewam perîşanbûn. "Carekê şantî gote dayk û bavê xwe ez berê ya li bajarekê bûm bi navê (Mutra) behsê xanî û seruberê jiyana xwe jibo dayka xwe dikê, dayka wê mecbûrbû ku bavê wê bi vê çendê agehdar bikê, bav jî perîşanbû û şantî bre li cem nujdarekî, nujdarî guhê xwe da çîrokeka seyr şantyê jibo vegêra, nujdarî gote bavê wî dibê şantyê arîşeka mêjî hebê û gotê carubar pisiyara jê bke û berisva li cem xwe binivîse heker her li ser axtifnên xwe ya rijdbû careka dî bîne dev min: belê şantî çi cara ji axtifnên xwe ne hate xwar heta gehşitiye neh saliyê, dê û bavê wê yê perîşan êdî çi seyirbûn ji gotnê wê nedkirin, jiber ku qena'et jibo wan çêbûye ku keça wan ya dînbûy, li sala 1935 kiçkê gote dayk û bavê xwe berê da min li bajarê mutrayê şuykirbû û sê zarok min hene û saluxetên zarokan hemî dînan û navên wan digotin her wesa navê xwe yê wê jiyane jibo got ew jî (logî)bû, belê dayk û bavê wê her dikenîn beramber van hemî îfadan, şevêkê şantyê harîkarya dayka xwe dikir jibo amadekirina şivî, dergehê wan hate qutan, kiçkê dergeh vekir belê gelek gîrobû, dayka wê dûvra çû û dît ku şantî ya maye hêbetî"⁽²²⁶⁾.

Ya berê xwe didê mirovekê biyanî, kiçkê gote dayka xwe ev mirove pismamê zelumê mine mala wan jî li bajarê mutraye û li nêzikî mala me, ew mirove bi rastî jî ji bajarê mutrayê hatbû da li ser behsekê digel babê şantyê bi axfê lê wî mirovî kiçk nediniyasî, belê gote dayk û babê wê ku min pismamek yê hey jinka wî berî (10) sala bi nexweşîya zarokbûnê çûye berdlovaniya xudê. Dayk û babên wê çîroka keça xwe jibo wî zelumê gotin ew jî peyman da ku dê kurmamê xwe digel îne bajarê dihlî dabzanin kanê dê şantî ewî niyasît an ne. Kiçkê ageh ji vî nexşey nebû heta ku roja hatîn çewa kiçkê dît xwe havête ber sîngê wî û bi kelagrî ve got: eve zelumê mine û

⁽²²⁶⁾ . Ko. Metîn, J. 85, 1999, R.63

yê zivirye cem min, hemî hêbetî bûn nezanî kanê dê ji kin, belê neçarbûn ku hukumetê pê agehdar bikin.

Hukumeta hîndîstanê lîjneyek ji çend zana pêkîna jibo li dûvçûna vê çendê, bi agehdarîya hemî alyekî ku gelo şantî dûbare nûjenkirina giyanê (logî)ye, ewê lîjnê şantî bre bajarê mutra belê çawa ji trêne hate xwar xesûya xwe û tyê xwe dîtin û niyasîn û navên wan înan, dayk û babê wê bitenê zimanê hîndî nîşadabûn belê ew bi rehetî bi zarê mutrayî digel wan daxifê⁽²²⁷⁾.

Belê lîjne ma hêbetî ji vê keçê û her li ser boçûnên xwe berdewambû, kalîskek îna û çavên wê girêdan û gotê me divê em ji vêre biçne mala hewe, keçê bçavên girêdayî nîşan jibo gotin, heta çûye derê xanî da gotê li vêre rawestin û eve mala meye, çavên wê vekirin yekser xezûrê xwe naskir, dû kurên xwe jî naskirin, lê ewê, biçûkê ku giyanê xwe li ser dayî nasnekir, evê lîjnê gelek bi hişyarî beyana xwe derêxist belê hemî gehîştine vê qena'etê ku zarokek li bajarê dihlî hatiye ser duniyayê û hemî bîrhatin û nepeniyên xwe û jinekê li bajarê Mutra dizanê û diyarkir ku hîç hîleyek têda nîne û jibo vê çendê me çî gotin jî nînin em bêjin, belê çîroka şantî gerentîya vê rastiyê ye!.

"Vêgavê şantî fermanbereke li bajarê dêhlî û jiyaneke bi tenahî diburîne û faylên wê yên tendiristiyê û yên hukumetê hatine tomarkin.

Sala 1958 wê berisva hindek pisiyara da û got ez ya şaym jiyana xwe li gel jiyana vî serdemî bguncînim û her wesa diyarkir ku ev serbora min ya 'cêb kartêkirin li min nekrîye.

Jiyana şantî dûy tişteke ji zansitî 'ecîbtire"⁽²²⁸⁾.

3.2.7 Şîrovekirina Girêday (Çîrokê)

Di kovara Metîn da ji wan sed danên me wergirtî, çar ji wan li ser çîrokêne, û yek ji wan em li ser sekinîne û bi hûrî me şîrovekrîye:

Gotarek li jêr navê (teknîka digel xwe axiftinê (Gulîçin))ê. Ji aliyê Isma'îl. badî ve hatiye nivîsîn.

⁽²²⁷⁾ . H.Ç., R.64

⁽²²⁸⁾ . H.Ç.

Digel xwe axiftin (Monolog - Monolog) zaravekê yunanî – latînîye, ji dû peyva pêkhatiye: (mono) bi ramana kesek, yan yek bitenê. (Log) ji b ramana axiftin û her dû pêkve dibne axiftneka kesekî, bi wateyeka dî digel xwe axiftin, çi bê deng yan bi deng û dûr ji mirovan, ev zarave yeke ji teknîkên hunerî di nav tûrey da û bi regekê giştî di nav hunerê çîrok û şano û romanê da.

Di nav berhemên tûrey da, jibo cara yekê romanivîsê frensî (adward dîgardin) sala 1877z, ev teknîka bê deng bi regekê berçav di romaneka xixwe da bikarîname û li dîv da rêk jibo gelek nivîserên dî hatiye xweşkirin û li ser wê rêbazê berdewambûne. Yên ku ji hemya bêhtir giringî daye û di nav berhemên xwe bikarîname ji tûreyê byanî ev şehisware bûn: (Ceyimis Cuyis, Vircîniya Û Olf Û Wîlyem Fukner)⁽²²⁹⁾.

Di salên 1913 – 1915ê da, di nav tûreyê îngilîzî da digel xwe axiftin peydabû û digotnê çîroka pêla hişyaryê bi ramana çîrok digel xwe axiftina kesekî bi bê deng, her wesa di tûreyê frensî da dibêjinê çîroka şîrovekirinê ya nû ku seruberê hizir û bîra vedguhêzê, belê di nav tûreyê emrîkî da cîhekî berifreh wegrit û teknîka digel xwe axiftinê bêhtir da xuyakirin. Û navê wî kre (xwendengeha emrîkî) jibo cara yekê zanayê derûnî (wîlyem ceyimis) zaravê rêbaza hestipêkirinê dana, bi ramana digel xwe axiftina bê deng, di semînarekê da li ser zansitê derûnî bikarîna.

Digel xwe axiftin bgelek renga tête vegêran, pê gotin, yan axiftin digel yekê neyê amade, yan jî sitraneka evînyê bê... Ji van renga ev teknîke dibê karekê tamam û serbexwe û berhemî tûreyê dirist jî peyda dbê. Ji rengên berbelav û bêhtir cîhê xwegritî:

"1. axiftina kesekî ku kesê gwe lê nebên bi taybetî di şanoyê da û bitenê cemawerî gwe lêye û kesê dî ageh jê nîne, eve jî berev pêşvebirna karên dramîye ku axiftneka kurt û lêdaye û dikarê dibin lêvan ra bêjê yan jî bi regekê blind.

2. axiftina digel xwe ya dramî: rubert brawnenc, yekemên hozanvanbû ev rege dinivîsînê xwe da bikarîna, ku karîye karê dramî di navbera lezatiya dramî û lîvlîna derûniya kesan da girêbdê ku wêneyeke yan jî kevalekê saykolojîye kesekîye. Çi ev

⁽²²⁹⁾ . Ko. Metîn, J. 46, 1995, R.63

axiftne jibo kesekî bitenê bê yan jî bêhtir"⁽²³⁰⁾. "digel axiftna navixweyî ya yekser derûniye, êş û janên derûnê kesê çîrokê ddetê xuyakirin ku ji danustandinê aşkra dibin bi nepenî û bê kesek hest pê bikê, her weha çîroknivîs dikarê jiyana kesê çîrokê wêne bikê her wek ew kes têda jiyayî û hizir û boçûnên wî têda bzanin li hevberî kesên dîtir û berûvajî di çîrokê da. Weha cîhana kesînyê têtê wênekirin di warê cîhaneka hestipêkrî û hest pê nekirî da"⁽²³¹⁾.

3.2.8 Şîrovekirina Girêday (Rexna Edebî)

Gotarek bi navê (Dîtnek Bo Edebê Kurdî Yê Evro) ji aliyê Dilman Amêdî ve hatiye nivîsîn, demê çend pisiyareka xwe li têla hizra nivîserî dayî, rakêşaye bîrkirinê û palvedaye nivîsînê li ser meselekê yan babetekê ne kêmtrê ji mesele û babetên here giringên rewşenbîr û siyasyên milletê me di rojgareka wekî evro da pêve mjûle . Ew mesele jî berê xwedaneke jibo rewşa edebê kurdî derbirê derunyê pêdvî û hezên takesî û civakî, xwedîka sruştî û astê hizrî û şehristaniya civakî di qonaxa destînşankirî da berûvajî dikê.. Koma dahênan û berhemên edebî jî di naveroka xwe da, koma derbirînên derûnî û mexsed û hezên civakî û dab û nerîtên komê û nexşê tuxûbê şehristaniya civakî dikêşê, û radê pêşveçûnê û dorhêl û seruberê civak têda djî berçav dikê, merem ji gotna nivîserî ew nîne behsa edebî û erkê giringê pê radbê bikê, û rolê bjareyê li hemî qonaxa encam didê, belkû her bitenê berêxwedaneke jibo rewşa edebê evro û seruberê têda diburê û egerên vî seruberî û bersivdaneka kurt jibo çend pisiyareka ku di hizra nivîskarî û edebdostan da dlivin. Ji wan pisiyaran: jibo çi dahênan li astekê nzim daye? Edebê kurdî jibo çi b hewayê buha azadyê xemla xwe bi diristî negritîye? Edîb çi dikin û li kîvene? Çi gîr û grift drê dene? Û çendîn pisiyarên dî xwe mêjyê serê mirovî dînin û li berisvan dgern.

Bi dîtina (nivîskarî) edebê kurdî, li buhara azadyê ya ku çend sale tava serhildanê lêdayî û serê xwe li bin telex û tîxên befra kawdan û neyaran rakrî û jibo nû jînê grinjî û hemî xame helgirên zêrîn jî hozan û pexşan û çîrok jibo vehandîn û bejna wî li govenda peyva resena kurdî bi krasekê nû xemlandî û li wê hizrê bûn ku govenda peyvê her ya şarandî bê û edebî jî her dê bi rewş û xemil bê û dîwanxana wî jî her dê bi metelok û hozan û çîrok û zarvekirin û şano û namîlke û nivîsîn û

⁽²³⁰⁾ . H.Ç., R.64

⁽²³¹⁾ . H.Ç.

dahênan û..Htd⁽²³²⁾. Roj jibo rojê bi xemiltir dibê, lê mixabin heke awriyeka wîjdanî bidinê dê bînin, roj jibo rojê gera govendê ya sist û kêmbê û eve û yê heyî rêzê berddin û gelek xame jî yê bêhna xwevedidin yan yên di kirasekî teng da djîn û dahênan jî li dûv qonaxê yên kêmbê û lawaz dibin..

Lewma jî nivîser dbînê edebê kurdî evro bi behra bêhtra liq û taqûşkên xove li astê qonaxê da nîne, li astê dilveker û geşbîn da nîne, bi rahavêjeka weha nîne ku xwendevan û edebdost û rewşenbîr û heta bi edîb û nivîskara bixwe jî pê dlixweş û razî bin.

Her çende li van dawyan. Hindek dahênan û berhem û namîlke li warê hozanê, çîrokê, pexşanê,..Htd. Ketne berdestê xwendevan û aşqên peyvê.. Lê ev çende qirka ji tihna da hişkbû şil nakê û me nagehênê pla hemeryê ku bêjn şûkûr jibo dewletê, govenda me ya edebî weku caran ya bi xemil û rewşe û zevîka dahênanê berev gehîn û çînê ye û pêngavên baş berev geşê û pêşve havêtne.

Gelek caran û li gelek chan, taybetî ji rûpelê 47ê li ser zarê aşqên bejnizrava peyva resen me gwe lê dbê, ku pisiyar dikin û dibêjin, erê hûn hizir dikin ku edeb û nivîserên me serê xwe pêça bê û li ser balîfkeka nerm danabê û ageh ji vî seruberî nebê? Erê hûn dibêjin qonax û kawdan hind alozbin ku xame gêjkirbê û hizir xav kirbê?

Yan ew tam û ferya caran edebî hey nuha nemabê?

Gelek caran jî xudan xamên zêrîn ewên fişek ji peyva dadrêjtne ferşê sîngê çewsîner û zordar û dujimna û rkaberyeka bê wêne digel destudarî dikir.. Demê xwe dikêşne dîwanxana gêngêşekirina van core babeta dibêjin belê raste, dahênanana edebî zor kêmbê û nzim bûye⁽²³³⁾.

Seruberê wî alozbûye, govenda wî bi diristî xemla xwe negritîye? Mixabin li astê vê qonaxê nîne..

Xuyaye vê meselê têkelî digel hinde diyarên dî heye, meselek xuîy û babetîye, eger jî dû layenîye, hindek bi edebyan bi xwe girêdayne û hindek jî bi kawdan û şêwe û naveroka deselatdaryê û astê werara civakî û seruberê siyasî, aborî

⁽²³²⁾ . Ko. Metîn, J. 51, 1996, R.47

⁽²³³⁾ . H.Ç.

û derûnî..Htd. Çunkû edeyb her edîbên carane û bi jimara zêdebûne û xame jî tijî hîbir û hişk nebûye, diyarên siyasî û civakî hind gelek hemî liqên edebî xwe lêdin çend ser binivîsn, ferî jibo hêsta nivîsînê her dê mîne⁽²³⁴⁾

3.2.9 Şîrovekirina Girêday (Şanoyê)

Di vê kovarê da yên me wergirtî (10) danebûn, ji wan (4) dane li ser şanoyê bûn ku vekolînên edebî li ser hebûn yek ji wan dê şîrovekin.

Berî serhildanê boçûnên xelkê me nivîskar û hunermendê me kurdistanê bûn, bi yek dil û giyan di kêşane karê xwe, her wesa hunerê kurdî, nivîsên kurdî, peleka agrê sorbûn, hunerê kurdî seranserî kurdistanê kurdayetiyeka paqij û bjonbû, çavên hemyan li rojeka geşa wekî serhildanê û serperîştîya kurdan û darêtna kerb û kîna xwe di nav reh û rîşalên rijêma bugen li me xewn bû ku rijêmê rojekê berhemekê hunerî destuyirdaba ew jî bi bertîlya û divya berhemê hunerê mebest deqê şanoyê peyv bi peyv bêne wergêran û şîrovekirin jibo parastina bê zêl (wijdan) dewlet serê qelem froşên kurd deqê kurdî bi zîtrîn dem diketne ser mêza enî girêyek û sermeznekê çi eziman nedzanî jiblî lêdan û sernivîsîn jibo sêdaredanê.. Eha dibin vî kawdanê weha nexweş da hunermendên me nexasim şano karîn karên baş û tama kurdînyê pêşkêş bikin û kurdînyê avdin di nav leşê me da, her wek em dizanin şano cihê rastyê ye û cihê xuhdana leşîye û guncandna berhemî li gel bînerî blindkirina nasnama gelê me.. Şano pêş serhildanê pêşketîbû, renga ji hejarya hunermendabû, çunkû ji hejarya mirovî bi giştî û hunermenda bi taybetî gelek cwankarî dihate pêşçav.

Hunermendên me pêş serhildanê bi rêka çevengyê û debrînê û ezmongeryê û xwendingeha hejaryê kulên kurdayetî rêtin û karîbûn jibo xwe cemawerekê baş peyda bikin⁽²³⁵⁾.

Bêhtirîya hunermendên me karên baş pêşkêş dikirin nexasime ger berêxwedanekê li tîpa şoreşvan, Behdînan, evro bikin dê vê rastyê xuya kin.. Ev tîpên her sê stûnên hunerî bûn⁽²³⁶⁾.

⁽²³⁴⁾ . H.Ç., R.48

⁽²³⁵⁾ . Ko. Metîn, J. 10, 1992, R.45

⁽²³⁶⁾ . H.Ç., R.45

Pêdvîye her hunermendek xizmeta xwe berifreh bikê û krasê kurdînyê li ber xwe layenê xweyê siyasî bikin û bla hunermendên me bçin keval û ferşên xwe helgrin bla daxwaza lêbûrîna xwe li ser depê şanoyê bikin û dest bavêjne karê xweyê hunerî serê xwe û hîzba xwe û boçûnên rêkalê diçin bilind bikin, û roja tvengê kesê destê zelama negritîye û roja devê tveng bi pêlavekê firotîye⁽²³⁷⁾.

"Îro meydan pêdvî bi qelemêye, pêdvî pêşkêşkirina karê şanoêye çunkû li devera me yekcar kêmin evên dikarê şanoyê da karbkin, eger ew serên me heyn jî bjalebin çi mifaye jibî paşêxistna hunerî, huner girêdaye bi milletî ve, kes îro nabêjê hunerê filan hîzbê paşketîye hemû dibêjin hunerê kurdî paşketîye"⁽²³⁸⁾. Hunermendê ezîz xwe bi kêşe çeperê braynyê û çeperên kerb û kînê dûrbêxin.

3.2.10 Şîrovekirina Girêday (Romanê)

Gotarek li jêr navê (hesar binema hunerîyekanî romanî hesarî ya şêrzad hesen) ji aliyê Dr. Şukirye resûl ve hatiye nivîsîn, roman wek hunerekê ji hunerên pexşanêye, gelek ji vekoleran dibêjin hunerên peyvên xandî di çerxê nû da.

Roman her wek dubrêe dibêjê (ew corê edebîye ku wekî xwedîka civakêye ku kerestên mirovê civakêye. Rûdanên encamê kêşa mirovîye, kêşa djî kesên dîtir.

Her çi tiştêk ku peywendî bi romana (hesar) ve hebê, diçê di xana (novîlt) wekî nivîskarî nîşandayî, anku kurte roman ev romane sala 1996ê kete bazarê û dîroka çapdanê her sala 1996 nivîsîye.

Nav û nîşanên wê romanê (hesar) îşaretê bi chekê mezin û freh dikê ku xêzaneka mezin têda jybê bi xwendna nav û nîşana xwendevan diçê nav cîhana romanê⁽²³⁹⁾.

Roman ji (25 – 30) hezar peyvên pêkhatiye û behsê hestê bengixwar dûy eweye dikê beramber bi cewr û stem û çavinqandna babê wî weha jibo diçê bi kuştna babê wî ji wê çavinqandinê rizgar bibê, eve jî di çavê nivîserî da gelek nîzîkî pêşkêşkirina romanê bûye û dibêjê: (pêşkêşe jibo giyanê bavê min...⁽²⁴⁰⁾ bi hesara û

⁽²³⁷⁾ . H.Ç., R.46

⁽²³⁸⁾ . H.Ç., R.47

⁽²³⁹⁾ . Dr. Şukirye Resûl, *Binema Hunerîyekanî Romanî Hesarî*, Ko. Metîn, J. 67, 1997, R.36

⁽²⁴⁰⁾ . H.Ç., R.36

bi zarokên xweve hîvîdarm (omêda min ewe) ku mezin bûn di hesara çî kesa da nejîn.. Heta eger ez bim jî.

Di Hesarê Da Sê Corên Demî hene Hest Pê Têtekirin

A - Demê rastî û heqîqî, mebest ji demjimêra fîzyawî ya romanî û sînorê diyarnekrîye jîblî dîroka wê jî neya aşkereye çunkû jaliyê nivîskarî ve sal û heyv û demê jidaykbûna hesarê ve her di ezêlî deye û heta nuha di demê nivîsîna romanê hesar her ya hey. Eger sala 1989 despêkrîbê û sala 1996 hesar temambûye, ewe demê rastî heft sale.

B – Demê giştî yê romanê: ew jî şeveke û zêdetir nîne ji şevekê.

C – Demê rûdanê: mebest pê ewe, ew demê rûdan têda dqewmê û rûdidê⁽²⁴¹⁾.

Chê rûdanê: li romana hesar çekê giştîye û yê rastîye, û ew bixwe nîşaretê her didê wî cihê hesar jê despêkrîye û bi dawî bûye⁽²⁴²⁾. Rûdana hesar di rastî da saykolojîye û karekî mîkanîkî nîne, hîç enarjî û hêz têda bkar nehatîye, bitenê xewn û xewn jî diçê xaneyê (Bê hestiyê - La şî'ûr) neste wek pehlewaneke di xewê da babê xwe kuştîye jiber da hesara xuşkên xwe yê mezin bdê mêrkirin û jinekê jibo brayê xwe bîne⁽²⁴³⁾.

3.2.11 Şîrovekirina Girêday (Folklor)

Ew gotarên me ji kovara Metîn wergirtine sercemê wan (100) hebin, jibo bitenê (1) ji wan li ser fulkorî hatiye nivîsîn, bi hûrî dê li ser rawestîna paşî dê şîrove bkin, ew gotar bi navê (dengê resenê qefqasî kurd le berhemekanî musîqajenî benaw bang, aram Xacatoriyan, ji aliyê Dr. Şukirye Resûl ve hatiye nivîsîn.

Hejdeh sal bi ser koçkirina mûzîkjenê ermenî Xacatoriyan derbast dbê, bi rastî ziman û nasname gelê ermenî û qefqasbû û navê wî wek pehlewaneke berixwedanvanê mllî li nav gelên qefqasî û rojhelat belavbûye, cîhanê naskir ji aliyê xweve bi musîqa xweya srûştî.

Li ser Xacatoriyan her çî li ser jiyana û jidayikbûna vî mûzîkjenê cîhanî heye li cem Kurd û 'Ereban bes peywendîya rast bi Ermenan bi navudenge, ewa hêjaye em

⁽²⁴¹⁾ . H.Ç., R.38

⁽²⁴²⁾ . H.Ç., R.38

⁽²⁴³⁾ . H.Ç., R.39

bêjin, Xacatoriyan ji xêzaneka ermenî li ermenistanê jidayk nebûye, belkî li sala 1903 li bajarê tiblîs paytexta welatê corcya jidaykbûye, bab bergê tê girtinê pertûk ji xerbîyê bû li gel wê ev xêzana hejarbû belê xudanê xwastekeka mezin û mûzîkê jî heza wî ya bi zaroktyê bû, û dikarî govenda mîlî xêzanê girtbû bi taybet aram Xacatoriyan dikarî bi rêkeka guhdarkirinê xwe fêrî lîdana alavê piyano bikê û paşî dibistana navendî li bajarê tiblîs bi keyifxweşî jibo mûzîkê bizava xweşiyê fêrî bilûr lêdanê bikin.

Bi vî rengî Xacatoriyan jibo zêdetir şehrezayê di warê mûzîkê û dramayê da berê xwe daye mosko û pişkdarî di damezrandna beşê dramayê da krîye, li koşka rewşenbîrîya ermenî di jyê (19) saliyê da, xwe fêrî alavê tişlo kirye û li zankoyê mijarên bîwlojîya matematîk xwandîye, hêştê xlasnekribû dest jê berda û biryara xwe da fêrî mûzîkê bikê û xwe terxan bikê di warê mûzîka mîlî ya qefqas û têda rolekî baş hebû û harîkarîya mamustayan dikir, nîkolayî myaskovsikî yek ji wan mamustayê ku fêrî sîmfonyê kirye⁽²⁴⁴⁾ wextî hevjinê xwe dîtî (nîna makarov) bi nav û dengibû û bi dehan serkeftinê hebûn bi taybetî li kuşirtû pyano sala 1936 şîwazekî nû bi tîkelkirina mûzîka rojhelat û mûzîka mîlî (Xacatoriyan vegeryaye ermenistanê û bizav krîye mûzîkekê danê ku bêhtir srûştî xwe yê netewî hebê, ew bû li festîvala mûzîkê ya ermenîyan li mosko cwantirîn û baştirîn mûzîk berhevker).

Paşê balyayê bextiyarî dana komara ermenistanê û dest bi bizavên şewirmendiyê kir, Xacatoriyan navdarbû di nav hemî welatên sovyeta berê û welatên ewropa rojhelat da, lê gelê ermenî jî gelek şanazî bi pehlewanîya wî dikir⁽²⁴⁵⁾.

Berhemên Xacatoriyan hemî wext jibo hatbû danan, mûzîkê û çalakyên mûzîkê bi taybetî bûye serokê orkestrayê û piştî berhevkerina (Balyey Cayanî û Konşirto Viyolîne) vêce ji dervey welat dest bi pêşkêşkirina berhemên xwe kir, wekî balîwzekî serkeftî jibo welatê sovyet û karîye bala xelkê jibo aliyê xwe bikêşî heta xelkê welatên yekgiriyên emrîka latînî⁽²⁴⁶⁾.

Her weha wezaretê rewşenbîrî ya welatê mîsrê li sala 1961 pêşwazî li xaçatoryan kirye û xelkê qahîre guhê xwe dane berhemên xaçatoryan yê gelek cor.

⁽²⁴⁴⁾ . Ko. Metîn, J.7, 1997, R.36

⁽²⁴⁵⁾ . H.Ç., R.38

⁽²⁴⁶⁾ . H.Ç., R.27

Berhemên xaçatoryan gelekî, jibo her berhemekî gelek cor ji alavên mûzîkê û orkistrayê bikarînane, yek ji van berheman srûdeka sîmfonîye û bûye yekemîn jibo ruhekî blind ji têkoşîn û xebat di destipêka şerê cîhanê yê duwem li cem xelkê peydakirye, her weha zêdetir navê xaçatoryan belavbûye li demê beşdarîkirina fîstevala mûzîka ermenî li mosko ew mûzîka digel govenda balê, ewa bi navê (bextiyarî) bêhtir awazên qefqasiyabûn.

Karekî dî yê mezin xaçatoryan çîroka govenda balêya cayanî û bûka semaker (însîmova) rolekî karîger di razîkirina amadebûna da gêraye û her bi vê helkeftê nivîskarê çîrokê xelatê (Lênîn) wergirtîye⁽²⁴⁷⁾ paşî hezar silav li ruhê paqjê mûzîkjenê qefqas xaçatoryanbû.

3.2.12 Şîrovekirina Girêday (Pexşanê)

Di vê kovarê da (100) dane me wergirtne bitenê (1) ji wan li ser pexşanê hatiye nivîsandin, emê bi hûrî şîrove bkin, eve jî yeke ji wan mijarên edebî ku vekolîn li ser hatiye kirin di vê kovarê da, gotarek bi navê (pexşanêkî rastey nawerastî sedey nozdehem bi zimanî kurdî – elabêy ermenî elfa bê cê ya kurmancî û ermenî) li îstanbûl sala 1861, ji aliyê Dr. Ferhad bîrpal ve hatiye nivîsîn.

